


NÜDEM

No 30 1999



Kovara Huneri, Edebi ü Çandı

NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor

Firat Cewerî



Hejmar: 30 sal 8
Havîn: 1999



Şerdên abonetiye (salek)
Swêd: 240 Sek
Skandinaviya: 280 Sek
Ewrûpa: 100 DM
Amerîka, Australîa,
Kanada: 50 \$
Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê:
Arnold Böcklin, 1866

Çapa bergê:

Jakobsbergs Tryckeri



Pergala bergê û rûpelan:
Nûdem



Adres:

NÛDEM, Box: 177
177 23 Järfälla-Sweden



E-mail:

nudem@telia.com




Tel û Fax: 8-580 131 62
070-7774552
8-583 564 68

NAVEROK

- 4 Efsaneyê Şivan ◆ FIRAT CEWERÎ
- 48 Rêwî ◆ RÊNAS JIYAN
- 49 Roj li me tarî ye ◆ DERWÊŞ M. FERHO
- 50 Di civata Kurdistanê de mercên damezrandina demokrasiyê ◆
- UMER ŞÊXMÛS**
- 56 Tu wekî Dêrikê bû ◆ CAN GULŞENOGLU
- 57 Zeman xortaniya xwe wenda dikir Tu hatî ◆
- MEHMET AKTAŞ**
- 70 Neşuştî ◆ EMÎN BOZAN
- 71 Jean-Jacques Rousseau ◆ FAWAZ HUSÊN
- 80 Dengê rengan ◆ A. SIWAR YALÇIN
- 81 Pisporekî wênayan: ÇERKEZ QEREDAX ◆ ROHAT ALAKOM
- 87 Du ciwan û cenawir ◆ ANTTI OIKARINEN
- Werger: HUSEIN MUHAMMED
- 93 Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e ◆ ŞEREFXAN CIZÎRÎ
- 101 Şiroveya Diwana Melayê Cizîrî ◆ MELE EHMEDÊ ZIVINGÎ
- Werger: EMÎN NAROZÎ
- 105 Cirma mezin: Azadiya fikrê ◆ BEDIRXAN EPÖZDEMİR
- 107 Topa Mizizexê ◆ ABBAS ABBAS
- 109 Hustuyê devê û rastiya Mehmed Uzuni ◆ MÛRAD CIWAN
- 123 Du şîir ji ◆ OSMAN MEHMED
- 127 Danasîna kitêban ◆ NÛDEM

EFSANEYA ŞIVAN



FIRAT CEWERÎ

...
Huner çek û çeper e / Şev û roj here û were
Karê me kurdan ev e / Xebat û keyf û şer e
Şivano lê xe lê xe / Derdê dilan derêxe
Keç û kur evîndar in / Govendê xweş hilêxe
Gaziya te ji dil tê / Ji kovanên di kul tê
Beko meko dê çi kin / Piştî reşê rewşen tê
Rê dûr e delîv teng e / Huner evîn û ceng e
Şivano, bêje bêje / Êvar e li me dereng e!

Sebrî Botanî

Di salên şêstî de Ewrûpa ji ber xurte-pêla çepîtiyê dihejiya. Li dijî nehe- qiyên civakî û siyasî dengê vê pêlê li se- ranserî dinyayê olan dida. Meşên protes- toyê yên mezin li dar diketin û di wan meşan de sloganên ji bo edaleta civakî û li dijî êrîşkeriya emperyalîzmê dihatin avêtin. Di wan salan de nerazîbûnek hebû, li dijî wê nerazîbûnê milîtanîyek hebû. Keç û xortan nuhîtiyek dix- westin, ji bo anîna nuhîtiyê ew derdiketin kuçe û kolanan û protesto diki- rin. Wan zû bi zû serî li ber qanûnan neditewandin. Ruhekî milîtanî û pro- testoyî hakim bû. Ew ruhê protestoyî hêdî hêdî sînoren Ewrûpayê gav kir û derbasî qite û welatên din jî bû. Vê tirsê serîhildêran kir ku li gelek welatan eskerî desthilatdariyê têxin destên xwe. Di salên heftêyî de li Tirkiyeyê jî es- kerî hat ser hukum, lê zêde nema. Xort dîsan rabûn. Wê ruhiyera milîtanî, wê ruhuyeta serîhildêr bi xwe re muzîk, edebiyat û hunera xwe jî anîbû. Emerîka Bob Dylan derxistibû, Şile Victor Jara derxistibû, li Tirkiyeyê jî ge- lek hunermendên weha derketibûn. Piraniya wan hunermendan esilkurd bûn, lê bi tirkî digotin. Wek nimûne Aşîk İhsanî.

Em jî xort bûn, nû gihîştibûn, nû bi xwe hesiyabûn, me dixwest em tiştinan bikin, tiştinan biguherin. Em ji rewşê ne razî bûn, em bi dizî li hev dicivayan û me bi saeran sohbet û devjenkî dikir. Em kî bûn? Em çima li ser erda xwe ne azad bûn? Me çima nikarîbû bi zimanê xwe bixwenda? Çima dibistanên me tunebûn? Kî bûn yê ku ev imkan ji me stendibûn? Wan çima weha dikirin?

Ji bo naskirina xwe û naskirina serdestên xwe em ketibûn hundurê kefelefteke mezin. Û me carekê dengê bihîst, dengê Şivan. Dengekî guherî. Dengekî ku bang xortên kurdan dikir, pesnê wan dida, halan di wan hildida, digot:

Ez xortê kurd im, pir bi nav û deng,

Va min hilgirtiye bombe û tifeng,

Ez diherim şer, ez diherim ceng,

Eger şehîd bibim, dayê tu negrî.

An jî digot:

Ka Kurdistana min ka, bax û bostanê min ka!

Dengê Şivan mîna zengilê şiyarkirinê bû, gur bû, dilerizî, bang dikir, diqîriya; digot, ji xew rabin, rabin ji bo azadiya xwe têbikoşin. Rabin mafê xwe bi dest bixin, ji bindestiyê rizgar bibin.


Em berdewamiya tekoşîna dinyayî, Şivan berdewamiya hunermendiyeke dinyayî bû.

Lê dinya hat guhertin, sîstem ji hev de ketin, ruhê protestoyî qels bû, hîsa piştgirî û dostaniyê çilmisî, îdeolojî sist bûn; lê rewşa kurdan nehat guhertin. Kurd hê jî bindest in, ruhê kurdan yê milîtanî hê jî zindî ye. Û Şivanê ku berî bi bîst û pênc salan mîna stêrkekê derketibû, li esmanê welatê me hê jî diçûrise, bi ruhêkî protestoyî hê jî distirê, hê jî girseya xelkê radike ser lingan, bi dengê xwe yê gur û lertzokî hê jî pirça laşê guhdaran li wan gij dike.

Ji bo ku em hînî vê sira Şivan bibin û em vê sirê ji xwendevanên xwe re jî eşkere bikin, me xwest em di vê hejmarê de bi Şivan re derkevin rêwîtiyekê; rêwîtiyekê dîrokî... Me xwest em ji devê wî çîroka jiyana wî, jiyana wî ya hunermendiyê, nêrîna wî ya li ser huner û hunermendiya kurdî bibihîzin.

Me ev sohbetê ha piştî derketina Abdullah Öcalan ya ji Romayê û berî girtina wî, li Stockholmê, li mala Mahmûd Baksî kiriye. Di pêvajoya sohbetê de carinan Mahmûd Baksî jî tevî sohbetê me bûye.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be... ✍



SIVASI

Gulistan 1

FIRAT CEWERÎ: *Min di deverekê de xwendibû ku malbata te ji hêla Mêrdînê koçî Ruhayê kiriye. Gelo çi para rastiye di vê de heye? Ger rast be, malbata te kengî û ji bo çi koçî der û dora Ruhayê kiriye?*

ŞIVAN: Em bi çend bavan berê ji hêla Mêrdînê, ji Midyadê, ji gundê Kevirzê hatine û li hêla Ruhayê bi cih bûne. Pismamên me hê li wê derê ne, hê danûstandinên me bi wan re hene, ew tên ba me û diçin.

F. C.: *Çima bavanê ji Mêrdînê hatine û li hêla Ruhayê bi cih bûne?*

ŞIVAN: Ew bi meletî hatine. Kalikê min meleyekî pir meşhûr û bi nav û deng bûye. Navê wî Mele Hecî Sofî Elî bû. Ew alimekî mezin bû û ji aliyê xelkê ve jî pir dihat hezkirin. Kurê wî jî hemû Mele ne; Mele Birahîm, Mele Elî, Mele Hecî Yasîn, Mele Silêman û Mele Yûsiv. Mele Yûsiv û Mele Silêman li hêla Mêrdînê dimînin. Bavê min kurê Mele Birahîm e, bavê Gulîstanê kurê Mele Elî ye.

F. C.: *Baş e, em dibînin ku malbata te hemû Mele ne. Gelo Meletiya te bi xwe jî hebû?*

ŞIVAN: Belê, min jî bi zaroktî çend hefteyan Quran xwend. Bavê min pir dixwest ez Quranê bixwînim, min jî bi ya wî kir û xwend. Min mewlûda bi kurdî dixwend, min azan dixwend. Esil bi xwendina azanê min dengê xwe qezenc kir, ew terbiye kir, gewriya min bi xêra xwendina mewlûd û azanê tebaqa xwe girt.

F. C.: *Tu di malbatê de zarokekî çawan bûyî? Tu zarokekî şûm bû, an jî zarokekî mulahîm ku her tişt qebûl dikir?...*

ŞIVAN: Tu destûrê bidî ez ê bibêjim. Tu ya rastî bixwazî ez bi zaroktî gelekî şûm û bela bûm, hema bibêje hemû xwişk û birayên min di bin emrê min de bûn.

F. C.: *Çima?*

ŞIVAN: Ji ber ku min dixwest malbat pir li ser xwe be, pir alîkariya hev bikin, pir bi karakter bin, pir guh bidin bavê min; kar bikin, ne hewcedarî xelkê bin. Bi kurtî min dixwest malbata me malbateke bi rêk û pêk be, têgihîştî be, mezin be... Bi organîze be. Lê mixabin, bavê min zêde guh nedida malbatê, wî ji ticaretê hez dikir, ji huner hez dikir, gelekî digeriya, zêde li malê nedima.

BAKSÎ: Bavê te çend caran zewicî ye, Şivan?

ŞIVAN: Du-sê caran zewicî ye.

BAKSÎ: Dudu dudu ye, sisê sisê ye...

ŞIVAN: Sê caran zewicî ye... Lê piştî ku diya min rehmetî bû ew zewicî.

BAKSÎ: Înşallah tu ne di wê riyê de yî?

ŞIVAN: Ez? Na, na! Ez ji Gulê hez dikim û jê razî me, ji mala xwe razî me...

F. C.: *Têkiliya te ya bi muzîkê re kengî dest pê kir? Di salên te yên zaroktiyê de dest pê kir, an paşê bi derengî?...*

ŞIVAN: Niha, muzîk di ruhê her insanî de heye, çand û huner di dilê her mirovî de heye. Tu niha nivîskariyê dikî, ger te nivîskarî nekira, dibe ku tu bi muzîkê re mijûl bibûyayî. Lê carinan der û dor jî tesîrê li yekî dike. Bala mirov li ser çî be û der û dor mirov bajo ser çî, mirov ê bi wî tiştî re mijûl bibe. Sebeba ku di zaroktiya min de muzîk li ba min zêde bi pêş ket ew bû, ku tiştên nivîskî qedexe bûn, her tişt bi tirkî bû. Me nikarîbû bi kurdî binivîsanda, me nikarîbû nivîskarî bikira...

Cewrerî: *Te bi xwe muzîk hilbijart, ne wilo?*

ŞIVAN: Min ji muzîkê pir hez dikir. Di serê min de galeyaneke pir fireh hebû, pir mezin hebû, dinyayek ecêb hebû. Car hebû di serê min de dewlet saz dibûn, car hebû di serê min de film çêdibûn, car hebû di serê min de şerên mezin çêdibûn. Car hebû di serê min de evînên mezin çêdibûn. Car hebû dîlana mezin di serê min de çêdibû, yanî tiştên ecêb di serê min de çêdibûn.

Gava ez bi rê ve diçûm, carinan nola dêhnan li min dihat, ez di hundurê fikir û ramanên kûr de bûm. Heta xelkê digot, ev lawik dêhn e, çî ye... Carinan gava ez bi insanen re rûdiniştim, galeyana di serê min de ez dibirim cîhaneke din, loma min nikarî bû ez xwe konsantre bikim û bi wan re sohbetê bikim. Vêca carinan insanen li min dinihêrîn û aciz dibûn. Gava wan di dema sohbetê de tiştek ji min dipirsîn, min digot, çii? We çî got? Yanî bala min ne li ser wan bû, ez di cîhana xwe ya hundurîn de bûm. Lê gava mirov rûdiniştin û behsa tiştekî dikirin, behsa çîrokekê an jî serpêhatiyekê dikirin, wê yekê bala min dikişand. Bi xêra çîrok û serpêhatiya wan ez derdiketim rêwitiyên fantaziyê, ez diketim cîhana xeyalan. Ew çîrok û serpêhatî ji min re dibûn stran û min di dilê xwe de ji kûraniya dilê xwe re distira. Yanî stran û kilam di zaroktiyê de di serê min de hebû.

F. C.: *Lê der û dorê jî tu teşwîq dikirin, alîkariya te dikirin, tesîr li te dikirin...*

ŞIVAN: Tesîra der û dorê hebû, lê ew der û dora ez jî tê de bûm, bi min pir kêr dihat, pir li paş dihat; min digot cîhana wan pir teng e, divê ev cîhana wan an were guhertin, an jî firehtir bibe. Gava min dinya xwe û der û dora xwe dida ber dinya derve, min rewşa xwe dida ber rewşa derve, min didît ku em di hundurê malxerabî û kambaxiyekê de ne. Ji aliyê din ve, gava ez li guhertina wê jiyane difikirîm, herçiqas bi min zehmet dihat jî, lê ez têdigihîştim ku her tişt bi destê mirovan çêdibe, yanî ger mirov bixwaze, baweriya mirov hebe, mirov ê bikaribe rewşa xwe, cîhana xwe, heta fikir û ramanên xwe jî biguhere.

F. C.: *Piraniya hunermendên ku ji der û dora we derdiketin bi tirkî distiran, bi tirkî stran digotin. Gelo gava te bi xwe dest bi stranbêjî û hunermendiyê kir, strana pêşî ku te got bi kêjan zimanê bû; bi tirkî bû an bi kurdî bû?*

ŞIVAN: Bi kurdî bû.



F. Cewerî û Şivan

Foto: Şirvan Nûray

F. C.: *Te çima kurdî hîlbijart?*

ŞIVAN: Niha, ez di malbateke kurdîxêv de giha bûm. Diya min qet bi tirkî nizanîbû, bavê min bi tirkîyeke nîvçe dizanîbû. Me zilma tirkan pir dîtîbû, me zilma cendirman pir dîtîbû, me zilma polîsan, hakimanan, çawîşan, ebûqatan pir dîtîbû. Tê bîra min ku qîmeta gelê kurd li Tirkiyeyê, li ba dewleta tirk, li ba tirkan, heta li ba kurdên serdet ku bi tirkan re bûn, du quruş nedikir. Yanî qîmeta gelê kurd qet nehatiye girtin. Rast e, ji aliyekî ve min bi tirkî dixwend, min dixwest ez bi tirkî bixwînim, ez bi tirkî fêr bibim. Ji ber ku dibistan bi zimanê wan bû, bi zimanê kurdî dibistan tunebû. Ji aliyê din ve jî min qet ji tirkî hez nedikir. Ji ber ku tirkî ne bi xweşikahî bi me hatibû fêrkirin, tirkî bi zilm û zordariyê bi me hatibû fêrkirin. Loma bi min ne xweş bû, ji ber ku ez bi zorê hîn bûbûm. Gava mirov zimanekî bi dilê xwe hîn dibe, ew ziman bi mirov xweş tê, mirov jê hez dike. Ez îngilîzî bi dilê xwe fêr bûm, min jê hez dikir, loma min xwe dayê û di du mehan de ez hîn bûm. Lê herçî zimanê tirkî ye, heta heft-heyst salan jî me dikir û nedikir em nikarîbûn

baş hîn bibûna, têgihîştina me baş fireh nedibû, mîna ku me ew ji ber kiribû, lê me bi maneya wê nedizanî. Ji ber ku em di bin darê zilm û zorê de hîn dibûn, çoyên wan li ser serên me li ba dibûn. Yanî em di bin jopên mamostan, yên cendirman, yên polîsan û yên dewletê de mezin bûne. Herçî dewleta tirk e, ew ji aliyê bav û kalan de dijmin dihate dîtin. Ji ber çî? Ji ber ku bav û kalên me kuştibûn, ji ber ku zilm û zordarî li bav û kalên me kiribû. Tu bixwazî nexwazî, ne bi tenê zimanê dewleteke wenî, divê tişteki wê bi te xweş nayê.

Wan ji aliyekî ve digotin em medeniyetê bi pêş de dibin, ji aliyê din jî al û ol û hebûna milletê kurd ji navê radibû. Di bin navê medeniyetê de zilmeke mezin hebû.

F. C.: *Yanî gava te dest bi muzîkê kir, armanca te ne qezenckirina peran û navdarbûyîne bû. Ger wilo ba te ê bi tirkî histira. Lê digel vê jî ez dixwazim pîrsa xwe wilo formule bikim; te çima zimanê kurdî hîlbijart, te çima zimanê kurdî kir bîngeha muzîka xwe?*

ŞIVAN: Zimanê kurdî natura min e, ez bi zimanê kurdî mezin bûme û ji zimanê xwe hez dikim. Gava ez bi kurdî dipeyivîm ez rehet dibûm, zimanê min bû. Ez bi xwe niha bi pênc-şêş zimanan dizanim, lê gava ez bi kurdî dipeyivim ez rehet dibim, ez xwe rehet hîs dikim. Ji ber ku ez bi kurdî rabûme, bi kurdî mezin bûme, kurdî ketiye ruhê min. Ez ji dê û bavekî kurd çêbûme, ez bi kultureke werê mezin bûme. Dû re ev ziman histira min e. Ez difikirim gelo çima qîmeta vî zimanî, vê çandê, vê edebiyatê, vî gelî, vê dîrokê, vê hebûnê nehatiye girtin.

Em zarok bûn, me bîra vê yekê dibir, lê mirov nikare bi zarokî siyaseteke baş bike. Dû re millet tirsîyayî bû, newêribû behsa her tiştî bikira, lê hebûna me ew bû.

Min carinan stranên tirkî jî digotin, min ji aşîq maşîqên kevin stranên tirkî jî gotine. Min hin stranên tirkî yên şoreşgerî jî gotine. Kêfa min ji dengê tirkî re nedihat. Kêfa min ji dengê hunermendên tirkan re jî nedihat. Lê gava min li Mihemed Arif guhdarî dikir, wê ziraviya dengê Mihemed Arif, wê xweşiya dengê Mihemed Arif, ez bêhiş dixistim, ez dibirim dinyayeke din. Herweha gava min li Meyremxanê û dengbêjên me yên din jî guhdarî dikirin, wan jî xîtabî ruh û dilê min dikirin.

F. C.: *Van dengbêjên me çî stran digotin?*

ŞIVAN: Dengbêjên me stranên weke *Derwêşê Evdî* digotin, yên weke *Eysana Îbê* digotin, yên weke *Cafêrê Qereçî* digotin, yên weke *Siyamend û Xecê* digotin, yên weke *Mem û Zîn* digotin... Tu ya rastî bixwazî ev li tevayê Kurdistanê dihatin gotin.

F. C.: *Delalê Qeregêçî jî dihat gotin, ne wilo?*

ŞIVAN: Belê, *Delalê Qeregêçî* jî dihat gotin. Herweha ji *Delalê Qeregêçî* re digo-

tin *Delalê Şexan*
jî.

F. C.: *Delalê*
Qeregêçît bi çi
meqamê tê gotin?

ŞIVAN: *De-*
lalê Qeregêçît
bêtir bi meqa-
mê Huzam û bi
meqamê Kurdî
Hîcazkarî tê go-
tin.

F. C.: *Em dî-*
san veşerin de-
ma zaroktiya te.
Di zaroktiya te
de fikra kurdî û
kurdbûyînê ç-
wan li ba te pey-
da bû û te çima
mîna zarokên
kurd yên din ku
ji ba we diçûn
Stenbolê û bi tir-
kî distiran, stra-
nên bi tirkî ne-
gotin?

ŞIVAN: Min

her gav di xwe de kêmaniyekek didît, kompleksekek li ba min çêbûbû. Ji ber ku li Tirkiyê tirkan tirk medenî nîşan didan, zimanê tirkî zimanekî medenî nîşan didan, zarokên tirkan ji ber tirkbûna xwe serbilind bûn, ew xwediyê dewletê bûn, lê yê me tiştêkî me tunebû, mamostan qerfên xwe bi kurdan dikirin, ew kêman didîtin, bi wan dikeniyen. Wekî din zarokên gundiyan tim ji yê bajariyan bi ferqê bûn. Yanî karbidestên dewletê dixwestin bi şexsiyeta zarokên kurdan bilîzin, wan kêman bikin. Tu bêjî nebêjî mîna zarok mirov di bin tesîrê de dima. Vê yekê kompleks ji me re çêdikir. Lê wê kompleksê, wê ferqiyeta ku dewlet û mamosteyan dixistin navbera



zarokên tirk û kurdan, an jî zarokên gundî û bajariyan, kir ku ez bi xwe jî ferqiyetê hîs bikim û bikim ku ew zarokên kurdan an jî zarokên gundiyan rabin ser xwe, kêfa xwe ji zimanê xwe re bînin, kêfa xwe ji kultur û hebûna xwe re bînin.

Van kirinên ku me behs kirin, destûr neda ku ez herim mîna hin kurdên ku ji Diyarbekir û Ruhayê diçûn Stenbolê û bi tirkî distiran. Min nexwest ez jî weke wan herim bi tirkî bistirêm û bibim xwedî nav û şuhret. Min dizanî bû kultur wilo bi pêş nakeve, mirovatî bi wê pêş nakeve, bi wê civak bi pêş nakeve, loma min ji xwe re riya bi kurdîstranê hîlbijart. Min xwest ez nîşan bidim ku zimanê kurdî jî spehî ye, mirov dikare bi zimanê kurdî stranên spehî bibêje. Ew kompleks û galeyana ku ji ber kompleksê di serê me de çêbûbû, em dajotin ser guhertina wê jiyandê, guhertina wê cîhanê, xweşkirina civatê, rakirina fikrên pîs û kirêt. Me dixwest em cîhaneke wilo ava bikin ku mirovatî tê de hebe, mirov tê de rehet be, dilê mirov tê de xweş be. Di dema ku min cîhaneke wilo xweş di serê xwe de çêdikir, pir pêşniyaz ji min re hatin ku ez bi tirkî bistirêm. Pere jî teklîfî min kirin, nav û şuhret jî teklîfî min kirin, lê min nexwest ez xayintiyê bi koka xwe re bikim, min nexwest ez xayintiyê bi ruhê xwe re bikim û bidim dû karekî basît. Bidim dû karê dûrî hunerê, karê jiyankurt...

Min dixwest ez bi zimanê xwe, bi kurdiya xwe ya şêrîn hunermendiyê bikim û xwe bidim qebûlkirin û herweha hunermendiya kurdî bidim qebûlkirin. Baweriya min bi vê nêrînê dihat. Lê divê ez mikur werim ku di wê demê de gelek hevalên ku ez teşwîq dikirim jî hebûn. Mîna tu jî dizanî, berî 75an gava tevgera rehmetiyê Barzanî hebû, hingî welatpariziyê xurt jî hebû, gelê me pir aşîqê Mustefa Barzanî bû, ew li dû hereketa Barzanî bûn. Hingî gelek heval û dostên min yên baş hebûn; ji Mêrdînê, ji Diyarbekirê, ji Kurdîstana Iraqê, ji Kurdîstana Sûriyê. Ev xortên wê demê gelekî jîr bûn, wan li Ankara û Stenbolê dixwendin û ruhiyeteke netewehezî bi gelekî ji wan re hebû, wan ji ziman û edebiyata kurdî hez dikirin; wan ez teşwîq kirim, wan dixwestin ez bi kurdî bistirêm. Gava min piştgirî û teşwîqeke weha li ba wan dît, ez jî hê bêtir bi kurdî ve hatim girêdan, xwesteka min a ku berê hebû hê xurttir bû û min bi kurdî stran gotin.

F. C.: *Di wan deman de, stranbêjî, an jî tembûrvanî di nava kurdan de hebekî biçûk dihat dîtin, tembûrvanî karê mitriban bû. Vê yekê çawan tesîr li te kir?*

ŞIVAN: Bi rastî weha bû. Qîmeta dengbêjî û hunermendiyê tunebû. Wê demê an tu ê dengbêjê li ber deriyê axan bûya, an li ber destên şexan bûya û bi erbanê bigota, an jî tu ê li Mizgeftan muezîn bûya. Yanî te ê an xizmeta axê bikira, an ya mizgeftê bikira, an jî ya şex bikira; lê ji miletê kurd re tiştê tunebû. Erê tu dikarî bi van tiştan bijî, lê ev şexsiyeta te bi pêş naxe, tu nikarî tiştêkî bidî civatê û civatê

bi pêş bixî. Wekî din gava tu bi tirkî bibêjî, tu dîsan civata xwe winda dikî. Tu civata xwe pêşkêşî kesên din dikî, tu civata xwe û kultura xwe winda dikî; şexsiyeta te dibê tişteki din, tu ji mirovatiya xwe derdikevî. Gava min li van dinerî, hunermendî ji çavên min diket. Herçî ew bûn, wan bi tenê distiran, lê min galeyên di serê xwe de dikirin stran û digotin.

Gava min êdî biryara xwe û hunermendiyê da, ji min re gotin: "binere Şivan, gava tu bistirê, yek, divê muzîka te û hunera te xizmeta kurd û Kurdistanê bike, wê xizmeta pêşketina gelê kurd bike. Duda, divê strana te şexsiyetê bide huner û hunermendên kurd. Ger tu vê bikî, ger tu bi biryar bî, mimkun e ku ev bibe, loma divê tu bistirê."

F. C.: *Kê ev ji te re gotin, kê xwest tu bidî ser rîyeke wilo?*

ŞIVAN: Dost û hevalan gotin, lê di serê min de jî ev tişt hebûn. Wan gotin, divê tu van tiştên di serê xwe de bikî, ev tişt rast in, çima tu nakî? Wan gotin, ger tu bi vî awayî dest bi stranê bikî, wê gelê kurd bi pêş bikeve.

F. C.: *Ev kesên ha siyasî bûn? Ji çî partî û rêxistinên bûn?*

ŞIVAN: Belê, siyasî bûn. Ew ji tevgera DDKDê bûn, sempaîzanên Partiya Demokrat ya Kurdistanê Iraqê bûn. Ji kesên kevin yê dema bûyera 49an bûn, ji hevalên Rizgariyê bûn, hevalên Kawa bûn. Navê hinan ji wan jî tê bîra min. Yek jê Mahmûd Nedîm Kaya bû, ji Kextê bû. Ez ji te re bibêjim rehmetyê Ferîd Uzun bû, Mahmûd Çikman hebû. Di vî warî de Necmettîn Büyükkaya pir aktîv bû. Hevalên Riya Azadî hebûn, hingî kek Kemal Burkay ew hebûn. Di wan salan de kovara bi navê *Çiya* diket destên me, li vir Bahoz hebû. Wê çaxê Mahmûd Baksî hebû, me navê wî bihîstibû. Ji xwe gava cara pêşî ez derketim ez ê bihatima cem Mahmûd Baksî...

F. C.: *Ez dixwazim em dîsan vegeerî destpêka hunermendiya te. Tu kengî ji civata heval û hogiran derketî û te ber bi cîhana profesyonelîzmê ve gav avêtin? Yanî cara pêşî tu kengî û li ku derketî ser sehne û derketina ser sehneyê ji bo te hîseke çawan bû?*

ŞIVAN: Min ev pirsra te di kitêba Mahmûd Maksî ya bi navê "Şivanın Sevdası" de bersivandiyê, lê ez ê dîsa bibersivînim. Rast e, min berê di nava heval û hogiran de distira, ez dernediketim ser sehneyê. Lê min carinan, di dema xelasoka lîseyê de, li hemberî xwendevan û mamosteyan distira. Ger ew sehne were hesêb, ez derdikeitim ser sehneyê jî. Kêfa wan gelekî ji dengê min re dihat û digotin, çima ev nabe hunermend û kasetan çênake.

Herçiqas di destpêkê de hejmara guhdar û temaşevanên min ne bi dehhezaran ba jî, lê gava ez derketim û min stran gotine, mîna bûyerekê bûye, temaşevan çû bûne, rahiştine min û ez hol kirime hewayê, gelekî kêfa xwe ji min re anîne. Li ber


min geriyane û ji min kaset xwestine. Min ji wan re digot, ez naxwazim.

Yanî min li derekê stran bigota, tavilê bala xelkê dikişand. Dengê min xweş bû, zirav bû, zelal bû, dinuhurî. Milet pir ji lerza dengê min hez dikir. Lê ez bi xwe di nava lêgerînekê de bûm, gelo ez çawan bibêjim, hevalên min ji min dixwazin ez bibêjim, lê ez çawan bibêjim. Gelo ez jî mîna kevnehunermendên kurd bibêjim, mitirbiyê qebûl bikim û li şexsiyeta xwe û hunermendiyê negerim an jî ez hunermendiyê bi şexsiyet ava bikim. Ez bi xemgînî dibêjim ku gelek hunermendên kurdan qereçîtî kirine, dengbêjî kirine, dengbêj jî giş birçî ne, şexsiyeta wan du peran nake. Wek mînak em dikarin Mirado bi bîr bînin; wî bi dilê xwe digot, pir xweş digot, lê qîmeta wî mîna hunermend zêde tunebû. Wê hertim hinek rûniştana, ji xwe re vexwarana û bigota, ka Mirad, ji me re bîstekê bistirê. Mixabin, hunermendiya kurdî jî mîna gelê kurd perîşan bûbû, lewîf bû. Hunermendiya kurdî ev bû. Gava tu rabî bi tirkî jî bistirê, hingê şexsiyet namîne. Loma min nedixwest ez bi tirkî bistirê. Min dixwest ez huner û hunermendiya kurdî azad bikim, şexsiyetekê bidimê. Gava min ev nixte girt, kêfa min hat. Sala 1975 bû, lê kîjan meha bû baş nayê bîra min...

F. C.: *Yanî cara pêşî tu di sala 1975an de derketî ser sehneyê û te bi kurdî stra?*

ŞIVAN: Belê, ez cara pêşî di sala 1975an de derketim ser sehneyê. Ez bawer dikim demsala biharê bû. Minasebet jî şeveke Siwêregiyana bû. Di wê demê de hema yekî bi tenê bigota lê lê lê, rebenan can davêtin. Û ew şeva Siwêregiyana jî tije bû. Ji axan bigire, heta karker û xwendevanan û gelek kesên ji der û dorên din ên Kurdistanê jî beşdarî şevê bûbûn. Di wê şeva siwêregiyana de hinek hunermendên din jî hebûn, lê kir û nekirin wan bi kurdî nestiran. Hingê hunermendekî bi navê Arakan Çelîk jî hebû, belkî tê bîra te. Wî carinan ji xwe re Xezal Xezal digot, lê ew jî ditirsiya û newêrîbû zêde bida nav. Mesele wê bigota "Xezal Xezal hayê hayê, gel beri yar gel beri, gel beri yar gel beri". Bi tenê ji bo wê gotina Xezalê kurd radibûn ser lingan û jê re li çepikan dixistin.

Wê çaxê hin heval hatin ba min û gotin: De rabe Şivan, rabe ji me re bi kurdî bistirê. Min rahişt tembûra xwe û ez derketim ser sehneyê. Ez rûniştim û min dest bi Xezal Xezala rastî kir. Ez bi wê nesekinîm, min strana *Eyşana Elî* got, min strana *Welatê me Kurdistan e, Min divê her tim bilind bî, ala rengîn kesk û zer* got, gelek stranên din yê ku min çêkiribûn, min wê şevê gotin. Ez tije bûbûm, min di wê şevê de dilê xwe vala kir. Lê ji aliyê din ve mîna agirek ketibe nava guhdar û temaşevanan, ew şaş û ecêbmayî mabûn, devê wan ji hev mabû. Hinek hêrs dibûn, hinek digiriyan, hinekan dest bi sloganan kirin. Mîna ku ew bibêjin, a rastiya me ev e, tu heta niha li ku bûyî. Piştî wê şevê êdî nav û dengê min hat bihîstin. Paşê şeve-



ke din, bi navê Şeva Wêranşarê hate lidarxistin. Ew şeveke mezin bû, gelek kes hatibûn. Min di wê şevê de rişme berda, ez derketim derveyî qalib û sînorên sensur û oterosurê. Piştî şeva Wêranşarê, êdî dengê min çî bigire li hemû Kurdistanê belav bû, her kesî dengê min bihîst.

F. C.: *Bi rastî jî derketina te derketineke gelekî nû bû, dengê guberê bû; dengê ku di kurdî de nehatibû bihîstin bû. Ev deng ji ku hat, vê nuhîtiyê xwe di ku de veşartibû?*

ŞIVAN: Ez ji te re rastiye bibêjim, ne ku ez hunermendekî pir mezin bûm, min pir xweş digot, kes di ser min re tunebû. Bila şaş neyê fahmkirin. Lê ez kurekî gelê kurd im. Yê ku berî min pir xizmet kirine, pir xebat kirine hene û hebûne. Ez kurdariya xwe ji wan hîn bûme. Lê dibe ku ew di bêdengiyê de mabin, zêde bi nav û deng nebûbin û hatibin jibîrkirin, lê divê xizmeta wan neyê jibîrkirin.

F. C.: *Gava ez behsa nuhîtiyê û derketineke nû dikim, ji aliyê siyasî wêdetir, armanca min muzîk e, dengbêjî ye, hunermendî ye. Bi ya min di warê hunermendiyê de*

tu dengekî nû bû yî, te hin tiştên nû, hin awazên nû, hin guhertinên nû anîn nav muzîka kurdî...

ŞIVAN: Belê, gelê kurd tije bû, herçiqas gelê kurd ji rastiya xwe qetiyabû jî, dîsan ew li rastiya xwe digeriya. Rastiya xwe wenda kiribû, lê, lê digeriya. Çawa gava volkanekê binê erdê rê dibîne, dibêje teq û diteqe, gelê kurd jî wilo li riyekê digeriya da ku biteqe.

BAKSÎ: Niha, gelê kurd li riyekê digeriya. Me çi kir, em bi zimanekî ku gelê kurd jê fêhm nake nêzikî gelê kurd bûn, em bi zimanê bajariyan nêzikî gelê kurd bûn, me ji gelê kurd re qala felsefê û nizanim çi kir. Lê gelê kurd ji van fêhm nedikir. Ji sedî hejmareke mezin ji gelê kurd cahil û nexwende bû. Di eslê xwe de Şivan ji me bêtir tiştêk negotiye. Tiştê ku wî gotiye me jî gotiye, lê wî bi awayekî din gotiye. Wî taktîka xwe guhert. Got, ez çawa xwe bigihînim vî gelî û bi vî gelî re bibim yek, got, ji sedî nodê vî gelî nikarin bixwînin, cahil e, wê çaxê ez ê bi muzîkê herim ba vî gelî. Şivan bi muzîkê çû ba gel. Ji ber ku Şivan dîrek ji nava xelkê dihat, wî dizanî bû daxwazên xelkê çi ne, xelkê çi dixwazin. Gava Şivan ji gundê Xerabreşkê derket, dizanîbû gundiyên Xerabreşkê çi dikişîne. Bi riya gundê Xerabreşkê Şivan dizanîbû gundiyên kurdan bi giştî ji destên axa û began, ji destên dewletê, ji destên polîs û eskeran çi kişandine û çi dikişînin. Şivan bi xwe ew zilm dîtiye û bi wê kulturê mezin bûye.

Ji aliyê din ve jî, di dema derketina Şivan de, tevgera kurd di dema xwe ya herf zehmet de bû, hereketa Barzanî perçe perçe bûbû. Em bi xwe jî ketibûn kirîzan, me çapemenî taqîb dikir, me li radyoyan guhdarî dikir, me digot ka bê çi bi hereketa kurd hat. Di demeke weha de, mirovek derdikeve, Şivanek derdikeve û ji pirs û pirsgirêkên xelkê re dibê bersiv. Heta wê çaxê kesî tiştêkî weha nedîtibû û ne bihîstibû. Hunermendiyek weha nehatibû bihîstin. Ne ku berî Şivan hunermend tunebûn, belê, hebûn, lê wan li ser evîne, li ser şeran, li ser axayan digotin; herçî Şivan bû wî wisa nekir, Şivan ji nava xelkê hatibû û li ser xelkê got, li ser kurdan got, li ser bindestî û perîşaniya kurdan got, li ser zilma axan got, li ser bêdaletiya civatê got. Şivan evîndar bûbû, evîndarê Kurdistanê bû û Kurdistan di bin destan de bû, Şivan ji bo azadiya evîna xwe bang dikir, digot, dinuhurand. Hingî min ji xwe re got, a ev e Evdalê Zeynikê. Evdalê Zeynikê di şexsê Şivan de bi ruh bûbû. Em bi xwe negihîştine Evdalê Zeynikê, em ne yên dewra wî ne, wî herweha tu kaset û film jî li dû xwe nehiştine, lê dîsa jî navê wî di nava gelê kurd de nemir e, her kes wî bi hurmet bi bîr tînin. Evdalê Zeynikê jî hunera xwe teslîmî Şivan kiriye. Gava gelê kurd dengbêjekî mîna Evdalê Zeynikê ji bîr neke, wê hunermendekî mîna Şivan jî qet ji bîr neke. Şivan spehîtiya keçîka ku her kes aşîqê wê bû dianî zimên.

F. C.: *Yanî Şivan aşqa me, evîna me hemûyan dianî zimên...*

BAKSÎ: Rast e, kesî ji me newêrbû ji keçikê re bigota ez ji te hez dikim. Bi salan me newêrbû ji keçikê re bigota em ji te hez dikin. Em ditirsyan, me digot gelo em ji vê keçikê re bibêjin, em ji te hez dikin, ew ê li me bixe, wê çavên me derxe, wê çi bike. Bi kurtî em tirsonek bûn. Şivan rabû û bi dengêkî bilind ji keçikê re got; ez ji te hez dikim! Keçikê jî lê vegerand, got baş e, ez jî ji te hez dikim. Gava keçikê ji Şivên re got ez ji te hez dikim, êdî ew şermîtî ji ser rûyê me jî rabû û me jî got em ji te hez dikin.

F. C.: *Ez navê te meraq dikim, ez dizanim ku dê û bavê te navê "Şivan" li te nekirine û navê Şivan û Gavanan di civaka kurdan de sifâtên biçûkkirinê ne. Te çima û bi çi armancê navê Şivan li xwe kir? Gelo ji bo te naverok, armanc û maneya vê gotinê çi ye?*

ŞIVAN: Niha, navên kurdî bêtir ji erebî tên. Ew jî ji ber tesîra islamê ye. Di malbata me de navên hindik kesan bi kurdî ne. Ew jî bêhemdî bûye. Mesele Zînê ye, Zerê ye, Stî ye, Xezal e. Navê xalîkeke min Zînê ye, navê yekê Zerê ye. Navê pîrka min Stî ye. Navê diya min Xezal e. Ev nav jî hemû yên kurdî ne. Ev navên ha ne ku bi zanebûn li wan hatine kirin. Ew ji tradisyona kurdî tên, loma jî wan li xwe kirine. Herçî navê min e, bavê min hê bi zaroktî ji min re digot Şivanê min. Gava bavê min xwestiye vî navî resmî li min bike, jê re gotine "bu ne biçim isim?" ya bikin Çoban ya jî em vî navî nanisvîsin.

F. C.: *Yanî bavê te xwestiye navê Şivan li te bike?*

ŞIVAN: Belê belê, lê wan qebûl nekirine. Gava min dest bi stranan kir û stran gotin, ji min re gotin "adın ne?" min got: "Şivan". Wan dîsan gotin ev çi nav e, ka em bikin Çoban. Ev hê di destpêka salên min yên dibistana navîn û lîseyê de bû. Heta wan carinan ji min re digotin "Aşık Çoban". Tu nemabû ku navê Aşık Çoban li min bimaya. Heta gava êdî min lîse xelas kir û min dest bi unîversîteyê kir, hevalan ji min re gotin, ka em ji te re navekî bibînin. Min got, bavo, navê min Şivan e û ji min re dibêjin Aşık Çoban. Lê bila navê min Şivan bimîne.

F. C.: *Li Tirkîyeyê tradisyona Aşikan jî heye. Aşık Veysel heye ku di dîroka Aşikan de xwediyê cihêkî taybetî ye. Aşık İhsanî hebû. Aşık Maksûnî hebû, Aşık nizamî kî hebû. Gava hêdî hêdî navê te hat bihîstin, Tirkîye û Kurdîstan tije Aşiq bûn. Xuyaye ger te bi tirkî bistira wê navê te Aşiq Şivan bima?*

ŞIVAN: Belê, rast e. Wê demê hin hevalan digotin, yaho ev çi ye te navê Şivanan li xwe kiriye? Hinan jî digotin, na, Şivan navekî bi mane ye, navê Saît Kırmızıtoprak jî Şivan e û paşê ev navê Şivan navê te yê eslî ye, tu çima qebûl nakî?

BAKSÎ: Li ba me gavantî tiştêkî ne xweş e, golikvantî tiştêkî ne xweş e, lê Şivantî

tişteki mezin û bi mane ye. Di çîrokên kurdan yê kevin de jî heye. Gava dilê xor-
tekî diket keça maqûlekî, jê re digot divê tu ji min re heft salan şivantiyê bikî, hingî
ez ê keça xwe bidim te. Ji ber ku Şivantî hunereke ewqasî zor e, divê tu keriyek pez
biparêzî, tu nehêlî gur têkevin nava pezên te, tu nehêlî tişteki bi pezên te were. Divê
tu bîst û çar saetan şiyar bî, tu bîst û çar saetan pezê xwe jî şiyar bihêlî. Divê tu ne-
hêlî gur û wawîk û lawirên din bigirin ser pezê te û wan di xew de bixwin. Ya din
jî, di bin vî navî de mutewazîtiyek radizê. Şivan ranebûye, negotiye, ez axayê kurd
im, paşayê kurd im, mîrê kurd im; gotiye ez Şivanê kurd im. Û di vê gotinê de ma-
neyeke pir kûr î felsefî heye. Şivan gotiye ez Şivanê gelê kurd im. Şivan negotiye, ez
axayê kurd im, ez begê kurd im û divê ez vî xelkî bipelçiqînim, na, Şivan gotiye, ez
Şivanê kurd im û divê ez vî gelê di xew de şiyar bikim.

ŞIVAN: Bi rastî min ji navê xwe hez dikir û ez hê jî ji navê xwe hez dikim. Navê
Şivan di stranan de, di hikayetan de, di destanan de, di lawjan de, di cimaetan de,
navekî ku di xwezayê de dijî, navekî li çiyar dijî, navekî di nava çîrok û çîrçîokên
kurdî de dijî; navekî xwedî esalet e. Mîna ku Mahmûd jî got, navekî mutewazî ye.
Min navê xwe nekiriye, Serbilind, Çiya, na, min kiriye Şivan. Normal Şivan.

BAKSÎ: Tê bîra min, gava min û Şivan me kaset "Mişko" çêkir, min ji Şivan re
got, Şivan, pêwîst be ez û tu dikarin bibin mişkên gelê xwe jî. Hingî xelk bi me ke-
niyan, gotin Şivan û Baksî li ser mişkan distirên. Gava pêwîst bûye, ez û Şivan em
bûne mişkên gelê xwe jî.

F. C.: *Henek li aliyekî, bi rastî jî dengê te xweş e, Baksî. Ger te ne nivîskarî, lê belê
ji xwe re hunermendî, dengbêjî hîlbijarta, te ê nan ji Şivên re nehişt.*

ŞIVAN: Ez çiqasî behsa Mahmûd bikim, dawî nayê, pir û pir dirêj e. Mahmûd
insanekî ku di pir waran de entîke ye. Ez û Mahmûd em deh salan bi hev re çî bi-
gire li hemû dinyayê geriyane. Em hê jî hevalên hev in, em hevdu baş nas dikin,
pir sirên me, pir serpêhatiyên me bi hev re hene. Ez bawer dikim ger ez û Mah-
mûd em têtetina siyasetê, dibe ku me tiştên herî mezin bikira, em bigihîştina ci-
hên herî bilind. Lê me xwest em nivîskar û hunermend bimînin.

F. C.: *Te û Mahmûd Baksî we bi hev re kaset jî çêkir, ne wilo?*

ŞIVAN: Me bi hev re pir tişt çêkirine. Tu dizanî entîketiya Mahmûd çî ye? He-
ger Mahmûd stran bigota, wê ji herkesî xweştir bigota. Herçî nivîskarî ye, tu li vir î
ez tişteki nabêjim, lê Mahmûd nivîskarê kurd yê herî qelema wî xurt e. Ez û Mah-
mûd bi salan bi hev re geriyane, Mahmûd Van Goghê kurdan e. Yanî xwe mezin
bike, xwe cidî bike, xwe binepixîne; na, tiştên wilo li ba Mahmûd tune. Mahmûd
rehet e, tam wek nivîskarekî hereket dike. Gava lazim bûye, gotiye, ka em herin ji
xwe re li barekê rûnin û vexwin. Ez dixwazim vê jî bibêjim, hevaltîya Mahmûd ge-

lekî xweş e. Mahmûd gava bixwaze pir medenî ye, gava bixwaze jî pir klasîk e. Kes bi qasî Mahmûd nizane klasîkên kurdî xweş bibêje. Kes bi qasî wî nizane stranên kurdî xweş bibêje.

F. C.: *Tu dizanî ku Mahmûd Baksî piştî vî emrî dest bi muzîkê nake, tu loma wilo pesnê wî didî?*

ŞIVAN: Tu dizanî Mahmûd Baksî ji min re çi gotibû. Got, ez nivîskariyê baş dikim, tu jî hunermendiyê baş dikî; ez naxwazim nanê te ji destê te bigirim. Ha, ha, haa... Tu dizanî ji min re çi got, Firat, got, em herdu bi muzîkê dakevin, em ê bi hev kevin, loma baştir e tu bi muzîkê dakevî û ez jî bi nivîskariyê... Ne tu nêzîkî nivîskariyê bibî û ne jî ez nêzîkî hunermendiyê bibim.

BAKSÎ: Min xwe biçiranda hunermendekî wek Şivan ji min dernediket, wî jî xwe biçiranda nivîskarekî weke min jê dernediket...

F. C.: *Haa, haa, haaa... bes pesnê hev bidin, lê henek li aliyekî, bi rastî jî Şivan di dîroka civakî, siyasî û hunermendiyê kurdî de efsaneyek e. Wî bi dengê xwe yê gur û bi hêrs welatek rakir ser lingan, mîna birûskê hat, lê neçû, ma û beta îro jî di zîrveyê de ye. Herçiqas Viktor Jara û Bob Dylan mîna hunermendên protestoyê navneteweyî bûbin jî, dîsan efsaneya Şivan tişteki din e. Tu vê efsaneyê bi çi ve girê didî?*

BAKSÎ: Bibuhure, berî ku Şivan bersiva vê pirsê bide, ez dixwazim bi kurtî tişteki bibêjim. Şivan ekolek e. Şivan bi serê xwe dibistanek e. Piştî Evdalê Zeynikê û Mihemed Arifê Cizîrî, Şivan heye. Ma piştî van tu dengbêj derneketine? Belê, gelek derketine, lê Şivan maye. Ji ber ku Mihemed Arif jî ekolek bû, niha ew tê bîra mirov. Ekol ji bîra mirov naçin, ew dimînin. Bifikire, gava Şivan bi dengê xwe yê xweş derket û got: "Ka Kurdistana min ka, bax û bîstanên min ka?" Miletek bi wî dengî rabû ser lingan. Ez bawer dikim wê di pêşerojê de alim û profesor li ser vê bûyera Şivan rawestin û wî şirove bikin. Ji ber ku derketina Şivan bûyerek bû.

F. C.: *Em hebekî ji pîrsa xwe bi dîr ketin, lê em ê dîsa lê vegevin. Baksî got ku derketina Şivan bûyerek bû, rast e, bûyerek bû û ev bîst û pênc sal in ku Şivan ji rojeva kurdan derneketiye, ev bîst û pênc sal in ku kurd bi dengê wî xemgîn dibin, bi dengê wî digirin, bi dengê wî daxwaza gihandina armanca wan xurt dibe. Bi destûra we be ez dixwazim di vîr de tişteki bi bîr binim, carekê nivîskarekê me î jî kurmançên başûr di Nûdemê de li ser muzîkê nivîsek nivîsandibû. Wî nivîsandibû, ku wê carekê pêşmergeyek emeliyat bikirana, lê narqoz tunebû û loma doktor newêrîbû ew bê narqoz emeliyat bikira. Lê pêşmergeyê birîndar, ji doktor dixwaze ku ew jê re kaseteke Şivan deyne ser û wî li ber dengê Şivan emeliyat bike.*

Gava doktor kasetê Şivên datîne ser, yê pêşmerge diçe cîhaneke din, doktor emeliyatê xelas dike jî hê ew pê nêze. Ev bûyereke balkêş e...

ŞIVAN: Gava ez li Kurdistana Iraqê bûm, Mahmûd jî hazir bû, pir insan hatin pêşiya me. Yekî destê xwe li cama erebeya me xist û bi şikandina camê re xwîne di destê wî re jî avêt. Mêrik got, ez te maçî nekim ez naçim, ji ber ku ez ji bo te şeş salan di hepsê de mame û min tade û neheqîya dinyayekê dîtiye.

Hin insan ji bo min hatine îdamkirin, hin hatine şewitandin, hin insanan ji bo ku li kasetên min guhdarî kirine, bi salên dirêj di hepsan de mane, di îşkenceyên nedîtî re derbas bûne, hin kes hatine wendakirin û heta niha tu deng ji wan derneketiye.


Niha mesele çî ye, ez kurê welatekî bindest im. Yê Evdalê Zeynikê, yê Ehmedê Xanî, yê Melayê Cizîrî, yê ku ez û tu daye jiyandin bide gelê kurd e. Em nikarin bêî gelê xwe bijîn û em bêî gelê xwe ne tiştek in jî. Gava tiştên xweşik û baş ji aliyê endamên vî gelî ve werin çêkirin, tu bêjî nebêjî wê di dinyayê de nav bidin û cihê xwe yê pêwîst bistîne.

Lê tiştek heye, herkes nikare hunerê çêbike. Wê gelek kes rabin, bixwazin hunerê çêbikin, lê wê her tişt nebe huner.

BAKSÎ: Bibuhure, ger Şivan mîna hinek hunermendên navneteweyî bi zimanin din bistira, vêga Şivan ew jî derbas kiribûn. Bêşansiya me çî ye, em bi zimanekî qedexê dibêjin, tu dev ji dinyayê berde, zimanê me di nava me de qedexê ye. Eger Şivan bi almanî, firansî, îngilîzî an jî bi spanyolî bigota, wê îro Şivan hunermendekî navneteweyî bûya û gelek hunermendên navneteweyî derbas bikira.

ŞIVAN: Bi a min gava kurd nebin dinyayî nikarin hunera xwe, edebiyata xwe an jî welatê xwe bi pêş bixînin. Divê kurd bi tenê Kurdistanî nemînin, divê ew bibin insanên dinyayî jî. Mirov çiqasî dinyayê nas bike, mirov bi riya naskirina dinyayê jî dikare xwe û kultura xwe jî nas bike.

F. C.: *Bi a min divê mirov li dîw afirandina tiştên baş be. Û gava mirov di neteweya xwe de tişteki baş biafirîne, ew tiştê baş dikare di navneteweyî de jî başiya xwe biparêze. Gava mirov muzîkeke baş çêbike, romaneke baş binivîsîne, şîreke baş binivîsîne; an jî erebeyeke baş çêbike, bivê nevê ew ê di dinyayê de jî qîmetê xwe bibîne. Bala xwe bidin edebiyatê. Îro ji sedî heystê edebiyata bedew ji wergerê pêk tê. Û berhema baş, di navneteweyî de jî başiya xwe dide hîskirin û cihê xwe digire. Ev ji bo muzîkê jî wilo ye û ji bo şaxên huner û edebiyatê yên din jî wilo ye. Bi a min ev yeka ha ji bo teknîkê jî derbas dibe. Nizanim tê bîra we, li Tirkîyeyê otomobîlek bi navê "Anadol" hebû. Xwedê giravî çêlekan dixwar. Lê ew Anadol nikare navneteweyî bibe. Lada nikarîbû navneteweyî bibûya. Lê herçî Mercedes an jî Volvo ye ew hem li welatên xwe otomobîlên baş in, hem jî li bazara dinyayê. Mînakên bi vî awayî gelek in, lê bi kurtî gava mirov bixwaze tişteki ava bike, divê bi pîvan û normên dinyayê werin avakirin.*



Lê herçî muzîka Şivan e, ew dinyayî nebûbe jî, dîsa mirov dikare bibêje ku ew bi çend gavan ji sînorên Kurdistanê derketiye. Li dinyayê neyê guhdarîkirin jî, endamên hin gel û neteweyên rojhilata navîn bi kêfxweşî lê guhdarî dikin. Tê bîra min, di salên 77, 78an de, gava hin tirkan lê guhdarî dikirin, ji min dixwestin ku ez ji wan re wergerînim. Erê, wan ji zimanê kurdî fêhm nedikirin, lê kêfa wan ji muzîk û awazên Şivên re dibat.

BAKSÎ: Divê mirov tiştekî ji bîr neke, tu hunermendê kurd, tu dengbêjê kurd mîna Şivan herçar perçeyên Kurdistanê nekirin yek. Şivan bû dengbêjê herçar perçeyan. Şivan bû dengbêjê kurmançî, soranî û zazakî. Ka kîjan dengbêjî ev kiriye? Îro tu biçî mala kurdekî Mehabadê jî li Şivan guhdarî dike, tu biçî Silêmaniyê jî li Şivan guhdarî dike û tu biçî Diyarbekir û Qamîşloke jî li Şivan guhdarî dike. Ji bo hunermendekî ev bûyereke mezin e.

ŞIVAN: Bi baweriya min ji bo miletekî ev serbilindiyek e. Ji xwe mezinbûna miletekî di vir de ye. Mesele faris xwe bi Fîrdewsî û Xeyam mezin dikin, ermenî xwe

bi Xaçatoryan mezin dikin, tirk xwe bi Pîr Sultan, bi Karacaxolan xwe mezin dikin; divê kurd jî xwe bi Evdalê Zeynikan, bi Ehmedê Xaniyan, bi Feqehê Teyran mezin bikin. Û divê di vê dema modern de jî kesên weha hebin.

Berî niha bi demekê min li MED-TVê temaşe dikir. Yê ku program bi rê ve dibir, digot, ji bo çî ji nav kurdan hunermendek dernakeve, nivîskarek dernakeve, şaîrek dernakeve. Çawa derneketine. Derketine, lê rê li ber digirin. Wan dikin qurbana meseleyên siyasî.

F. C.: *Ka em dîsa hebekî ber bi paş de vegehin. Tu berî me gelekani ji welêt derket. Tu kengî û çima ji welêt derketî û tu pêşî li kîjan welatê Ewropayê bi cih bû?*

ŞIVAN: Ez di nivê 76an de ji welêt derketim?

F. C.: *Çima. Tu çima derketî?*

ŞIVAN: Êdî ez nikaribûm li Tirkiyeyê bijiyama. Li Tirkiyeyê gotina stranan, kirina hunerê, an jî şoreşgertî ne karekî hêsan bû, zehmet bû, bi rîsk bû; ger ez li wir bimama, wan niha zûde ez kuştibûm.

BAKSÎ: Min û Şivan di 76an de hevdu li Almanyayê nas kir. Ji xwe gava ew ji Tirkiyeyê derket, ew ê dîrek bihata Swêdê ba min. Nûredîn Yılmaz adresa min dabû Şivan û gotibû here ba Mahmûd Baksî.

ŞIVAN: Lutfiyê birayê te jî adresa te dabû min û xwestibû ez werim Swêdê.

BAKSÎ: Rast e, Lutfî jî adresa min dabû te. Lê gava Şivan gihîşt Almanyayê, min jê re got, Şivan, va ye dolmîş hazir e, têkeviyê em herin Swêdê. Şivan nexwest û got gelê kurd li vir e û ez dixwazim li vir bimînim. Got, ez naxwazim ji gelê xwe biqetîm. Bi rastî Şivan wê çaxê biryareke baş dabû.

F. C.: *Me bîska din behs kir, di vê pêvajoya dirêj de Şivan qet ji zirveyê neket, ew di warê muzîkê de her heye û hebûna xwe daye ispatkirin, navê xwe her biştiye. Mîna hûn jî dizanin jiyana surgunê, jiyana li biyanîstanê zehmet e, hin insan têk diçin, wenda dibin û careke din jî qet bi ser xwe de nayên. Gelek lawên bavan wenda bûne. Gelek nivîskar û hunermendên mezin di quncikan de hatine jibîrkirin, ketine krîzên jiyana biyanîstanê. Lê belê, jiyana surgunê hin kesan jî digihîne, navên wan gerdûnî dîke. Jiyana surgunê çî tesîrê li te dîke an jî çî tesîrê li te kiriye, Şivan?*

ŞIVAN: Jiyana surgunê gelek tişt daye min û gelek tişt jî ji min standiye.

F. C.: *Celebê derketina te celebê serîhildan û protestoyê bû. Muzîka te bi naverokeke milî û militanî ve mişt bû. Lê piştî tu derketî Ewropayê û demekê li Ewropayê mayî, tu hêdî hêdî li klasîkan vegehiyayî. Gelo ev ji ber hîseke romantîk ya nostaljiyê û bêrikirina welêt bû, an jî ji ber têgihîştina girîngiya ji nû ve vejandina muzîka kurdî ya klasîk bû?*

ŞIVAN: Hemû sîcê Mahmûd Baksî bû, haa, ha, haaa...

F. C.: *Yanî Baksî kir ku tu li klasîkan vege?*

ŞIVAN: Mahmûd hevalê min yê pir baş bû. Wî dît ku ez klasîkan jî baş dibêjim, ez klasîkan jî baş nas dikim, dengê min baş li klasîkan jî tê, haya min ji hemû klasîkan heye. Herweha wî dît ku ez bi klasîkên kurdî mezin bûme, loma wî ji min daxwaz kir ku ez dest pê bikim û klasîkan jî bibêjim.

F. C.: *Gava mirov li muzîka te guhdarî dike, di hin deman de tesîra hin tiştan dibîne. Kê zêde piraniya kasetên te siyasî ne, lê hinek ji wan siyaseta partîtiyê ne. Çima?*

ŞIVAN: Niha ji kasetaya yekê heta ya pêncan min bi dilê xwe derxistine. Lê kasetên şaş û heftan bê dilê min derketin. Min nedixwest ew wilo derkevin, min nedixwest ku hunera kurdî şexsiyeta xwe wenda bike û bibe berdevkê siyasetan. Ji ber ku ez li dûv avakirina hunereke bi şexsiyet im. Lê mixabin, ew bê dilê min derketin û di rêwîtiya min ya hunermendiyê de şaşiyeke dîrokî bû.

Gava ez vê dibêjim, ne ku ez dibêjim divê hunermend bê nêrînen siyasî bin. Na. Hunermend jî wek her kesî dikarin tişteki, dikarin nêrînekê an jî îdeolojiyekê biparêzin; dikarin bibêjin ev partî rast e, an ev şaş e, lê divê wê tevî hunera xwe neke. Loma min bi dilê xwe, nexwestiye ku muzîka min têkeve bin tesîra tu hereketeke kurdan. Mixabin, pir hatin ser min, ez pir nerehet kirim. Ez mecbûr kirim ku ez tiştinan bibêjim, lê bê dilê xwe.

F. C.: *Çi di kasetên şaş û heftan de heye ku te bê dilê xwe gotine?*

ŞIVAN: Tesîra siyasî bû, lo. Bi dû min ketin, kirin ku ez li gora wan bibêjim. Berî her tiştî, pir kêfa min ji xebata civakî re tê. Ez gelekî kêfxweş dibim gava ez dibînim ku gelê kurd xwe organîze dike, bi hev re dixebite, destên xwe didin hev. Gava kurd ji siyaseta û partiyên xwe hez dikin, ez pê kêfxweş dibim, ev pir rind e. Lê divê bi qasî ku gelê kurd ji partiyên xwe yê siyasî hez dike, ji hunermend û nivîskarên xwe jî hez bikin, qedrê wan jî bigirin. Divê gelê kurd ji edebiyata xwe jî hez bike, ji muzîka xwe jî hez bike, ji şexsiyetên xwe jî hez bikin. Min her gav ev nêrîna ha parastiye. Ez her tim li dijî nêrînen ku dixwazin hunermend û nivîskarên ji bo berjewendiyên siyasî bi kar binin, derketime. Loma jî partiyên kurdan gelekî hatine ser min, ez pir êşandime.

F. C.: *Ji ber ku ez bi xwe jî pir ji muzîka klasîk hez dikim, ez dixwazim dîsa werim ser muzîka klasîk. Ez bawer dikim te bîska din baş bersiva min nedabû. Gelo te ji bo çî dest bi muzîka klasîk kir?*

ŞIVAN: Ha, ez werim ser wê jî. Rojekê Mahmûd ji min re got, yaho dengê te pir li klasîkan tê. Xwe hebekî biguhere, hebekî ber bi çîhana klasîkan de were, klasîkên me roj bi roj dimirin, wenda dibin. Ev tesîra ku te evqasî li kurdan kiriye, êdî

xelk hew li Mihemed Arif jî guhdarî dikin, li yên din jî guhdarî nakin. Ji ber van stranên te yên siyasî xelk hew guhên xwe didin klasîkan. Loma, divê tu li klasîkan vegeerî û wan bibêjî. Baksî got, dibe ku ez bikaribim stranên klasîk ji te baştir bibêjim, lê wê kes li min guhdarî nekin, xelk ê li te guhdarî bikin.

F. C.: *Baş e, Baksî, te çima xwest Şivan stranên klasîk bistirê?*

BAKSÎ: Ez nivîskar im, ez bi kultura gelê xwe mezin bûme. Şivan ji kasetaya yekê heta ya pêncan li ser şoreşgeriyê û li ser kurd û Kurdistanê got, pir hate girtin, pir hate hezkirin û filan û bêvan. Lê tu dibînî, neyar ne bi tenê "Kî ne em" qedexa dike, her wisan ew "Xezalê" jî qedexa dike, "Hey lo lo delal" jî qedexa dike. Ez fikirîm, çawa hemû şoreşgerên me rabûn mala xwe şewitandin û di wê demê de bi tir-kî li ser Lenîn û Stalîn xwendin, ji rastiya Kurdistanê û ji kultura xwe bi dûr ketin; min dît piştî demekê muzîka Şivan jî wisa dibe. Min got, Şivan, ez bi heyrana te me, ez bi qurbana te me, klasîkên kurdî li ber mirinê ne, tu ji gelê kurd re arşîvekê çêbike, dest bi klasîkan bike, klasîkan bibêje. Ger ez rabim bibêjim, an yekê din bibêje, wê gelê kurd zêde guhên xwe nediyê, lê ger tu bibêjî, wê gelê kurd jê hez bike û divê klasîkên kurdî werin hezkirin. Lê bi şertekî, bê ku tu orjînalê stranên xerab bikî, lê bi uslûba xwe bibêjî, ruhekî nû bidiyê, wê cihê xwe di dilê gelê kurd de bigirin, wê xelk ji *Bavê Fexriya* hez bike, wê xelk ji *Kirîvo* hez bike. Te *Kirîvo* got, dinya rabû, te *Bavê Fexriya* got, dinya rabû. Te *Dotmam* got, dinya rabû. Min ji Şivan re got, ger tu klasîkan nebêjî ez ê ji te bikevim şikê. Şivan nikarîbû negota. Ji ber ku Şivan bi wan mezin bûbû, Şivan bi "Kî ne em" mezin nebûbû. Şivan bi Mihemed Arif, Meyremxan, Hesenê Cizrewî, Seîd Axa û Kawis Axa mezin bûye. Gelo kî dikare piştî Kawis Axa mîna Şivan "Xalo" bibêje?

ŞIVAN carinan îtiraz dikir, digot, Baksî, xelk min bi awayekî nas dikin, ger ez stîla xwe biguherim dibe ku xelk reaksiyoneke ne baş nîşan bide.

F. C.: *Rast e, guhdarên Şivên, Şivan bi awayekî, bi stîlekê, bi muzîka protesto û serîhildanê nas kiribûn. Şivan, gelo gava te stranên klasîk gotin, xelkê çî got, reaksiyona guhdarên te çî bû?*

ŞIVAN: Hinek pir aciz bûn, pir rexne kirin, hinek jî pir kêfxweş bûn.

F. C.: *Rexneyên wan çî bûn? Li çî rexne digirtin?*

ŞIVAN: Yên ku hîsên kurdî li ba wan xurt bûn, netewehez bûn, bi kultura kurdî mezin bûbûn, wan pir jê hez kirin. Gotin, Şivan bi gotina stranên klasîk tişteki pir baş dike, pir pesin dan. Tê bîra min, kasetaya min "Nazê" pir hat firotin, ji "Ya sitar" bêtir hat firotin. Bi a min kasetaya min "Ya sitar" yek ji kasetên min yên baş û bi ser ketî ye, lê "Nazê" bêtir hat firotin. Vê jî da xuyakirin ku xelk ji klasîkan hez dikin, li klasîkan digerin. Lê herçî şoreşgerên komunîst bûn, bi min kenîyan, henekê xwe

bi min kirin, gotin; "Ev çi ye Xeydokê, Kirîvê? Bi tirkî gotin, ne dir bunlar? Yanî ev çi ne. Gotin, tu Şivan î, tu şoreşger î, Xeydokê Xeydokê ne karê te ye.

F. C.: *Ez bawer dikim piştî bi demekê fikra parastina klasîkan, an jî fikra ji nû ve vejandina ziman û edebiyata kurdî bi ser van celeb fikran ket.*

ŞIVAN: Rast e, lê tiştêkî din jî heye, gava ez derketim, ger min bi tenê klasîk bigota, ez ê ewqasî nehatama hezkirin. Gelek kesên ku ji min xweştir klasîk gotine jî hene, lê bi qasî min nehatine naskirin. Ji ber ku hewcedariya kurdan, hewcedariya gelê kurd bi dengêkî wek dengê min hebû. Min di destpêkê de got ku ez hunermendekî protestoyê bûm. Lê ez bawer dikim me niha ew dem derbas kiriye, hewcedariya me zêde bi wî celebê muzîkê nemaye. Û kurd jî êdî li xwe vedigerin, êdî ji ziman û edebiyata xwe, ji kultur û hunera xwe hez dikin û xwe pê serbilind hîs dikin.

F. C.: *Niha Şivan, herçiqas baweriya mirov bi propogandayê neyê jî, lê gava mirov li te guhdarî dike, tu bi dengê xwe û bi ajûasyona xwe guhdaran radikî ser lingan, tu mîyê laşê wan li wan gij dikî. Gelo tu rê û metodeke te ya taybetî heye?*

ŞIVAN: Yek jê dengê min dengêkî taybetî ye, dengêkî nihurandinê ye. Ya din hisiyatê min tesîrê li xelkê dike, celebê axaftina min ya pedagojîk tesîrê li xelkê dike. Gava ez dibêjim; *ey karker û xebatkar, bes e, dem hatiye rabin!* Gava ez weha dixifim xelk di bin tesîrê de dimînin. Min her tim ji guhdarên xwe pirsîye bê kî ji çi hez dikin. Lê bi rastî jî klasîkên kurdî kaniya kultura kurdî ye, kaniya huner û edebiyata kurdî ye. Hunermendê ku bi klasîkan nizanibe ne tu hunermend e û nabe hunermendekî cihêxwegirtî jî.

Gelek hunermendên bi eslê xwe kurd hene, lê bi tirkî distirên, ma mirov dikare ji wan re bibêje hunermendên kurd, na. Aramê Tîgran, ne kurd e, ermenî ye, lê ji ber ku ew bi kultura kurdî mezin bûye, stranên kurdî baş nas dike, stranên kurdî xweş çêdike, dengê wî dengêkî kurdî ye, loma ew hunermendekî kurd e.

F. C.: *Ez bawer dikim di jiyana te ya surgunê de hin zîzkakên te yên siyasî çêbûne. Tu bi partî û rêxistinên kurdan yên cihê cihê re xebitî yî. Hûn carinan gelekî dost û carinan jî bûne dijminên hev. Ew girseya ku ji te re li çepîkan dixist, demek hat ku hêk û firingiyên xerabe avêtin te, lê piştî demekê dîsan ji te re li çepîkan xistin. Gelo ev çi ye? Ev çi psikolojî ye? Çima weha dibe?*

ŞIVAN: Ez nizanîm, lê ev qedera kurdan e. Niha, herçî siyaseta me ye, li hundur ava nebûye, koka wê, rehê wê ne ji hundur e, bêtir berhemên derve ye, derve bêtir tesîr li me kiriye. Loma ez dikarim bibêjim ku me di siyasetê de jî şexsiyeta xwe negirtiye. Di tiştên kulturî de gava mirov baş bixebite, mirov dikare hinekî şexsiyeta xwe bigire, lê di tiştên siyasî de hinekî zehmet e. Ez nabêjim siyasetvanên me ne



tiştekek in, na, insanên me pir xebitî ne, pir zehmetî dîtine, serên wan li gelek dîwaran ketine, ji ber vê yekê jî siyasetvanên kurdan tim şerê hev jî kirine, di navbera wan de tim neyartî û dijminatî hebûye û heye. Tu li Ehmedê Xanî dinerî, tu li kîjan nivîskar û hunermendên kurdan dinerî, tim li ser yekîtiya kurdan gotine û nivîsandine. Wan tim li ser şerê kurdan şîr nivîsandine, tim li ser belengaziya kurdan helbest nivîsandine. Vê dawiyê jî, ji ber ku hereketa Kurdistanê Tirkiyeyê bêtir çep û komunîst bû, ew pir di bin tesîra çep û komunîstên tirkên de ma. Herçî çepê tirkên bû jî, wan her yekî li gora xwe hozanek, li gora xwe dengbêjek çêkiribûn. Gava wan hozan û dengbêjan behsa xwe û şexsiyeta xwe bikirana, partî û rêxistinên wan qebûl nedikirin, digotin tep û ew davêtin, carinan hin nav jî bi dû wan dixistin û ew wilo îzole dikirin. Lê ji aliyê din ve hunermendên bûrtjûwazî, mîna Zekî Mûren û yên din, ji ber ku wan hunera xwe dikirin, ji ber ku ew azad bûn ku mîna hunermend tev bigerin, wan dikarîbûn xwe bi pêş jî bixistana û dikarîbûn mîna hunermend bibûna xwedî şexsiyet jî. Lê yên çep û komunîstan mîna alavên şoreşê

dihatin bikaranîn. Mîna alavên propogandayê dihatin bikaranîn. Gava lazim nebûna dihatin avêtin. Yanî ew li pêşberî pêşketina hunermendan asteng û kelem bûn.

BAKSÎ: Ji berdêla ku siyasetvanên me rê li ber hunermendan vekin, wan bi pêş de bibin, ew ji bo propogandaya xwe dikirin alet.

ŞIVAN: Bawer bike, ez bi xwe ji nava siyasetan derneketime. Min hertim xwestiye ez alîkariya wan bikim. Lê mixabin herkesî xwest mohra xwe li min bidin. Ez bi dilekî xweş nêzîkî kê dibûm, min bixwesta ez piştgirî û alîkariya kê bikim, wan dixwestin ew min bi kar bînin. Lê min dixwest hereketa kurdî xurt bibe. Lê gava tu xizmeta wan dikî, hew tu dibînî ku destê xwe davêjin te û dibêje, tu bi me re yî, tu hevalê me yî. Lawo, kuro, bisekine, yên din jî li gora xwe xizmeta welatê xwe dikin, xizmeta millet dikin. Min nekin dengbêjê xwe, min nekin propogandîstê xwe, min nekin şarlatanê xwe, bisekine, divê ez hunerê çêbikim, bila serê min azad be, nekin ku ez hunereke bi qajeqaj li dijî we çêbikim, bihêlin ez hunereke weha çêbikim ku bi kêrî gelê kurd were, bila hunera kurdî bi pêş bikeve. Bihêlin ez li ser edebiyata kurdî hunerê çêbikim, li ser jiyana kurdan ya sosyal çêbikim, li ser pêşketinê çêbikim, li ser her warê jiyane hunerê çêbikim. Gava hûn tên ser min hûn min mecbûr dihêlin ku ez li dijî we bibêjim, ev ne rast e, hûn bi vê yekê şaş dikin. Bawer bike, ez nêzîkî kîjan tevgerê bûme, xwestine min bi kar bînin, loma min jî kiriyê qareqar û ez ji wan reviyame.

BAKSÎ: Şivan ji kê reviya be wan darbe xwarine, hevalbendên wan kê mîna bûne. Şivan ji wan re digot binerin, neyên ser min, hûn bi min li ser lingan in. Şivan digot, ma ji we we ye evqas millet ji bo birêvebirên we tên, na, ew tên ku li dengê min guhdarî bikin.

ŞIVAN: Welehî min dixwest ji bo wan werin. Lê Firat can, huner ne ew e ku bi alet be, divê huner bi serê xwe rola xwe bilîze, divê tevgerên siyasî jî netirsin, ew jî bi serê xwe rolên xwe bilîzin. Gava hunermendek ruhê milletê xwe yê kulturî û neteweyî bi hêz kir, wê ruhê wî yê siyasî jî bi hêz bibe. Îcar heqê siyasetvanan tune ye ku ber li hunermendan bigire, hunermendan têxe nava tarîqata xwe. Bi tarîqatan û tarîqatçîtiyê huner bi pêş nakeve, hunermend nabe hunermend, şexsiyeta wî dimire. Çawa tirk ji kurdan re dibêjin, hûn di nav min de ne, ez ê biryarê bidim bê tu ê kengî bistirê, kengî biaxifi, tu ê kengî bibêjî. Vêca yên me jî eynî wek tirkan dikin, dibêjin, em siyaset in, divê tu di nava min de bî, ez kengî qerarê bidim divê tu bistirê, ez çi bixwazim divê tu wê bibêjî. Car hebû hinekan dihatin ji min re digotin, ma te destûr xwestiye tu kasetan çêdikî?

BAKSÎ: Bi tirkî ji Şivan re digotin, seni bitiririz, yok ederiz, biliyor musun?...

ŞIVAN: Û dihatin di şevan de sloganên belaheq davêtin, lo car hebû kevîr diavê-

tin min, car hebû şev xerab dikirin, şer derdixistin. Ez pir pê diêşiyam. Tu dizanî çima ez diêşiyam? Ji ber ku min dizanîbû yên ku xerab dikirin wê yek bi yek herin, lê ez ê bimînîm.

Bi rastî tu carî fikreke weha di serê min de peyda nebûye ku ez gel li dijî siyasethan organîze bikim, ez li dijî wan bixebitim, berevajiyê wê, min hertim xwestiyê gel li dora partiyên xwe yên siyasî bicivin, li dora wan organîze bibin. Hewcedarariya me pir ji partiyên me yên siyasî heye. Bi tembûra min gel azad nabe. Min ji wan re digot, divê her tişt di warê xwe de bi hêz bibe, bila her tişt di warê xwe de xizmetê bike, em ber li hev negirin, lê em rê li ber hev vekin. Em rê li ber rojnamevan, nivîskar, şair û hunermendên xwe negirin, em wan nekin peyayên xwe, em wan azad bihêlin da ku ew jî bi seriyekî azad şîretan li me bikin, aqil bidin me, rê nîşanî me bidin. Da ew bikaribin serok û rêberên kurdan bigihînin hev, bi wan re biaxifin, aqil bidin wan. Tu dev ji aqildana wan berde, nehiştin em aqil bigirin. Dibêjin tu çi yî, tu biçûçik î, ez rêber im, ez serok im, ez her tişt im. Hiş e, dengê xwe meke! Wê ev bigihîje ku? Ji ber vê yekê em heta niha bi ser neketine, lê hertim ceşan qezenc kirine. Korucuyan qezenc kirine. Ji ber ku dewlet li pişt wan e, ji ber ku siyaseta kurd bi serê xwe cihê xwe nagire. Tu dizanî ev mîna çi ye? Mîna ku yek ketibe avê, yekî din jî xwe pê girtiye, dibêje an tu ê jî bi min re bixeniqî an jî tu xelas nabî.

F. C.: *Tu xwe hunermendekî siyasî, an jî siyasethanekî hunermend dibînî?*

ŞIVAN: Ez xwe hunermendekî siyasî û çandî dibînîm. Ez nikarim dûrî siyasethan bimînîm. Ji ber ku Kurdistan perçe ye, gelê kurd bindest e, loma ez divê xwe siyasî jî bibînîm, divê ez hunera xwe bi siyasethan jî bixemilînim. Divê ez baş bi siyasethan bizanibim da ku ez bikaribim bi riya huneneke têr siyasethan bi kêrî gelê xwe jî werim. Divê ez baş bi siyasethan bizanibim da ku ez di warê xwe de durust bim, bi xelkê xwe re durust bim; ez bikaribim şîret û rexneyan li serok û birêvebirên kurdan bikim. Ez gerek hunermendekî siyasî û çandî bim, ez divê bi edebiyata xwe jî baş bizanibim. Belê, ez nikarim ji gelê xwe biqetim. Ji ber ku ez bi gelê xwe heme. Niha ger gelê kurd gelekî azad bûya, wê problemeke min ya weha tunebûya. Lê gelê kurd ne azad e, bindest e, loma divê ez jê neqetim.

BAKSÎ: Ez dixwazim di vir de tişteki dibêjim. Berî her tiştî Şivan siyasethan e. Berî hunermendiyê Şivan siyasethan e. Loma heqê kesî tune ye jê re bibêje, de here lo, here ji xwe re li tembûra xwe bixe û stranên xwe bibêje! Gava wisa dibêjin jî, ew Şivan biçûk dibînî.

F. C.: *Mixabin, kurdên ku doza kurdîtiyê dikin nikarin ji derveyî siyasethan bimînî. Çi hunermend, çi rojnamevan, çi jî nivîskarên ku bi kurdî dest bi xebata xwe dikin,*

ew bixwazîn nexwazîn mecbûr dimînin ku têkevin nava siyasetê. Ji ber karê ku dikin karekî qedexe ye. Ew nexwazîn siyasetê bikin jî, neyarên wan wan dikişînin nava siyasetê. Li gora qanûnên serdestan ew karên qedexe dikin, li dijî polîtîkayên resmî derdikevin û loma divê werin cezakirin. Gava weha dibe, ew mecbûr in siyasî bibin û mecbûr bi siyasetwanan re ji bo ji holêrakerina sîstema nedemokratîk têkoşînê bidin. Bi gotine gelêrî "mîmlî" dibin. Bi a min siyaseta divê neyê maneya siyaseta partîtî an jî îdeolojîk. Ji ber ku li welatekî wek Tirkiyeyê gava tu bi kurdî distirê tu siyaseta dikî, gava tu bi kurdî dinivîsînî tu siyaseta dikî, tu bi kurdî rojnameyekê derdixî tu siyaseta dikî. Ev tiştên qedexe ne, tu jî li dijî van qedexeyan serî hildidî, tu van qedexeyan protesto dikî. Loma, mafê her kurdî heye ku di warê çarenivîsa kurdan de xwedîgotin be.

Lê ji aliyê din ve siyaseta partîtiyê, siyaseta îdeolojîyê heye. Hin hunermend û nivîskar ji xwe re wê riyê diçibînin, dixwazîn ji bo partiya xwe û ji bo îdeolojîya partiya xwe bistirên û binivîsînî û çî kesên ku li derveyî nêrîneke weha bin jî bi zimaneke tîj wan rexne dikin. Ez nabêjim, divê hunermend û nivîskarên weha jî tunebin, na, divê hebin, lê huner û edebiyata ku ava dikin çiqasî bi ser ketî ye, li ortê ye. Niha ev ne bi tenê li ba me wilo ye, ev li her derê dinyayê wilo bûye û hê jî heye. Di dema Bolşevîkan de em dizanin ku gelek hunermend, nivîskar û şairan li ser şoreşê, li ser serokatîya şoreşê, Lenîn û Stalîn gotine, nivîsandîne û ew birine ber perê esmanan. Ew jî celebekî hunerê ye. Bi ya min, ger hunermend û nivîskar xwe bêtir konsantreyî karê xwe bikin, bi talîmat û tebdîdan nebêjin û nenivîsin, wê berhemên baştir bidin.

ŞIVAN: Niha ez ji te re rastiye bibêjim, her kes xwediyê kapasîteyekê ye, her kes li gora kapasîteya xwe dikare bike û bixebite. Mesele gelek tevgerên siyasî ji xwe re hunermend derxistine, heta xwestine ji min re bikin raqîb. Helbûkî, gava hunermendekî kurd derdikeve û hunereke baş çêdike, dilê min pir şa dibe, ez pir kêfxweş dibim. Ez dibêjim, baxçê me rengîn dibe. Li baxçeyê hunera Kurdistanê ez ne guleke bi serê xwe me, ne bi tenê ez tê de heme, bila ew baxçe ji gulên têvel rengîn bibê. Belkî ji gula min jî pir gul derkevin, ji koka min jî pir gul derkevin, çiqasî xweş e, mirov bextiyar dibe. Ji bo baxçê me rengîn bibê, divê hejmara hunermendên me zêdetir bibê, hunermendên xweş û delal distirên divê pir bibin. Hin siyasetan hin hunermend derxistin da ku wan ji min re bikin raqîb. Mîna her tiştî di hunerê de jî reqabet ne xerab e, gava yek derket û mîna min muzîk çêkir, ez ê bibêjim, aha, ev muzîkeke xweş çêdike, divê ez muzîka xwe baştir çêbikim. Mirov ê bixwaze, ev di tebîeta mirov de heye. Polîtîkvan jî wê bixwazîn karê xwe baştir bikin, hunermend jî wê bixwazîn karê xwe baştir bikin, nivîskar jî wê bixwazîn karê xwe baştir bikin. Reqabeteke weha ji bo pêşketina hunerî ne xerab e. Helbet wê her hunermend bixwaze hunermendê herî baş be, ez jî dixwazim hunereke baş bikim.

Lê, ez ji te re tişteki bibêjim, ez reqabeta xwe nabînim. Çima? Ji ber ku kîjan hunermend derketine, çend stran gotine û paşê ji ortê wenda bûne. Ji bo hunermendekî kapasîteyeke hunermendane pêwîst e.

F. C.: *Carinan tê gotin ku dengê flankes an jî bêvankes xweş e, ew hunermendekî mezin e. Gelo hunermendî bi tenê dengxweşî ye?*

ŞIVAN: Na, huner ne bi tenê dengxweşî ye. Huner ew e, gava te ew tekst, ew melodî, ew armanc, ew fikir bi hev ve girê dan û tu bikaribî wê bixe serê insanan, pê qebûlkirin bidî, hingê ew dibe huner. Divê tu bi hilma dengê xwe, bi gotinên xwe, bi awazên xwe, xwe bixî serê xelkê. Hunera mezin ew ku tu bikaribî bi insan qebûlkirin bidî. Divê mirov bi aqilî hereket bike, biaqilî hunerê ava bike. Huner ne ew e ku dengê te xweş be. Huner ne bi tenê dengxweşî ye. Bila her kesên dengxweş nebêjin, em hunermend in, em ê her tiştî bikin, naa, bila pir biaqil bin, bila dilê wan pir fireh û giran bin, bila hisên wan pir kûr bin, bila ji kûraya hisên xwe stranên pir baş bixemilînin. Car heye straneke min çar salan diajo. Hin stranên dîrokî hene ku ez bi kêmanî çar salan li ser dixebitim, heta ku straneke baş tê holê. Ez çêdikim, xera dikim, çêdikim, xera dikim. Divê gotin, melodî, awaz baş hevdu bigirin da ku berhemeke baş jê derkeve. Ya din jî divê di stranekê de mesajek hebe. Heger mesajeke evînî be, divê mesake evînî ku dilê insanan pir xweş dike hebe, heger mesajeke siyasî be, divê mesajeke siyasî î pir xurt hebe, heger mesajeke aş-tî be, divê aştiyê pir baş bide fahmkirin, heger mesajeke sosyal be, divê mînakeke baş bîne holê, mirovan fêr bike, perwerde bike...

F. C.: *Gava mirov bi awireke dîrokî li hunera Şivên dinere, bi naverok, stîl û şeweyê xwe ekolekê tîne bîra mirov. Û vê ekola ha hem tesîr li niuşek hunermendên kurdan kiriye, hem jî li hunermendên tirkên yên esilkurd kiriye. Herçî hunermendên kurdan in, hin hunermend ne tê de, wekî din bi piranî mirov tesîra ekola Şivan ya li ser wan dibîne. Û hunermendên ku bi tirkî distirên, gelek ji wan bi kopya Şivan bûne navên mezin û herweha dewlemendên mezin. Gava tu vê yekê dibînî tu çî hîs dikî Şivan? Tu hêrs dibî an jî kêfxweş dibî?*

ŞIVAN: Niha, pir normal e. Ez zimanê xwe ji dê û bavê xwe hîn bûme, ew jî ji dê û bavê xwe hînî zimanê xwe bûne. Mirov wilo xwedî dibe ku ev ziman min bi tenê çênakiriye. Ev ziman bi sedsalan, bi hezar salan, dê û bavên me, kal û pîrên me girtine û heta vê roja me anîne. Herçî muzîka kurdî ye, ew jî ne min bi tenê çênakiriye, ez berdewama hinin din im. Niha, çima gelekî behsa Evdalê Zeynikê tê kirin. Di eslê xwe de Evdal feqîrek bûye. Ew di qonaxa Surmeli Memed Paşa de dengbêjek bûye. Ew dengbêjê Surmeli Memed Paşa bû. Korbûna Evdalê Zeynikê jî ne meseleya nexweşî mexweşiyane, ew ji bo jinan kor kirine. Yanî jin çav lê dike-



tin dilê wan diketin Evdêl, ji ber ku Evdal jî li wan dinerî, rabûn Evdal kor kirine. Kes vê nebêjin jî, ez dibêjim. Ji ber ku gava mirov dengxweş be, an jî zarxweş be, mirov balkêş dibe, xelk ji mirovên weha hez dikin. Ji ber ku jin diltenik in, jin zû-tir aşiq dibin, jin bêtir hez dikin. Loma jî li ser hunermendan gelek mubalexe çêdibin, lê tu bixwazî nexwazî tên hezkirin. Gava min bi xwe dest bi muzîkê kir, min negot, ev bi tenê ya Şivan e, ev divê ekola min be. Tiştin hebûn min jê hez dikir, baweriya min pê hebû. Heger hûn dîqet bikin, min ne bi tenê ekolek çêkiriye. Gava hûn bala xwe bidinê, min bi kurdî muzîka Rapp jî çêkiriye. Heger ez emerîkî bûma, wê ji min re bigota bavê muzîka Rappê. Min berî emerîkî û ewrûpiyan, yanî min donzdeh sal berê Rapp gotiye. Ev jî strana "Kî ne em" e. "

Kî ne em?

Gelê Kurdistan

Şoreş û volkan...

...

Min bi axaftin ev gotiye. Gava min ev stran çêkir jî ez di bin tesîra tu kesî de nename. Çi ji hisê min dihat min digot. Li gora tekstê, li gora rewşa wê şîhrê, wê helbestê, min besteyên xwe çêkirine, min awaz daye wan. Wek min got, heger ez Ewrûpî an jî Emerîkî bûma, bi rastî jî ji bo strana "Kî ne em" wê bigotana Şivan bavê muzîka Rappê ye.

Hinek dibêjin baş e, Şivan hunermendekî siyasî ye, heta vira anî, lê gelo Şivan di muzîka xwe de çend dangan bi kar tîne? Vîbratoyê, pelor pir baş bi kar tîne, tenorê bilind jî derdixîne. Rast e, ez ne dengbêjekî yekduze me, ez bi awayên cihê pir dangan derdixim, lê ekoliya min ne ji vê ye, heger ekoliyeke min hebe, ew jî ji ber ku ez mîna hunermendekî protestoyê derketim, min bala xwe berda ser problemên siyasî û civakî û min xwest ez bi alîkariya muzîkê kurdan hişyar bikim û wan bi meseleya wan ve bikim yek. Min xwest ez bi muzîka xwe welat û gel di warê sosyal de bipêş bixim. Ev yeka ha mamostetiyek e, bêtir siyasî ye.

F. C.: *Tu bi xwe di bin tesîra çi celeb muzîkê an jî kîjan hunermendî de mayî?*

ŞIVAN: Ez bi xwe di bin tesîra dengbêjên heremî de mame, ez di bin tesîra bavê xwe de mame, di bin tesîra xalê xwe de mame, di bin tesîra birayê xwe de mame. Esil, ekol ekola birayê min Xelîl e. Xelîl ez xuliqandime. Gava xalê min distira, vîbratoya ku bi kar dianî kesî nîkarî bû bi kar bianiya. Gava xalê min distira her kes digiryan. Navê xalê min jî Xelîl e. Vîbratoya ku birayê min bi dengê xwe yê zîrav dikir, mirov li ber diheliya. Pismamekî min jî hebû, kurê apê min mele, ew jî vê dawiyê ji Kevirzê hatibûn ba me, Silêman. Silêman jî eynî ev deng derdixist. Di eslê xwe de ev ekola malbata me ye.

Tiştin hene mirov difikirîne, mirovan dixê rê. Niha dengbêjên kevin wê stran bi çi bigota:

De siwaro, siwarê mala bavê mino vê sibehê dîsa li hespa xwe siwar bûye di ber mala me re derbas bûye

Keçika me derketiye ber derî carekê destê xwe jê re li ba kiriye

Siwarê mala bavê min tew guh nedayê, ji xelkê alemê fedî kiriye, looo ax...

Lo lo Siwaroo, de Siwaro were bi destê min keçikê bigire bavêje...

...

Baş e, ez fikirîm, min got bavo, ev deng di kurdî de dengê pir xweş e, dengê pir xurt e. Min got, gelo ev civata me, wê çi heyecanê ji Siwaro bistîne, wê çawa wî bîne galeyanê. Min got, gelo civata kurd çawa dikare hêzê bigire, çawa moral bigire, çawa deng bide; çawa li heqê xwe bigere, çawa li xwe xwedî derkeve, çawa bi miliyeta xwe bihese.

BAKSÎ: Ger tu bala xwe bidiyê, di stranên kurdî de xelkê hertim ji qehremanan

hez kirine, ji tirsonek û pîsan hez nekirine. Xelkê ji mirovên mîna Siwaro hez kirine. Mirovên mîna Siwaro di kultura kurdî de sembola qehremanî û mêrxasiyê ne, sembola bedewiyê ne.

ŞIVAN: Baş e, min got wê Siwaro ji kurdan re çi bîne, lazim e, gelê kurd ji kesên ku xizmeta Kurdistanê dikin, hez bike. Rast e, keça li ber derî û Siwaro dildar in, eşqa xwe ji hev re dibêjin. Gelo wê çawa gelê kurd û Kurdistan eşqa xwe ji hev re bibêjin? Divê em vê yekê bi hev fahmkirin bidin, bi hev naskirin bidin.

F. C.: *Herçiqaş tu mîna hunermendekî protestoyê derket û te bi awayekî din dest bi muzîkê kiribe jî, tu dawiyê li Siwaro vegeyriyayî. Tu li Xezalê, li Kirîvo vegeyriyayî.*

ŞIVAN: Niha, ev tarîxa me ye. Tu ji dê û bavê xwe hînî gelek tiştan bûyî. Ger tu îro mîna bavê xwe bifikirî tu nikarî edebiyata dinyayê bînî zimên. Tu ê edebiyata gund, an jî ya Nisêbînê bînî zimên. Lê gava bavê te were ba te, tu ê destê wî maçî bikî û deynî ser eniya xwe, ji ber ku ew bavê te ye. Tu ji bavê xwe pir pêşdetir î, lê ew bavê te ye, tu ji wî hînî gelek tiştan bûyî. Erê em dikarin tiştan pêşdetir bixin, baştir bikin, lê Siwaro dîroka me ye, kultura me ye.

F. C.: *Ji xwe ji bo ku mirov bikaribe bi pêş bikeve, divê mirov li xwe vegere...*

ŞIVAN: Helbet. Divê ev meqamên kurdî yê kevin neyên jibîrkin. Divê em axê neavêjin ser diketin û evîna Siwaro û keçikê û nedin jibîrkin. Divê em evîna wan bidin jiyandin.

F. C.: *Tiştêkî din bala min dikişîne, dibe ku jî ev ji ber dûriya ji welêt û xurtbûna hîsên nostaljiyê bin. Ev hîsên nostalji mirov diajo ser guhdarîkirina stranên kurdî yê klasîk. Ev tiştêkî pir baş e, lê gelek ji hunermendên me yê îro, awazên klasîk diparêzin, naveroka stranên klasîk vala dikin, li gora xwe hin gotinan an jî hin sloganên dixinê û distirên. Gelo tu vê teura ha çawan dibînî? Ev li hemberî muzîka kurdî ya klasîk ne bêhurmetiyek e?*

ŞIVAN: Bi ya min ew ne huner e û ne jî hunermendî ye. Tiştêkî ne baş e, bêhurmetiyêke mezin e. Ez nabêjim divê mirov qet destê xwe nede stranên klasîk, lê gava mirov têkil bû, guhertin tê de kir, divê ew guhertin ji bo pêşketinê be. Lê hinek çi dikin, hem gotinên ku li stranên kurdî dikin bar ne tu gotin in, dengê wan ne xweş e, awazê bingehîn û orjînal xera dikin; bi gotineke din strana orjîna difetîsîne, dikuje. Pir heyf e, divê kurd vê nekin.

Stranek heye dibêje:

Lo şivano, lo şivano, bilûrê deyne ser lêvano

Kulav ketiye nav milano

Lê hunermendê me çi kiriye. Eynî bi meqamê "Şivano" dibêje:

Partîzano, partîzano...

Heger ez ji bo Partîzan stranekê çêbikim, ez ê herim xisûsî stranekê ji bo partîzan çêbikim. Ez starana "Şivano" xera nakim. Mesele min strana *Helebçe* çêkir. Ez bi roj û mehan li ser fikirîm, min serê xwe pê re êşand heta ku min ew stran çêkir. Min neçû tu meqamên kevin xera nekir. Loma jî kes nikare ji min re bibêje te stranên klasîk xera kirine. Baş e, min strana "Xezalê" gotiye, "Xezal" e. Min strana "Bavê Fexriya" gotiye, "Bavê Fexriya" ye.

Ez di vir de dixwazim xwendevanên Nûdemê jî bizanibin, ku heta ez stranekê distirê, ez bi kêmanî deh varyantan didim ber hev. Gava ez straneke nû dibihîzim, ez tavilê nastirê, divê ez bizanibim ka li deverên Kurdistanê yê din ev stran çawan tê gotin.

Divê hunermendên kurd hunera kurdî qirêj nekin, stranên kurdî xera nekin. Bila hunermendên kurdan li ser gerîla, li ser pêşmergan, li ser şehîdan, li ser serokan stranên bibêjin, lê bila bi xwe çêbikin, bi xwe ava bikin. Heqê wan tuneye stranên kevin xera bikin.

Min bi xwe jî di destpêkê de bi stranekê du stranên list, lê ez pir poşman bûm û jê pê ve min hew ew cesaret di xwe de dît, min hew stranên kurdî xera kirin. Min hingî xwe pir rexne kir, ez bi dijarî çûm ser xwe, min got, divê ez careke din şaşiyê weha nekim. "Ka Kurdistanê min ka?", "Ey Ferat, Ferat", "Ey karker û xebatkar bes e...", "Ez xortê kurd im", ev giş meqamên min in, min ev çêkirine.

F. C.: *Baş e, ezbenî, te bîska din di nav sobbeta me re got, ku tu radihîjî tembûra xwe, ji xwe re dinuhurînê... Tu muzîka xwe çawan çêdikî? Tu meqam li ser notayê dinivîsînê, tiştê ku tu mîna meqemê nû dinuhurînê, dixî kasetan, tu çawan dikî?*

ŞIVAN: Berî her tiştî, ruhekî min yê muzîkî î pir fireh heye. Niha, alman otomobîla Mercedes çêdikin, swêdî Volvoyê çêdikin. Lê hemû materyalên Mercedesê ne almanî ne, an jî hemû materyalên Volvoyê ne ji Swêdê ne. Muheqeq hin materyalên van otomobîlan ji deverin din tên. Lê gava em bêjin Volvo li Swêdê çêdibe, her kes dizane ku Volvo otomobîla Swêdê ye, yanî ew dibe malê Swêdê. Mercedes jî her weha... Yê min jî weha ye. Materyalên min hemû ne yê kurdan in. Dinya jî tesîrê li min dike. Gava ez diçim Nûyorkê, ez fikrekê distînim. Gava ez diçim Londrayê, Sydneyê an jî Parîsê, min difikirîne, ew derdor tesîrê li min dike. Ez ji xwe re dibêjim, ev hemû tişt, ev mîmariya ha ji aliyê insanên ve hatine çêkirin. Insan hebûneke kulturî ye. Insanan tiştên mûzem ava kirine. Gava ez jî tiştêkî çêdikim, tiştêkî ava dikim, ez dixwazim ew hêzekê bide kurdan, gelê kurd bi hêz bike.

F. C.: *Baş e, tu muzîkê çawan çêdikî?*

ŞIVAN: Ez li ser difikirim. Ez ji xwe re dinuhurînim. Ez li ku bim, ferq nake. Ez tim jî xwe re dinuhurînim û ez diçim dinyayêke din. Car heye ez radihêjim tembû-

ra xwe û bi saetan lê dixim, bi saetan li ser awazekî nû radiwestim.

F. C.: *Lê xuyaye ji metoda teoriyê bêtir tu metodeke pratîk bi kar tîntî...*

ŞIVAN: Ez ne hunermendekî teorîker im. Min pir hindik teoriya muzîkê xwendiyê.

BAKSÎ: Şivan pêşî meqam dibîne û paşê li ser wî meqamî pir radiweste. Ez bawer dikim ew muzîka xwe wisa çêdike.

ŞIVAN: Mesele ez niha li ser straneke dixebitim. Li ser ruh e. Divê mirov ruh sar neke, ruh wenda neke, ruh germ bihêle. Stran li ser ruh e. Gava ruh diçe mirov diçe, mirov wenda dibe. Divê mirov li ser straneke weha pir bixebite, xwe pir biêşîne. Divê mirov bi rojan, bi mehan, bi salan li ser straneke weha bixebite.

Mîna ku min berê jî got, min zêde teoriya muzîkê nexwendiyê, lê ne ku haya min ji teoriya muzîkê tune ye, belê, haya min jê heye, lê ez bêtir guh didim hîsên xwe, ez bi hîsên xwe muzîkê çêdikim. Ew muzîka ku ez bi hîsan çêdikim, hem tesîrê li min dike, hem jî li guhdarên min dike.

F. C.: *Muzîk ji bo te çi ye? Tê çi maneyê?*

BAKSÎ: Felsefeya jiyane ye...

ŞIVAN: Niha, muzîk ji bo min her tişt e. Ji xwe jiyana bêti muzîk ne tu jiyane. Muzîk ji bo min ken e, girî ye, êş e, elem e, kêfxweşî ye, hîs in; ez çi ji te re bibêjim, her tişt e. Di her tiştî de jî muzîk heye. Ma mirov dikare li filmekî bêti muzîk bifikire, filmên weha hebin jî bêti tesîr in. Çîrokeke ji muzîkê bêpar xav e, ne xurt e. Bi kurtî wek Mahmûd negot, muzîk felsefeya jiyane ye.

Yanî insan bi çi re mijûl bibe, galeyana wî di kîjan warî de xurt be, ew dixwaze wê galeyana xwe di wir de bi kar bîne. Mesele tu di nivîsê de bi kar tîntî, Mahmûd di nivîsê de bi kar tîne; herçî ez im, ez jî di muzîkê de bi kar tînim. Ez bi muzîkê rehet dikim, muzîk min rehet dike. Gava ez straneke bi dilê xwe çêdikim û ez jê razî bim, ez bêhawe rehet dibim. Ez ji xwe re dibêjim, aha min li jiyane tiştê zêde kir, aha, min bersiva tiştê da, aha, min tiştê li gora dilê xwe anî zimên. Ez hingî pir pir kêfxweş dibim. Ez dixwazim di vir de tiştê bibêjim, gava hinek bixwazim min wenda bikin, min tune bikin, bila îşkence mîşkencan bi min nekin, nan û avê ji min nebirin, bila muzîkê ji min bibire, bes e, ez ê wenda bibim, ez ê nemînim. Yanî tu min ji muzîkê qut bikî, ez namînim.

BAKSÎ: Niha, ez dixwazim di vir de tiştê bibêjim, eger mirov roman, çîrok û şîran binivîsîne û li Şivan guhdarî neke, ew tiştên ku tên nivîsandin kême, ne germ û dagirtî ne, tameke xurt ya edebiyatê nade mirov. Ev di nivîskariya min de jî wisa ye. Heta ku ez û Şivan nebûne hevalên hev, min nikarîbû *Hêlîn*, *Gundikê Dono* û yên din binivîsandina. Şivan tesîreke mezin li nivîskariya min jî kiriye. Ez di



stran û kilamên Şivan de aşiq dibûm. Ma insanê ku aşiq nebe çawan dikare binivîsîne?

F. C.: *Ez bawer dikim, tu ne bi tenê distirê, lu tu bi xwe jî li muzîkê, li stranan jî guhdarî dikî. Tu li çi celeb muzîkê guhdarî dikî?*

ŞIVAN: Ne niha, lê berê çi kasete kurdî têketa destên min, min lê guhdarî dikir. Min li yên herî ne xweş jî guhdarî dikir. Min digot ka hela bê ew çi dibêjin, çi gotinên xweş li hev anîne. Yên hinekan dengên wan ne xweş bûn, lê gotinên wan xweş bûn, yên hinan jî dengên wan xweş bûn, lê gotinên wan ne xweş bûn. Yên hinan melodiya wan xweş bûn. Min dixwest ez hînî kûraniya kultura gelê xwe bibim. Min dixwest ez li hemû celeb muzîka gelê xwe guhdarî bikim. Niha, arşîveke min ya muzîkê î pir dewlemend heye. Kurmancî, soranî, zazakî, hewramî, lorî, erdelanî, hekarî, serhedî, dêrsimî, berazî, sînemilî; çi bigire hemû celebên muzîka kurdî û hemû zaravayên kurdî di arşîva min de peyda dibe.

Ez dixwazim vegerim ser pirsan te ya berî vê; min got, ez li her celeb muzîka kur-

dî guhdarî dikim, lê bila neyê maneya ku ez li muzîka dinyayê guhdarî nakim. Min gava din mînaka otomobîla Mercedesê da; min got alman gelek alavên xwe ji derve tînin, lê Mercedes ya almanan e. Ez li muzîka Emerîka Latînî guhdarî dikim, ez li ya emerîkî guhdarî dikim, ez li ya efrîkiyan guhdarî dikim, ez li ya Asyaya dûr guhdarî dikim, ez ji te re bêjim, ez li muzîka Balkana guhdarî dikim. Muzîka Kafkasan li ba min heye. Ez car car li wan jî guhdarî dikim, lê ne her gav. Lê tiştek wek muzîka kurdî ya klasîk tesîrê li min nake. Muzîka klasîk min dibe, min difirîne, min digerîne, min di ser behran re dibe, min di ser ewran re dibe, min li ba dike, min dihelîne. Muzîka klasîk min bêtir terbiye dike, min bêtir rehet dike.

Lê ez li tirkî guhdarî nakim. Gava ez li tirkî guhdarî bikim jî ne ku ez jê zewqê distînim, an jî tesîrekê li min dike, na, bi tenê ji bo ku ez bizanibim ka ew çi dibêjin, çawa distirên.

F. C.: *Baş e, gava tu bi tenê li malê yî, an jî gava tu bi otomobîla xwe rêwîtiyê dikî, tu li dengê xwe guhdarî dikî, an jî tu li hunermendên din guhdarî dikî?*

ŞIVAN: Ez li xwe jî guhdarî dikim, lê bêtir ji bo ku ez bizanibim ka min muzîk çawan çêkiriye, min di ku de şaşî kiriye, ez di ku de bi ser ketime. Ez muzîka xwe bi hevalên xwe jî didim guhdarîkirin. Ez li fikrên wan jî dipirsim, ez dixwazim bizanibim ka ew di derheqa filan an bêvan stranê de çi difikirin.

F. C.: *Ez dixwazim em hebekî vegerin ser aliyê madî, ser belavkirin û firotina kaset û CDyan. Ez dizanim ku di warê edebiyatê de bazara kitêbên kurdî teng e, bi gotînekê din bazar kesad e. Ez bawer dikim bazara muzîka kurdî heye; bazar heye, lê organîzekirina bazarê ne profesyonel e. Em dizanin ku şirketên kurdan yên muzîkê an tunene an jî pir amator in. Ev yeka ha di profesyoneltiya muzîka te de tesîreke çawan dike?*

ŞIVAN: Gava min berê kaset çêdikir, min diçû li tembûra xwe dixist û dehpandeh hezar kronên xwe dida û min kasetê xwe derdixist. Paşê min ew kasetên xwe li Ewrûpayê bi destên xwe belav dikirin. Min çend salan bi wî awayî kasetên xwe belav kirin, lê tu pere jê nedigihîştin min, min tiştek jê kar nedikir. Ji xwe kêman kaset dikirîn, wan ji ber hev dadigirtin. Kasetên ku digihîştin Kurdistanê wilo ji ber hev dadigirtin û lê guhdarî dikirin. Lê ev çend salên dawî ne ez bi şirketê li Tirkîyeyê re ketime danûstandinan, Ses Plak, ew kaset û CDyên min çêdikin, ew baş organîze dikin. Herçiqas ev şirketê min şirketê profesyonel be jî, dîsa ji sedî bîstê wê nahgihîje min, xelk korsan çêdikin, wek berê ji ber hev dadigirin, lê dîsa jî baş e. Ez dizanim ku ew kaset û CDyên min li Îran, Iraq û Sûriyê jî tene weşandin, lê tiştek ji min re nayê. Ger sextekarî di kasetên min de çênebûya û bi rastî heqê min bigihîştin min, dibe ku ez bibûma zengîntirê kurdan. Ji aliyê din ve, ger îmkan

hebûya û ez îro bikarîbûma biçûma welêt û min bi tenê çar şev çêbikira, wê hemû problema min ya madî çareser bibûya. Lê li gora salên destpêkê niha ne xerab e.

F. C.: *Ji bilî kaset û CDyan tu şev û konseran jî çêdikî, ez bawer dikim ew jî ji te re tişteki tîne.*

ŞIVAN: Te di vir de behsa tişteki pir girîng kir. Rast e, ez beşdarî şev û konseran dibim, lê şev û konserên ku têne çêkirin ji aliyê tevgerên siyasî ve têne çêkirin. Mixabin, gava xelkê xerîb çêdikin, bi navê hunermendan çêdikin, hunermend rolên xwe dilîzin. Li ba kurdan hunermend nikarin rolên xwe bilîzin. Ji ber ku şev û konserên ku têne çêkirin ji aliyê partî û rêkxistinên kurdan ve têne çêkirin. Şevan çêdin, Newrozan çêdikin, dibêjin ban Şivan bikin, ban filan û bêvan hunermendî bikin; komek hunermend dixin rêzê, nahêlin hunermend hurmeta hev bigirin, rêza hev bigirin, qedrê hev bigirin, herkes cihê xwe bizanibe; hemûyî dixê eynî kefê. Ji bo wan ne xem e, nizanin an jî naxwazin bizanibin ku kîjan hunermendî çi rol lîstîye, çi kiriye, emrê wî çi ye; ev hunermend profesyonel e, ev amator e. Hema herkesî dixin eynî kefê û carinan dibêjin, Newroza me heye, ma tu jî nayê? Ez hingî diqehirim. Tu jî nayê çi ye lawo! Bike, ez nayê! Ez diqehirim, ez carinan telefonê di ser çavên wan de digirim. Me rojekê nedîtiye ku wan konserek bi navê me amade kiribe. Li her derê dinyayê konser bi navê hunermendan çêdibin, afîşên hunermendan tên çêkirin, navên hunermendan tên nivîsandin. Ma adet ne weha ye, Firat! Na, xuyaye li ba me ne weha ye. Ew afîşan jî çêbikin, navên me bi tîpên hûr li binê afîşê dinivîsin û navê partiya xwe, an jî rêkxistina xwe mezin li ser afîşê dinivîsîne. Yaho xelk konferansan ji nivîskarên xwe re çêdikin. Dikarin bibêjin Baksî, te evqas zehmetî kişand, niha tu nexweş î, berî ku tu bimirî ka were ji me re çend konferansan bide. Dikarin bibêjin, yaho Firat, va ye tu vê Nûdemê bi serê xwe tenê derdixînî, tu xweş derdixînî, tu zehmetiyê dikşînî, te di vî emrê xwe yê ciwan de evqas xebat kiriye, ka were ji me re çend konferansan bide, bila xelk bêtir te nas bikin, bêtir qîmetê bidin te.

F. C.: *Baş e, ma hûn hunermend bi serê xwe nikarin ji xwe re konseran çêbikin?*

ŞIVAN: Gava em bi navê xwe çêdikin, ew dixwazin xera bikin. Ew ji millet re dibêjin, neçin konserên wan, ew bi serê xwe çêdikin, dixwazin zengîn bibin, dixwazin peran ji we bistînin. Heqê tirkên, ereban, farisan, îngilîzan heye ku pera bistînin, zengîn bibin, lê yê kurdan tune ye.

F. C.: *Ger hunermendek nikaribe li ser hunera xwe bijî wê çawan bijî?*

ŞIVAN: Nehiştin ku em bijîn. Ez niha bi bêariya xwe dijîm. Min guh neda wan, ez wan red dikim, diçim ser wan. Hemû hunermend nikarin vê bikin.

F. C.: *Ez bawer dikim tu hêza xwe ji gelê kurd digirî, tu dizanî ku bi dehbezaran*

hezkirên te hene...

ŞIVAN: Rast e, ez hêza xwe ji gel digirim, gel li pişta min e, min bi tenê nahêle. Baweriya te hebe, ger hêzên me alîkariya min bikirana, niha çi hunermendên dinyayê yên mezin hene, min ê bi wan re bistira. Carinan tê gotin ku vî milletî hunermend û nivîskar dernexistiye. Çawan dernexistiye? Hunermend jî derxistiye, nivîskar jî derxistiye, siyasetvan jî derxistiye, lê kurd wan dikujin... Niha Firat can, te rojekê di van rojnameyan de nivîseke pozîtîv li ser min xwendiyê? Ne ku ez ji van rojnameyan aciz im, na, ez wan maçî dikim û datînim ser serê xwe, lê ez gazinan ji wan dikim. Ew diçin li ser hunermend û nivîskarên xelkê dinivîsînin û yên xwe ji bîr dikin. Ma min hindik carî xelat girtine? Nûdem jî tê de, rojekê yekî behsa xelatrên min kirine? Ez nabêjim bila behsa min bikin û min bipesinînin, na, bila ji bo xwe, ji bo milletê kurd vê bikin. Bila milletê kurd nebêje, hunermend û nivîskarên min tunene, bila nebêje em bê kes in.

F. C.: *Tê gotin ku Şivan ji peran bez dike. Ew ji bo peran beşdarî şevan dibe.*

ŞIVAN: Ha, navê min perehez derxitine. Yaho min bi salan ji wan re xizmet kir, min tu pere mere ji wan nedixwest, kasetên min difrotin, lê tu pere li min venedigerandin. Şevên ku çêdikirin, hunermendên tirkên jî dianîn, hunermendên mîna Ahmet Kaya, Arif Sag û yên din. Berî bi şeş salan, ji bo bîranîna Yılmaz Güney li Bonnê şeveke mezin çêkirin. Hingî Arif Sag, Ahmet Kaya û ez jî beşdarî wê şevê bûbûm. Piştî şevê berpirsiyarê şevê hat ji min pirsî, got, Şivan mesrefê te çiqas e? Min got, hezar û pêncsed mark e. Wî hezar û pênc sed mark ji bo min pir dît. Di destên wî de jî çend meqbûz hebûn. Min ew meqbûz ji dest girt û lê nihêrî. Min dît ku ji bo Ahmet Kaya 22 000 mark nivîsîne, ji bo Arif Sag 18 000 mark nivîsîne û ji bo min jî 1500 markî pir dibîne. Min got, kuro, ev çi ye? Got, kekê, tu peran nastînî evên ha îbine ne, ew bêî pere dernakevin. Hingî ez pir hêrs bûm, min got, ez jî îbine me û divê perên ku hûn bidin min ji yên wan bêtir be.

Bala xwe bidê, yên ku şevê amade dikin kurd in, yên ku têne şevê kurd in, lê perên herî pir digihîje tirkên an jî yên ku bi tirkî distirên. Ev çi ye? Ev çi bêexdaqî ye!

Tu dizanî paşê min çi kir. Jê pê ve kê ji bo şevên xwe ban min kirin, min got ez evqas evqas pere dixwazim. Gotin, abê, tu pir dixwazî. Min got abê mabê tune, hûn evqasî didin ez ê werim şeva we, ger hûn nedin ez nayê. Yaho, min got hûn keda min didin rezîlan, ez ê çawa belaş werim şevên we. Min got hûn 10 000 mark bidin min ez ê werim, hûn nedin ez nayê. Hûn çi didin yên din hûn û kêfa xwe ne. Baweriya te hebe, berê tirkên dixwestin min ji sehnê biavêjin, nedixwestin stranên kurdî li ser sehneyan werin gotin. Lê min bi înad li ber xwe da û min kir ku zimanê kurdî bibe zimanê sehnê. Min ev bingeh danî Firat can. Min bingeh daniye,

bêf min nikarin şevan çêbikin û keda min didin yê din. Ma weha dibe Firat can? Ev çi fikir e, ev çi edalet e!

F. C.: *Em dibihîzin ku niha perên te hene, pir pere dikevin destên te...*

ŞIVAN: Rast e, niha gelek pere dikevin destên min. Ez di şevkê de pênc hezar, deh hezar mark digirim. Lê armanca min ne ku ez zengîn bibim, divê ez li ser hunera xwe bijîm da ku ez bikaribim di karê xwe de profesyonel bim. Ji aliyê din ve jî ez dixwazim tiştekî li dûv xwe bihêlim, ji bo zarokên kurdan dibistanekê ava bikim, ji bo hunermendên kurdan navendekê ava bikim.

Lê min kurd fêr kirin ku ew peran bidin hunermendên xwe, bidin hunermendên kurdan.

F. C.: *Danûstandina te bi çapemeniya kurdan re çawa ye?*

ŞIVAN: Baweriya min bi çapemeniya kurdan nayê. Rewşenbîrên kurdan, nivîskar û rojnamevanên wan bi qasî ku pêwîst e li min xwedî derneketine, bi qasî ku pêwîst e cih nedane min. Ez vê rexneyê li hemû çapemenî û rewşenbîrên kurdan digirim, wan guh nedane min, ew li min xwedî derneketine, wan ez hemêz nekirim, negotine, Şivan hunermendê me ye, rohiya çavên me ye.

F. C.: *Ezbenî, ez dixwazim em dîsan vegerin ser muzîkê. Te berî bi kêliyêkê "Kî ne em" şiband muzîka Rappê, lê gava min cara pêşî li "Kî ne em" guhdarî kiribû, bi min mîna rockê hatibû. Mirov di muzîka te de folk, nivopera û carinan jî xetên rockê dibîne. Tu bi xwe muzîka xwe dixî kîjan kategoriyê? Ango tu çi navî li muzîka xwe dikî?*

ŞIVAN: Ez bi xwe nikarim navekî taybetî li muzîka xwe bikim. Ez di muzîka xwe de li ser her aliyê jiyânê radiwestim. Lê ez bawer dikim, wê sibe-du sibe lêkolînerên kurd rabin û li ser muzîka min lêkolînan bikin, ew ê li gora xwe cihekî bidin muzîka min.

F. C.: *Muzîka baş û ne baş heye, ji bo te muzîka baş çi ye, çi celeb muzîk e?*

ŞIVAN: Ji bo min muzîka baş e ew e ku fêdeyekê bide jiyânê, bikaribe hemû qîmetên neteweyekê rengîn bike, mirov bikaribe bi salan lê guhdarî bike, jê aciz nebe û hertim bêrî bike. Muzîka ku bû malê miletekî ew ji bo min muzîkeke baş e.

Lê ez ji te re rastiyeke jî bibêjim; min ji çi muzîkê hez kiribe, gelê kurd jî jê hez kiriye, min li kîjan stranê guhdarî kiribe, gelê kurd jî lê guhdarî kiriye. Ew muzîka ku min di bêjînga xwe re derbas kiribe, min bi awayê xwe gotibe, ew muzîk bûye malê gelê kurd jî, gelê kurd jê hez kiriye û qîmet dayê.

F. C.: *Tiştê baş û bi qîmet temendirêj e, dimîne û ji nişan re dibe mal...*

ŞIVAN: Rast e, lê her miletekî li gora rewşa xwe huner çêkiriye. Almanan, îtalyanan, emêrikiyan, fransizan; Mozart, Bethoven, Bach, Çaykovskî û yê mîna wan ji

miletên cihê cihê derketine. Yanî her miletî li gora kultura xwe û li gora rewşa xwe muzîka xwe derxistine. Yên xelkê di dibistanan de dihatin xwendin, li sarayan muzîk dihat çêkirin, bi notan dihat nivîsandin; muzîka me jî bê nota, bi devkî, li gora rewşa miletê me hatiye çêkirin. Lê muzîka me digel wê jî xwediyê dewlemendiyeke neditî ye. Qesîde, xezel, lawje, heyranok, payizok, methiye, pesindarî û qehremanî û hwd. Ev felsefeya jiyânê ye. Muzîka kurdî, an jî muzîkên welatên din li ser celebê jiyana wan, li ser felsefeya wan tê avakirin. Tiştêkî ku di cihê xwe de çêbûbe, milet tucarî ji bîr nake û wê hertim qîmetekî bidîyê. Tiştê ku di wexta xwe de hatibe dayîn, tiştê ku bi felsefeyêke kûr hatibe dayîn ew tişt zû bi zû namire û wê nemir bimîne. Bala xwe bide edebiyatê, gava mirov Omer Xeyam dixwîne, mirov dibîne ku felsefeyêke wî heye, gava mirov Melayê Cizîrî dixwîne, mirov dibîne ku felsefeyêke wî heye.

F. C.: *Rast e, bi rastî jî gava mirov li muzîka kurdî ya klasîk dinêre, mirov felsefeyêke kûr tê de dibîne, loma jî ew muzîk temendirêj bûye, heta îro, di vê jiyana modern de jî mirov bi kêfxweşî dikare lê gubdarî bike û mirov bêhawe di bin tesîrê de dimîne. Lê mirov nikare eynî tiştî ji bo muzîka ku îro tê çêkirin bibêje. Ez naxwazim heqê hunermendên kurd bixwim, hurmeta min ji keda wan re bêdawî ye, lê ji aliyê din ve hin celebê muzîkê ku tê çêkirin, ji muzîkê wêdetir dişibe her tiştî. Mirov ji carekê pê ve nikare lê gubdarî bike, heta mirov carinan bi zorê carekê lê gubdarî dike. Ji ber ku bi tenê propoganda ye, ji huner û estetîka hunerê dûr e.*

ŞIVAN: Rast e, lê ev jî bi rewşa gel ve girêdayî ye. Gel çî bixwaze, bala gel li ku be, bala hunermend jî dikişê wir. Gelê kurd jî îro di nexweşiyekê de ye, di nava tekoşinekê de ye; loma ev tekoşîn tesîrê li hunermendên kurd jî dike û hunermendên kurd di bin tesîra vê tekoşînê de dimîne. Loma jî ew gelek caran muzîka xwe bi armanca propogandayê çêdikin. Di muzîka min bi xwe de jî ew heye...

F. C.: *Gotinên stranên te bi piranî yên kê ne? Tu çawan muzîkê çêdiki?*

ŞIVAN: Di destpêkê de gotinên stranên min bêtir yên Cegerxwîn bûn. Min hinek jî ji şairên din girtine, lê piraniya gotinan ez bi xwe dinivîsînim.

BAKSÎ: Bibuhure, meqam yên kê ne?

ŞIVAN: Ew jî yên min in, ez bi xwe çêdikim.

F. C.: *Baş e, Şivan, ev strana "Canê, Canê" ku gelekî deng daye û ji aliyê gelek hunermendên tirkan ve jî tê gotin, gelo ew ya te bi xwe ye? Ji ber ku min li deverêkê xwendibû ku ew strana Delîl Dogan e...*

ŞIVAN: Di eslê xwe de min "Canê; Canê" wek senaryoyekê çêkiribû, insanek şehîd ketibû û min xwest ku ez şhadeta wî mezin bikim, bilind bikim. Min jî bihiştiye ku strana "Canê, Canê" ya Delîl Dogan e. Lê bawerîya te hebe tu têkiliya "Ca-

nê, Canê” bi Delîl Dogan re tune ye. Delîl Dogan şehîdekî me ye, ez gelekî hurmeta wî digirim, lê ev stran ne ya wî ye. Tu dizanî çîroka wê çi ye? Li Lubnanê şevê çêbûbû, ez jî çûbûm wê şevê, hingî Delîl Dogan jî li wir hazir bû. Min ev stran da Delîl û min jî Delîl re got, ka vê stranê bibêje bê çawa ye. Û piştî wê şevê ev stran bû malê rehmetî. Lê di rastiye de hem gotinên stranê hem jî awazê wê yên min in.

Ew adeta ku ez keda xelkê bixwim, keda hunermendên kurdan bixwim li ba min tune ye. Ez hurmeteke bêpîvan jî keda wan re nîşan didim. Kê jî min re du gotin nivîsandibin, ez navê wan dinivîsînim. Ger tu bala xwe bidî kaset û CDyên min tu ê bi hêsanî bibînî. Îcar ger ”Canê, Canê” ya Delîl Dogan bûya, min ê jî serî de bigota ya wî ye, lê ya min e. Hin kes vê yekê bi zanebûn belav dikin, ew jî jî dexesî û çavnebariya wan tê. Mixabin, di nava kurdan de dexesî pir e. Niha, Nûdem kovareke li dor sed û pêncî rûpelî ye, tije ye, gelek nivîskarên kurd tê de dinivîsînin, ev nêzîkî heşt salan e bi rêk û pêk derdikeve. Ez dizanim ku ev kovar bi hêsanî dernakeve, nivîsandin, amadekirin û mîzanpajkirina evqas rûpel ne karê rojekê û mehekê ye, tabek lê diçe, kedek lê diçe; ez vê keda te fêhm dikim. Belkî tê bîra te, gava te nû dest bi weşandina Nûdemê kiribû, min û Gulîstanê me jî Emerîkayê jî te re telefon kiribû. Nûdem li Emerîkayê ketibû destên me. Gava Nûdem ketibû destên me kêfa me hatibû ku me telefon kiribû. Me got, ji bo vê xebata hêja mala te ava, em bi te re ne û em her û her aboneyê te ne.

F. C.: *Rast e, hûn hê jî abone ne...*

ŞIVAN: Lê hinekî din dikarin rabin, ji dexesî te bidin ber rexneyan. Rexne baş e, lê rexne divê çêker be, ne ku bikuje. Ez dikarim bibêjim, Firat, tu pir cih didî hinekan, tu hinekan jî li derve dihêlî, divê her kurd xwe di Nûdemê de bibînin. Ha, ji berdêla ku vê bibêjin, radibin neyartiyê dikin. Li min jî weha dikin, neheqiyê dikin, dexesiyê dikin...

F. C.: *Tu têkilîya muzîkê ya bi civakê, bi hîsan, bi evînê û bi şer ve çawan girê didî?*

ŞIVAN: Niha, mirovatî, insanîyet hebûneke xwezayî û çandî ye, lê heywan ne hebûneke çandî ye. Loma insan difikire û dike, lê heywan dixwe, nafikire. Mirov li ser xwezayê difikire, carinan mirov dibêje gelo ev valahî heta ku diçe. Gelo ev mirovên ku di nava vê valahiya kaînetê de ne çi ne, ji bo çi hatine? Em evîndar dibin, em dildar dibin, em jar dibin, em bextewar dibin, em neçar dibin; mirovatî dikeve her halî. Ev yeka ha bi xwe di serê mirov de lerezekê çêdike, mirov nikare ji nav derkeve, nikare verşîne, nikare veke. Ev lerezekê di bedena mirov de çêdike, ev bi serê xwe orkestrayêke; her aliyê jiyanê di nav hev de tişteki çêdike. Di nava tebiatê de çi made hebe; madeyên bê hereket tune ye, her made bi hereket e. Hereketa made

li gora sertbûn û nermbûna xwe ye. Kevir sert e, av nerm e, hewa nermtir e. Baş e, ev dixebitin, gelo çima em dengên wan nabihîzin? Dengê her tiştî heye, lê dengê wan bi awayekî cida ye. Ew wilo xweşik û li hev çêbûye ku tew dengê wan ji me ve xuya nake. Dengê ku ji derveyî dengê wan tê, em dibihîzin, ew deng dengekî muzîkî ye, lê gava dengekî bi pîvan tê, em wî dengî muzîk dihesibînin. Lê ew deng jî ne ku bê mane derdikeve, ew deng jî bi tişteki ve girêdayî ye û di bin tesîra tişteki de dibîne. Mesele gava evîn tesîrê li me bike, em muzîka evînî çêdikin, gava şer tesîrê li me bike, em muzîka li ser şer çêdikin, gava em neçar bibin, em muzîka neçariyê çêdikin; bi kurtî çî tesîrê li me bike em li gora wê û di bin tesîra wê de muzîkê çêdikin.

Tevgera muzîkê di hemû warê jiyânê de heye, lê çima bêtir li ser evînê stran hatine gotin? Evîn bi xwe destpêka jiyânê ye. Gava mirov dizewice û dibe xwedî zar û zêç, ew evîn normal dibe. Lê gava mirov dildar dibe, evîna xwe dixwaze lê ji ber sebebên civakî nikare bigihîje evîna xwe, lê tu dixwazî, li dû digerî, ew evîna ha hingî dide bedena te û tu nikarî bêî wê bijî. Strana evînî her kesî eleqeder dike, têkiliyên her kesî pê re heye. Ji ber ku her insan, dikare dildar bibe û hez bike, loma jî strana evînî dibe malê her kesî. Insan zû bi zû ji strana evînê aciz nabe, jê nareve, dikare lê guhdarî bike. Lê herçî strana siyasî ye, her kesî eleqeder nake, bi tenê kesê ku ji bo wê kurtedemê hewcedar in, eleqeder dike.

F. C.: *Bi pêşketina civakê û bajarvaniyê re hewcedariyên mirovan yên nû jî çêdibin, stîla jiyana mirov tê gubertin û gelek caran tiştên kevin bersiva celebê jiyana nû nadin. Bi vê ve girêdayî hin hewldayinên çêkirina muzîka nû, muzîka modern jî hene. Bi a te mirov îro dikare qala muzîka kurdî ya modern bike? Muzîka modern çî ye?*

ŞIVAN: Mîna tê zanîn, modernîzm bi endustriyalîzmê ve dest pê dike. Gava aletên elektronîk ketin nava muzîkê, muzîka modern dest pê dike. Muzîka modern jî bi aletên modern ve harmoniyekê tîne pê. Ewrûpayê modernîzm derxist, modernîzm ji Ewrûpa derketiye. Ger tu niha tembûrê û bilûrê bînî ba hev û muzîkekê lê bidî, tu mecbûr î klasîk lê bidî. Muzîka modern bi vê çênabe. Gava te got muzîka modern, tu mecbûr î orgê bixî nav, bas gîtarê bixî nav û aletên modern bixî nav... û bi vî awayî muzîka modern çêbikî. Di nava muzîka modern bi xwe de jî çend çeşîd hene. Herçî muzîka kurdî ye, hê meqam in, muzîka modern li ba me hê çênebûye. Wek min got, muzîka modern li ba Ewrûpiyan dest pê kiriye; jazz e, reggi ye, slow rock e, hard rock e, pop e, rapp e; niha jî tekno derketiye.

Muzîka modern bi teknolojiyê re bi pêş ketiye. Niha, em ê muzîka kurdî çawan modern bikin, wek ewrûpiyan kirine, ya tu ê baterî, bas gîtar, alavên din ên modern bînî ba hev û bistirê. Rast e, ev dibe muzîka modern. Lê îcar gelo ev dibe mu-

zîka kurdî ya modern, an jî dibe bi kurdî gotina teqlîda Ewrûpî? Bi a min ev dibe bi kurdî gotina teqlîda Ewrûpî.

F. C.: *Niha, nîfsê me bê jî bi kêfxweşî li muzîka kurdî ya klasîk guhdarî dike. Lê gava em li naveroka stran û kilamên kurdî dinerin, em dibînin ku ew perçeyek ji civaka gundîrî û feodalîzmê ye. Ji bo me, ji bo nivûşê me çiqas xweş be jî, lê ji bo nivûşê ku li bajaran digihên, an jî ji bo nivûşê ku li Ewrûpayê mezin dibe wê zêde tiştekî îfade neke. Digel wê jî divê ev muzîk were parastin. Bi parastina bi tenê di kasetan de têr nake, divê ew bi awayekî bigihîjin nivûşê îro. Gelo mirov çawan dikare muzîka kurdî ya klasîk adapteyî civata modern bike û bike ku nivûşê îro jî jê hez bike, jê zewqê bistîne?*

ŞIVAN: Gelê me pareke dinyayê ye, jê neqetiyaye. Erê, em miletekî bindest in, perçe ne, lê guhê me li ser dinyayê ye, em guhdarî dikin û em hez jî dikin. Niha car caran kompozîtor û muzîkzanên kurd li ser dixebitin, mesele tîpa Silêmaniyê gelekî li ser xebitî ye, li gora xwe tiştek daniye. Bi rastî jî gava mirov li tîpa Silêmaniyê guhdarî dike, mirov dizane ku tiştek daye muzîka kurdî. Dilşad Seîd, Enwer Qeredaxî, Iqbal Hacibî, Sirwan, Farûq, Rencher, Rizgar, Merwan; pir kesên din hene ku niha navên wan nayên bîra min, ku dixwazin di muzîka kurdî de modernîzmekê çêbikin, senfonîk modernîzm... Ez bi xwe jî pir li ser dixebitin, ez vê gavê bi Dilşad re dixebitin.

F. C.: *Di pêvajoya vê rêwîtiya dirêj de Şivan Perwer di warê muzîkê de çi guhertin di xwe de çêkiriye?*

ŞIVAN: Çiqas guhertinên baş hene ez di xwe de çêdikim. Ez tu carî naxwazim şûn de bimînim. Ez nabêjim Weleh min *Xezal* gotiye, divê ez bi tenê li ser *Xezalê* bimînim, na, ji destê min were ez ê *Xezalê* û *Derwêşê Evdî* têxim nava senfonî û bibêjim. Yanî çiqas pêşketin hebe ez dixwazim bi wê pêşketinê re bimeşim. Ez mirovekî ji guhertinan re vekirî me. Ez ji gundekî Kurdistanê hatime û heta Emerîkayê çûme. Ez li muzîka her miletî guhdarî dikim û jê hez dikim û dixwazim muzîka min jî ji aliyê her kesî ve, her kulturê ve were hezkirin, loma divê ez hertim xwe biguherim û ez bawer dikim ez xwe diguherim jî. Min di her meqamî de muzîk gotiye. Min di Hîcazî kurdî de gotiye, min di Beyat de gotiye, min di Rast meqam de gotiye, min di Sêgah de gotiye, min di Huzam de gotiye; ez ji te re bibêjim, min di meqamê kurdî de stran gotine... Çi bigire min di her meqamî de stran gotine.

F. C.: *Lê îmajê te ya li ser sehneyê nehatiye guhertin, lixwekirina te eynî li xwekirinê, kincên te eynî kincin in...*

ŞIVAN: Belê, min demekê xwest ez kincên xwe biguherim lê xelkê ez rexne kirim, xelk hînê vî şiklê min bûne. Xelk ji min re dibêjin, hindî pir pêş ketine, gelek

ji wan filozof in, profesor in lê dev ji kincên xwe bernedane. Guhdarên min ji min re dibêjin ku figurê min yê bi kincên kurdî min li ber çavên wan delal dike, kurdayetiyê bêtir dixê me, ew dixwazin Şivan bi kincên kurdî bibînin.

F. C.: *Tu muzîka kurdî ya îro çawan dibînî û herweha tu pêşeroja muzîka kurdî çawan dibînî?*

ŞIVAN: Ez rewşa muzîka kurdî ya îro pir baş dibînim, muzîka kurdî di riyêke pir baş de ye. Ji ber ku insanên me gelekî dixebitin, her kes di warê xwe de dixebite, ez her hunermendî teqdîr dikim, ez tu kesî biçûk jî nabînim; giş çavên min in, rohaniya min in; ez ji hemiyar jî hez dikim. Armanca min bi tenê pêşketina wan e, bila xwe biguherin, xwe nû bikin, qedrê hev bigirin. Klasa muzîkê jî heye, muzîsyen hene navnetewî bûne, muzîsyen hene mehêlî ne, muzîsyen hene netewî ne, muzîsyen hene cihê xwe negirtine. Lê divê di muzîkê de jî pîvanek hebe, bila insanên me pir belaş derkevin meşhûriyê, bila insanên me hînî xizmet û zehmetiyê bibin.

F. C.: *Têkiliyên te bi hunermendên hevdemê te re çawa ye?*

ŞIVAN: Aliyekî min î baş heye ku ez mirovekî hemdem im, loma jî kîjan nivîsê li dû min radibe têkiliyêke min î xurt bi wan re çêdibe, ew hevalên min in. Xortên kurdan min navêjin der, nabêjin Şivan ne tiştêk e. Ew gelekî guh didin muzîka min û bi wê perwerde dibin. Lê carinan hin kes hesûdiyan dikin, xeteyan dikin, paşê tên ji min uzra xwe dixwazin.

Min ji te re gotibû ku baxçeyek bi gulekê tenê naxemile, ew bi gulên cihê dixemile û divê di baxçeyê muzîka kurdî de gulên cihê cihê hebin. Ya girîng ew e ku mirov ne bi tenê gulekê biparêze, lê baxçeyê hemû gulan biparêze.

F. C.: *Gazî û xwestekên te ji siyasîvan û rewşenbîrên kurdan çi ne?*

ŞIVAN: Niha rewşenbîr tiştêkî mezin û muqedes e. Yên ku qanûnên welatan, datînin rewşenbîr in, yê ku aqil didin siyasîvan û birêvebirên dewletan jî rewşenbîr in. Rewşenbîr di ser her tiştî re ne. Gava em dibêjin rewşenbîr, nivîskar dikevin nav, hunermend dikevin nav, rojnamevan dikevin nav, filozof dikevin nav... Divê rewşenbîrên kurd bi serê xwe îqtidara xwe çêbikin, şexsiyeta xwe qebûlkirin bidin. Heger ew weha nekin, ew ê nikaribin tesîrê li siyaseta kurdî jî bikin, nikarin tesîrê li gelê kurd jî bikin. Berî her tiştî divê rewşenbîrên kurd bi qedrê rewşenbîriya xwe bizanibin, qedrê hev bigirin. Gava ew qedrê hev bigirin, li gotinên hev guhdarî bikin, ew ê belav nebin, perçe nebin; ew ê nebin qurbanên siyasî û hereketan. Lê hêza rewşenbîrên kurd wenda bûye, ji hev de ketiye, têk çûye. Rewşenbîrên kurd li dijî hev in. Gava rewşenbîr perçe bin, hingî ûjdan û merhemeta siyasîvanên kurdan li hemberî rewşenbîran namîne. Ew ê rewşenbîriyê bixin nava xwe û rewşenbî-

riyê bikujin. Gava rewşenbîrek têkeve nava geremola siyasî û girêka siyasî lê ket, ew ê hew bikaribe wê girêkê veke, ew diçe. Ew êdî ne rewşenbîr e, ew sêpatîzanê he-
reketekê ye. Ji ber ku ew êdî hew dikare tesîrekê li siyaseta bike lê ew di bin tesîra
siyaseta xwe de ye, kor dibe. Rewşenbîr ew e ku jiyanê bi reform dike û formekê
didiyê. Rewşenbîr ew e ku dilê wî xweş e, nerm e, biaqil e, şîretkar e, ruhê xelkê
xweş dike, kulturê xweş dike, ziman xweş dike, siyaseta xweş dike, aştîyê tîne.

Herçî siyaseta in, divê ew bizanibin ku ew ne xwediyên her tiştî nye, ew organîze
dikin, dixwazin guhertinan bikin, lê ne xwediyên her tiştî ne. Divê ew nebêjin ku
wê her tiş bi min biqede an bi min çêbibe. Ev şaş e.

F. C.: *Tu di derheqa çapemeniya kurdan de çi difikirî? Bi qasî ku pêwîst e ew li hu-
nermend û nivîskarên kurdan xwedî derdikevin?*

ŞIVAN: Na. Ji sedî bîst dernakevin. Tew qet bi qedrê hunermend, nivîskar û
rewşenbîran nizanin. Tu rojnameya kîjan siyaseta vedikî, tu dinêrî resimê serokê
wê lê ye, navê wî lê ye, pesnê wî lê ye.

Gava hunermendek kasetekê derdixe, gava nivîskarek kitêbekê derdixe, kitêbeke
wî werdigere zimanekî biyanî; kovareke kurdî derdikeve, mirov zêde pêrgî nivîsên
li ser wan nayê. Ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku ji sedî bîst qedrê rewşenbîran ne-
hatiye girtin.

F. C.: *Navbera te û edebiyata çawa ye? Tu edebiyateke çawan û bi kîjan zimanî
dixwînî?*

ŞIVAN: Niha ez carinan çend rojname û kovaran di ber çav re derbas dikim, ca-
rinan jî ez qet tiştêkî naxwînim. Çiqas kovar û rojnameyên kurdan hene dikevin
destên me. Min berê gelek pirtûk dixwendin, mixabin niha wexta min tuneye, ez
pir ji pirtûkan hez dikim, mala min jî tije pirtûk in, lê ez ji ber xebata pir firsendê
nabînim ku bixwînim. Gava ez wextê bibînim, ez ji sedî sed dixwînim.

F. C.: *Di dinyayê de tiştê ku tu herî pir jê aciz î çi ye û tu herî pir ji çi hez dikî?*

ŞIVAN: Di dinyayê tiştê ez herî pir jê hez dikim, muzîk e û xizmeta azadiyê ye.
Tiştê ku ez di jiyanê de jê nefret dikim, zilma li ser mirovatiyê ye.

F. C.: *Tu niha li ser çi dixebitî?*

ŞIVAN: Niha bi rastî planekî min î pir tije heye. Ji bilî xebatên min yê muzîkê,
ez dixwazim weqfeke kurdî deynim ku ez bikaribim bi berfirehî xizmeta kultur û
hunera kurdî bikim. Min heta niha ji xwe re û ji Gulîstanê re kaset çêkirine, lê ez
dixwazim hemêza xwe ji hemû hunermendên kurdan re vekim, ji wan re bibim alî-
kar, wan derxim piyasê. Tiştê di serê min de ye ew e ku ev bibe mîna akademyekê,
xelkê tê de bixwînin û dîplomayê bigirin. □

Stockholm, 01-1999



Şivan, Serxwebûn û Gulistan

Rêwî

”bibîşîre şowalye bo bibîşkivim”

/ heger hebe laşnepixîneke min

êvaran

li ser zinaran

bila li ser min lêkeve vinge-vinga konçertoya mêşan

bedena min bibe bajarê kurman

genî bûme min bêhn bike yaaaaar!/
www.wanaweb.com

bêndereke keştî li benderê bi bareke meyt derketime rê

termê min li rex destê xwe ji min re dikilîne esmerbûna xwe

ji pakrewanan re dikim kil

li bendera marsîlya masî di nikilên wan de kezw me bi rê dikin

li sîngan şîr dikizirin li eniyan mezelan vedidim

bi çargavan em rêwing şîrava cîhanê li ser avan qesr

pêl hênîk dixeniqin li wanê kerî dibin naxir

tûrê piştî min ê tijî ba diqedin hundurê min mişt bahoz

bûn axir

di binya hêşinahîya bêbinî de meşa min dixwin teyr û teba

li peravên atlantîkan pasîfîkan îkram dikin mazûban

ji dûr ve girava welatê bêderya diçirûse pakrewan xulmaş bûn

hişyar dibin

xwelî, bûn agir ardû; okyanûs, disincirin

RÊNAS JIYAN

Roj li me tarî ye

Destên me hişk girêdayî
dil şikestiyê ji bêbextiyê
û çavên me, ber bi rojê
bi dijiwarîya demê re
li ronahiya pey tariyê
ji kûrayîya dil, bi biryar digere

Dîroka min hevalê min bû
lê xêrnexwaz ketin nav hebûnê
û tariya jînê li ser min
di nav çiyayên min de
wek avê, ax û hewa ferz kirin

Hin caran rojê nabînim
tarî xuya ye hawîrdor
û birînên bîrên min dijiwartir dibin
lê xeyal rohn, mîna stêrikên jor
bi hêviyên çiqas dûr jî
li benda bizrê avahiya xwe ne

DERWÊŞ M. FERHO

Di civata Kurdistanê de mercên damezrandina demokrasiyê



UMER ŞEXMÛS

Piraniya hêzên siyasî li hemû perçên Kurdistanê behsa demokrasiyê dikin û gotina demokrasî di nava navên wan de heye, lê pir mixabin ne di praktîkê de û ne jî bi bîr û bawerî demokrat in. Weko piraniya hukûmet û hêzên siyasî li Rojhilata Navîn, du diskursên (discourse) wan hene. Yek jê derew e û bi tenê ji bo ciwanî ye li ser kaxetê, herwiha ji bo xapandina miletê xwe û raya giştî ya cîhanê ye û ya din di pratîk û karên rojê de ye ko bi temamî li dijî prensîp û bingehên demokrasiyê ne. Ev diskursên derew û saxte zererekî pir mezin li riya damezrandina demokrasiyeke rasteqîn e li hemû wan welatan, civata Kurdistanê jî tê de, peyda dike. Herkî yan pêvajoyeke (process) welê katekî dûr û dirêj jê re divêt, çî di hêla zihnî yan hos (subjective) de û çî di hêla dervey meriv (objektiv) de heta ko rê xweş bibe ji bo damezrandina sîstemeke demokratîk di nava gelê Kurde de, digel ko daxwaziyeke pir kwîr û fireh di nava cemawerê gelê kurd de heye ji bo bi destanîna xewneke welê. Çima welê ye? Berî ko em bersiva vê pirsiyarê bidin pêwîst e em vegerin ser maneya, dîrok, merc û teoriya demokrasiyê.

Gotina "Demokratî" bi bingeh ji zimanê yunanî yan grêkî tê. Demos maneya wê "gel" e û krata'în maneya wê "hukum" yan "desthilar" e. Yanî demokratî yan demokrasî dibe hukum yan deshilata gel. Sîstema (system) desthilata gel ji alî pira-niya xelkekî di hîlbijartineke giştî û azad de tê hîlbijartin. Kesên hîlbijartî di nav xwe de dezgehên bîyardan yan yasadanan (parleman) û dezgehên birêvebirin (hukûmet) yê ji hevdu cuda datînin. Hukûmet li hember parleman û yasa giştî (destûr yan qanûna esasî) berpirsiyar e. Parleman kare hemû katekî hukûmetê biguhere eger di navbera herdû dezgehan de nakokî peyda bû. Ji vê herkinê re "parlemantarisim" tê gotin.

Di hinek sîstemên din de serokkomar (wek yan ji dêvla dezgeha birêvebir) bi rengêkî rasterast ji alî gel de tê hîlbijartin (wek li Firansa û li Emerîkayê). Wî katî serokkomar li hemberî parlemanê ne berpirsiyar e. Ji vêya re "demokrasiya dûalî yan dûser e" (dualistic democracy) tê gotin.

Di Katê kevn de (antiquity) desthilatdariya demokratîk li hinek bajarên Yûnanistanê hebûn, lê demokrasî bi tenê ji bo kesên azad û zilaman (mêran) bûn û jin û çînen kole tu mafên wan ên siyasî û nufuza wan tune bû. Bîrên demokrasiya nuh di katê modern de di fermîkirina mafên merivan di manifesta serbixwebûna koloniyên Emerîka Bakur de di sala 1776an de serê xwe hildan. Li Ewropa, bîrên demokratîk bi serketina şoreşa Firansa di sala 1789an de li hemû herêmê de hatin belav kirin. Paş Şerê Cihanî Yekemîn, Duhemîn û bi riya kolonyalismê birên demokratîk li hemû cihanê de belav bûn.

Di teoriya demokrasiyê de behsa çend formekî (rengêkî) demokrasiyê te kirin, di nav wan de: demokrasiya liberalî siyasî, demokrasiya ekonomî û demokrasiya sosyal (civakî). Di rojên îroyîn de paş zêdebûna hejmara penaber û koçerên gelek kulturên (çandan) li welatên rojava, hinek teorisyen behsa demokrasiya kulturî (çandî) jî dikin. Ev form yan rengên dawî ji ber hinek guhertinên fireh yê dîrokî û civakî hatine holê.

Demokrasiya ekonomî li cihê kar di navbera xwedîkar û karkeran de herwiha wekhevîya dahat di navbera jin û mêran de digel beşdarbûna karkeran di herkîna bîyardanê de li cihê kar paş bihêzbûna tevgera karkerî di dawîya sedsala çûyî û he-ta paş Şerê Cihanî Duhem dest pê kir.

Demokrasiya civakî (sosyal) yan "sosyaldemokrasi" paş Şerê Cihanî Yekemîn û

nemaze paş Krîza ekonomiya cihanê di salên 1930-han de hate ortê û pir xurt bû bi riya bihêzbûna partiyên sosyaldemokrat li piraniya parleman û hukûmetên welatên rojava, ji bo pêşanîna reformên (islahat) civakî û ekonomî û nehiştina feqîrî û hejariyê.

Demokrasiya çandî (kulturfî) wek me li serê behs kir ji bo wekheviya kulturên kêmasiyên taqimên nuh di van welatan de digel kultura gelên wanî piraniyên pêşîn, ji ber wê ya behsa civaka çendçandî (multicultural) yan pluralisma çandî (cultural pluralism) tê kirin.

Goman tê de nîne ko girêdaneke giring di navbera faktorên (hoyên) ekonomî, civakî û çandî herwiha pileya xwendevaniyê heye ji bo pêşveçûn, firehbûn û kwîrbûna herkîna demokrasiyê di her civatekê de.

Li piraniya welatên ko ji xwe re digotin sosyalîst yan komunîst paş Şerê Cihanî Duhemîn regekî demokrasiyê anîn pêş ko jê re digotin "Demokrasiya Gel". Ew sîstem di rastî de ne demokrasî bû û ne jî ya gel bû, belko dîktatoriya proletarya bû yan dîktatoriya partiya komunîst û gelek caran dîktatoriya yek kesî bû, ya serokê partiyê yan jî sekretêrî giştî bû.

Teoriya demokrasiyê herwiha behsa demokrasiya Rastexwe (direct) û ya Niwênerayetî (representative or indirect) dike. Demokrasiya rastexwe di bajarên Yunanistana kevn de hebûn herwiha di civînên giştî yê komunên (beledî yê) Swîsra, yê Islandayê û yê Swêdê heta dawiya sala 1952an hebûn. Di rojên îroyîn de demokrasiya rastexwe xwe di dengdanê giştî yanî "Referendum"-an de xwe nîşan dide. Du cor referendum hene. Yek jê istisarî (consultative) ye û tû mecbûrî li ser hukûmetê tê de tune, bi tenê ji bo zanîna bîr û baweriya xelkê xwe ye. Ya din ilzamî yan biryarder e (decisive), hukûmet li gora wê mecbûr e wê biryarê bi cih bîne.

Demokrasiya Niwênerayetî bi riya helbijartinê dibe û kêmasiya gelekî bi dû biryara piranî dikeve ko niwênerên gel di helbijartineke giştî û azad de hatine helbijartin. Lê gelek caran û di nava gelek welatên demokratîk de hinek biryarên giştî yan hinek garantiyên bingeîn di yasa esasî de tî nivîsandin ji bo parastina mafên kêmasiyê hember pîraniya gelekî digel ko bi regekî demokratîk jî hatine helbijartin. Ew jî bi riya dabeşkirina deshilatê bi riya danîna sîstemeke federale yan sîstemeke birêvebirina herêmî (decentralisation or local self-government) ye. Li hinek welatan mercên biryardan ji alî du rûniştinên parleman dawa dikin yan dawa nisbetekî

taybetî di dengdanê de dikin (wek 50+1 yan 2/3 ji dengan). Eger her nebû dengdaneke giştî tê xwestin.

Mercên damezrandina demokrasîyê di her welatî de gelekî qurs in (giran in). Di nav van mercan de hebûna wekhevîyê ji bo hemû rûniştîyên welatekî de hember yasa. Demokrasî ferq û cudayî qebûl nake di navbera merivan de.

Mafên dinî giring mafê azadiya derberîn û belavkirina bîr û bawer e, azadiya çapemenî ye, azadiya rêxistin û komcivînê ye, û azadiya mal û jiyane ye. Garantîya negirtinê ye bê emrê dadgehê. Ji hevdû cudabûna dezgehên bîyardan (parleman) û dezgehên birêvebirinê ye. Serbixwebûna temamî ya dezgehên dadgehî (mehkeme, qeza) ye. Hebûna yasayeke giştî ye ko ji alî hemû dezgehên dewletê, rêxistinên siyasî û hemû taqim û kesên nav komel bê parastin û rêz lê girtin. Hebûna azadiya damezrandina çendîn partiyên siyasî û mafên dengdanê ji bo jinan herkîna demokrasîyê xurtir kiriye.

Mercên din ên demokrasîyê: qebûlkirina guhertina desthilat e di akama hîlbijartinên giştî de. Rêdan û rêzgirtin e li hêzên hemberî û ji xwe cuda (oposîsyon) ya nav û dervey parlamento. Hebûna komela medenî (civil society) ye, yanî hebûna rêxistin û dezgehên ortê ye, wek rêxistinên demokratîk, sendîke û rêxistinên gelî (cemawerî) ji bo ko bibin elqek (zincîrek) di navbera hêzên desthilatdar û xelkê de. Hebûna hinek dezgehên serbixwe ne ji bo parastina yasa, mafên merivan û demokrasîyê ye.

Hinek faktorên din jî roleke mezin dilîzin ji bo geşkirin û bihêzbûna herkîna demokrasîyê li her welatî yan civatê de. Bo nimûne (mîsal):

Demokrasî, damezrandina dewleta yasa û parastina mafên merivan bi renegekî organîk bi hev re girêdayî ne. Wergirtina desthilatê ji bo xizmeta gel e ne ko ji bo desthilatkirin e bi ser xelkê de. Yanî "hukmê gel ji bo gel" ne ko "hukmê gel ji bo xwe yan ji bo taqim, rêxistin û merivên xwe". Hebûna pileyekî baş ji xwendevaniyê di nava miletekî de rê xweş dike ji bo hîlbijartineke bi hişyarî li ser bîngeha têgehiştin û ji hevdû cudakirina program û platformên xelkên hîlbijartî ne ko li ser bîngehên dilsozî bo meriv, nas û dostan e.

Hebûna hukumeteke karîger (effective) ko bi renegekî baş karê xwe bi rê ve dibe û pêwistiyên gelê xwe bi cih dike, alîkarî dike ko bawerîya cemawer bi demokrasîyê bi hêztir bibe. Lê nebûna hukûmeteke welê bawerîya xelkê bi demokrasîyê kêmtir di-

ke û rê ji kes û taqimên demogog û populîst re xweş dîke ko sîstema demokrasî û azadiyê têk bidin û dawa damezrandina rêjîmên bi hêz û dîktator bilind bikin.

Herwiha teoriya demokrasî nîşan dide ko hebûna rewşeke ekonomî baş li cem xelkê welatekî demokrasîyê bi hêztir û kwîrtir dîke. Herwiha hebûna sîstemeke demokratîk li welatekî bo katekî dirêj rewşa ekonomîya xelkê wî welatê roj bi roj baştir dîke. Dîrok herwiha nîşan dide ko kêr ser di nava welatên demokrat de dibin û xelkên wan zêdetir aşîtxwaz dibin.

Hebûna demokrasîyê li welatekî bo mawekî dûr û dirêj hinek urf û adetên singfirehî (tolerance) di dan û standinan de peyda dîke. Herwiha qebûlkirina bîr û baweriyê hember xwe û ji xwe cihê dibe tişteki asayî (normal). Gîr û girift û nakokeyên nav komal bi dan û standin û bi aşîti têne çareser kirin ne ko bi ser û girtin û birîn. Yanî bi kurtî ferhengeke demokratîk tete ortê.

Eger em nuha vegeerî ser pîrsa xwe ya destpêkê, em dizanin ko civata Kurdistanê bi rengekî objektîv bi giştî di hêla ekonomî, sosyal û çandî de gelek li paş maye. Ne dûr e ko hinek bêrikên biçûk yan mezin jî di hinek hêlan de pêş de çûbin lê civata Kurdistanê ji ber çendîn hoyan (yek ji wan bindestî û perçebûn e) bi giştî û bi berhevdan digel welat û komelên cihanê pir li paş maye. Pileya xwendevaniyê bi giştî nizm e digel ko di hinek herêmên Kurdistanê de baş bilind e. Welatê Kurdistanê bi dirêjîya dehan sal parçe bû ye û bindest e, ev rewşa hanê ew mecbûr kiriye ko xebata veşartî yan xebata çekdar bi kar bîne bo xwe rizgarkirinê. Xebateke welê disiplinêke leşkerî û polayîn dixwaze. Ew welatên ko desthilatdar bûn yan desthilatdar in li ser Kurdistanê sîstemên wanî siyasî yan despot, faşîst, dîktatorên leşkerî yan kevneperestên ne demokrat bûn. Rê li hatina herkîna demokrasî digirtin. Di van rewşên objektîv de pir giran bû ko diyarên demokratîk li civata Kurdistanê geşe bikin.

Di hêla zihnî (subjective) de jî, elîta (nuxbe) siyasî û çandî ya milletê kurd ne demokratîk e (gelek çaran anti-demokratîk e), ji ber ko di nava çanda siyasî welatên desthilatdar de yan di bin tesîra û di nava rêzên partiyên komunist ên Stalînîst de perwerde bûne. Yan piraniya serokan hîn jî di bin tesîra çanda feodal, kevnewwaz (conservative) û kevnerû (traditional) de ne. Nizimbûna pileya xwendinê û kêmbûna wergerandina edebiyatê demokratîkên siyasî yê cihanê bo zimanê Kurdî herwiha, nîşan dide ko rewşa zihnî jî rê li geş kirina demokrasîyê girtî ye.

Dîroka gelek gelan û welatan welê nîşan nade ko bûna miletekî bi qurbanî bo stemekî zor û kuştina bi komel bo ji kokhîlanîna wan dibe faktorek ji bo bi hêzbûna bîrên demokratîk yan nebûna bîrên nijadperest û faşîst di nava wan gelan de.

Ew fakterên ko di pêşînê de mumkin e alîkariya hatina herkîneke demokratîk di civata Kurdistanê de bike, li gora dîtina min, ev in:

1. Zêdebûna hejmeta penaber û koçerên kurd li piraniya welatên demokrat li cîhanê ne dûr e tesîreke fireh bike li ser cîlên yekem û bi taybetî yê duhem û perwerde kirina wan di nava ferhengeke demokratîk de di rojên pêşîn de tesîr li ser tevgera welat jî bike ji bo rûkirin li demokrasîyê.
2. Peydabûna televîzyona satelît, radio ya transistor, mobiltelefon û internetê ne dûr e tesîreke fireh bike li ser asoyê bîrkirina merivên kurd ko ders ji tecrûbên welatên cîhanê bistîne û zêdetir singfireh û demokrat bibe.
3. Zêdebûna hatina jinan di civata Kurdistanê bo nav karê siyasî, çandî, ronakbîrî û civakî bê guman ê guhertinên mezin digel xwe bîne, bi taybetî ber bi demokrasîyê çûn.
4. Belavbûna diskursa demokrasîyê û mafên merivan li hemû cîhanê, gerek eserekê li ser civata Kurdistanê jî bi cih bihêle.
5. Hebûna dîrokî ya hejmareke baş ya rêxistinên demokratîk û cemawerî di nava civata Kurdistanê de ne dîre herkîna demokrasîbûn li Kurdistanê hasantir bike.
6. Hatina cîlên nuh ko di nava çandêke demokratîk de perwerde bûne bo ser serokatî ya rêxistin û tevgerên siyasî li Kurdistanê bê guman wê tesîreke baş bi cih bihêle.
7. Zêdebûna ronakbîrîna kurd ko baweriya wan bi herkîna demokratî û xweçêşandina wan bo gihandina wan bîran bo Kurdistan bi riya nivîsandin û wergerandina edebiyatê demokratîkê cîhanê bo ser zimanê kurdî wê pir alîkar be bo guhertineke welê.

(*) Ev nivîsa ha cara pêşî bi tîpên erebî ji bo kovara "Havîbûn"ê hatibû nivîsandin. Lê nivîskarê wê birêz Umer Şexmûs ew bi tîpên latînî gihand Nûdemê jî.

Tu wekî Dêrikê bû

Çavên te
Weke zeytûnên Dêrikê kesk bûn
Ne weke her keskî bûn
Keskê zeytûnên Dêrikê bûn
Ku mirov di nav de wenda dibû

Diranên te
weke hebên hinarên Dêrikê bûn
wer bi rêz
wer li hev...

Lêvên te
Weke hijîrên Dêrikê bûn
Weke hijîrên qilêrî(1)
Ji evîne qelişî bûn
Gava mirov dixist devê xwe
Êdî mirov
Mêvanê dinyayek din bû...
Ez çi bêjim
Tu weke Dêrika Çiyayê Mazî bû
Weke wê xweşik
Weke wê şêrîn...

CAN GULŞENOGLU

(1) Celebekî hijîrên Dêrikê ye

Zeman xortaniya xwe wenda dikir Tu hatî



MEHMET AKTAŞ

Roja ku ez berbangeke Newrozê, bi giryê te hişyar bûm, êdî min
zanibû ku ezê di nava sîng û berên te de bişewitim.

Dilê min!

Di derengiya şeva buhurî de, ji wan lêvên te, alavek derbasî hundurê
min bû. Niha çemekî bi agir di bedena min de diherike.

Çavên te bi hêstir in, pitika min!

Lê ez dibînim, gulên Newrozê di ruyê te de vekirine.

Perçeya min!

Dilê xeydî, dilê hêstir û bêkes, dilê eşiyayî û talankirî, îro bi mizgîni-
ya te rabûye ser piyan.

Ez dizanim, ez baş dizanim ku, di vê roja pîroz de tu yî buhara emrê
min.

Cana min! tu caran ji bîr neke!

Ji îro û pê ve, navnîşana vî dilê veçirandî û bêhevsar, bi tenê tu yî.

Jinika min!

Vê sibehê ez dizanim, ez baş dizanim ku rojên reş, rojên kambaxiyê ji min derbas dibin.

Tu jî dibîhîzî, dilê rezîl dibêje; "careke din! careke din"

Emrê min!

Wextê ez gîhîştim qonaxa te, wextê ku min xwe sipart rehmeta herdu çavên te yên bi hêsir, ez gelek westiyayî bûm.

Te digot qey jiyân ji bo min bûbû koçeriyek. Ez carnan bendewar bûm. Lê ez gelek caran bûm mirovê rêyan. Geriyam.

Ji welatan çûm welatan. Di derî û çiyayan re derbas bûm. Di nava bajarên bê nav de, di nava bédengiya mirinê de mam. Ez ji êl û eşîra xwe zû bi dûr ketibûm. Çawa ku dergûşek zûtir ji paşla dayika xwe derkeve û rûbarê dinyayê, bê şîr û bê hezkirin bimîne, ez jî wisa sêwî mabûm.

Dema ba dibe babelîsk, mirov êdî nizane ka li kuderê bisekine, bagera jiyânê jî ez wiha dabûm ber xwe û dibirim. Min nizanibû ez ê li kuderê bisekinim.

Hêsir di çavên min de kom dibûn, lê min nizanibû ez ê di kîjan behran de vala bikim. Rûyê min dişewitî, lê min nizanibû ka ez berê xwe bidim kîjan bagerî. Bendê jiyana min qetiyabû, lê min nizanibû ez li kîjan qonax û bajarî debar bikim. Ez digeriyam. Ez diçûm.

Li welatê xerîbiyê, di tenahiya şevan de, min laşê biyanî hambêz kirin, lê roj hat hemû sîng û berê jinan, gotin û temaşeya çavên wan ji min re wek hev bûn.

Carnan, bi zimanê biyanî hezkirina jinan ji min re gelek zor hat.

Dema deqîqeyên şehwetê derbas dibûn, ew agirê wehşî ji bedena min diherikî nava bedenên ji min dûr. Min bêriya dengê zarokatiya xwe dikir. Wê demê ez ji xwe vedigeriyam.

Min dest pê dikir, bi zimanê dayika xwe ji jinên xwe re çîrokên zivistanên me digot. Wan ji min fehm nedikir. Hinekan, yên ku ji min hez dikirin, şa dibûn. Wan wer dizanibûn ku ez giliyê evînê dikim. Vê yekê carnan ez kêfxweş dikirim. Lê kêfxweşiya herî mezin, ji bo min, keşîfa guhdarîkirina dengê zarokatiya min bû. Ez bi dengê xwe, diketim nava serpehatiyên Elê-Newêrek, Mîrze Mihemed û Memê Alan.

Bi vî awayî di xewên mirinê de winda dibûm.
Piştî wan şevên dirêj, şevên xedar, careke din çavvekirina dinyayê çiqas ji min re zor dihat, Xwedayo!
Vê yekê her ez dizanim, cana min!
Carinan min gazî Xwedê dikir û digot;
"Xwezila min karibûya careke din vegeyriyama zikê dayika xwe.
Xwezila ez qet ji malzaroka wê derneketama û çavên min li vê dinyaya derewîn neketa."
Carnan, min his dikir ku ez gîhîştîme dilê jiyânê. Lê ez zû şikestîme.
Piçûka min!
Wextê ez gîhîştîm qonaxa te, ez ne pîr, ne jî ciwan bûm.
Ez di zemanekî keftar, zemanekî bê hiş û bê mêjî de mabûm.
Qey teyê bigota di jiyânê de, ji bo min, wekhevîyek çêbûye.
Min xwe di bêbîhniyê, bêsitîyê, bêdemsaltiyê, bêbajartiyê de his dikir.
Ez di rêwîtiya bêwelatbûyîniyê de, ji xwe re li sebrekê, li dengêkî, li şewqekê digeriyam.
Lê ez li çi digeriyam? Min nizanibû.
Tu pirtûk, tu îdeolojî, tu kesan bersiva vê pirsê nedidan min.
Min dengê xwe wenda kiribû. Lê min nedixwest tu kes vê yekê fêhm bike.
Ji ber wê yekê, min ji wan re behsa serpêhatiyên nerast dikirin.
Hinek însanan bawerîya xwe bi hikayetên min dianîn.
Ez tim tî bûm. Direvîyam li ber avên çeman. Lê tu avan kesera dilê min venedimirand.
Carinan min wisa his dikir ku, ez di nava du avan, du çîyan de ma-me.
Gelek caran, ez di nava pir mirovahiyê de jî mam. Lê bêkesî, tenêbûnê di rewşên wiha de jî dev ji pêşîra min bernedida.
Pitika min!
Wextê ez gîhîştîm qonaxa te, wextê tu hatî, zeman xortaniya xwe winda dikir.
Cana min!
Ez naxwazim bi vê serpêhatiya dilê rezîl, bi vî dilê êşiyayî, ewrên reş bikişînim ser vê sibeha me, sibeha evînê.

Lê tenê bizanibe, bextê min!

Wan saetên ez di bedena te, tu di bedena min de heliyayî, ew ava min ji kaniya te tem kir, ji min re bû abûl-heyat.

Bawer bike te careke din ruh can da vî dilê qefilî, vî dilê ricifî.

Tu bûyî nûroja vî emirê êşiyayî.

Cana min!

Ez dizanim ji bo vî dilê talankirî, Rebê dilan tu diyarî şandîyî.

Hukumdarê agirê bê hevsar, ji vî dilê veçirandî re, rehm kiriye.

Niha, li kêleka te, qey ez teyrêkî sêwî me ji dûriyê zivirîme hêlîna xwe. Qey ez biyaniyekî hesretkêş im ku ji welatê xerîbiyê vegeyriyame warê xwe.

Vê gavê, li ber çavên min, ji te dûrtir û ji te nêziktir tu rê, tu welat, tu kes xuya nake.

Guhê te li min e, dilketiya min!

Wextê di şeva buhurî de, dema te weke karkezalekê serê xwe dabû ser singê min, tu ketibûyî nava xeweke giran, te ez jî kişandim nava xewneke dûr û dirêj û bê dawî.

Ka ez ji te re xewna xwe bibêjim ruhê min!

Bizanibe ka te ez ajotime nava kîjan xeyalan. Bizanibe ka bi şeveke evînê, te ez kirim nava kîjan xewna xemilandî.

Guhê te li min e dilê min!

Ez û tu ji dûriyê dihatin, evîndara min!

Koçerî xilax bûbû, li welatê me buhar bû. Em êdî dizivirîn warê xwe.

Me berê xwe dabû Welatê Serhedê... Welatê hesretê û êvînên nivco-mayî.

Rebê dilan, di bedenên min û te de, du bask, du baskên kevokan peyda kiribûn.

Rêhevalên me refên teyrên sêwî bûn, emrê min!

Em li ser bajarên, behran, daristanan re derbas dibûn.

Li pey me bayê xerîbiyê, bayê mirinê. Li me saq û serma bû. Sermaye zivistanê dembuhurî...

Em bi hesreta hezaran salan ve difiriyan.

Em çend roj û çend şevan çûn, di ser çend welat û deryan re derbas bûn, êdî ez nizanîm.

Ji nişka ve, me dît ku bagereke nermik ji erdê rabû, li esmanan da



ruh û canê me. Per û baskên me di cih de sivik bûn. Min li te nêrî. Li esmanê welatê me tu wek Bûka Baranê bû yî. Min li jêr nêrî, gola Wanê weke xalîçeyeke neqîşandî li binê me raxistiye.

Xwedê mirazê hemû mirazxwazan bîne cih, di dawiyê de em gîhîştî-bûn mirazê xwe.

Me bi şabûneke mezin bi destê hev girt. Em hêdî hêdî nizm bûn, hê-nikaya behra Wanê hate pozê me. Bi kêf û eşqê demeke dirêj em li ser Wanê çûn û hatin.

Pişt re, li ser ewrekî sayî me bêhna xwe veda û li behra Wanê, li seranserê Welatê Serhedê temaşe kir.

Dema me dît ku li qiraxa Wanê, refêke werdekên rengîn di nava avê de, di kêf û eşqê de ne, min got:

"Xwezila ez jî tevî wan werdekan di avê de bûma."

Li ser vê xwesteka min, te got:

"Xem nîne canê min, ezê te dabixim jêr!"

Piştî vê gotina xwe, te porê xwe yê hûnandî vekir, porê te, ji esmên dirêj bû û çû gîhîşt erdê. Min dest avêt porên te yên zêrîn, daketim jêr û tevlî refên werdekan bûm. Min bi wan re çiqas hevaltî kir, nayê bîra min. Lê wextê ku ez ji avê derketim, can û bedena min bi hev re sivik bûbûn. Qey di avê de ez careke din di malzaroka dayika xwe de peyda bûbûm.

Piştî demekê te careke din porê xwe dirêjî jêr kir û min xwe li tayê porê te girt, ez hilkişiyam ezmanan, kêleka te. Te got:

"De rabe ruhê min, îro ne roja rûniştinê ye. Rêya me dûr e, seranserê Welatê Serhedê li benda me ye." Me careke din dest pê kir û em firiyân.

Çiqas wext derbas bû. Ez nizanim. Çiyayekî bilind û efsûnkirî derket pêşiya me.

Te got:

"Ev Sîpanê Xelatê ye, dilê min."

Li ser vê gotina te min xwest ku em li warê Xecê û Siyabend, di nava gul û sosinên buharê de, bêhnekê bidin.

Te got: "Na! Ecele meke heskiriye min. Were em di serî de herin ziyareta Ehmedê Xanî. Em vê roja pîroz, rûyê xwe li xweliya wî ya bimbarek bixin."

Tu çûyî û min ta pêy te:

Qasî demeke dirêj, em di nava esmanên sayî de firiyar.

Dema em gîhîştin qonaxa pîroz, baskên me li ber sistbûnê bûn.

Ji nişka ve çiyayê bi agir, bi bilindaya xwe, li esmanan rê li ber me girt. Em ber bi erdê ve nizm bûn. Ji erdê, dengê def û dîlaneke geş li esmanan gîhîşte guhên me. Em ber bi wî dengê şahiyê ve çûn.

Wextê em gîhîştin erdê, ji kevir û kuçukên Agirî zêdetir, insan li hev civiya bûn. Rêyên li derdora xweliya bimbarek nikaribûn insanan bi-kişnin. Rê qey di bin giraniya pêyên insanan de diheliyan. Herkes bi lez û bez bû. Herkesî berê xwe dabû tirba seydayê mezin, Ehmedê Xanî.

Me li ser kela Bazîdê bêhnek da. Me bala xwe dayê ku dîlana li derdora ziyareta pîroz her diçe mezintir dibe. Her saniye, her deqîqe, insan ji insanan zêde dibin.

Me mereq kir û em ketin nava wê mehşera insanan. Ji aliyekî ve jî me ji xwe dipirsî; "Gelo ewqas insan kî ne, ji kuderê hatine?"

Dereng nekişand. Ew insanên dilkeser, me nas kirin. Herkes ji xerî-biyê, ji rêyên dûr hatibûn, dilê min! Weke min û te.

Evîndaran, insanên xwedî keder, yê ji hev dûrketî û hev wenda kirî, dayîk û zarokan, xwişk û birayan, nas û cînanan, dost û pismaman, piştî salên hesretê hevûdû hembêz dikirin, bi hev şadibûn. Xwediyê malên wêrankirî, warên barkirî, gundên şewitandî, hemû neviyên Ehmedê Xanî, îro li ser xweliya wî hatibûn cem hev.

Sedemê vê kêf û eşqê, sedemê vê def û dawetê ev bû.

Me bi saetan, dîlana vegeerê temaşe kir. Em bi kêfxweşiyê kelogirî bûbûn. Wextê me li qiyameta insanan temaşe dikir, ne mumkun bû ku em dawiya dîlana geş bibînin. Em şaş û mehtel mabûn.

Demeke dirêj buhurî te ji min re got; "Evîndarê min hela were, em bala xwe bidin derdorên Agirî, em binêrin ka çi heye û çi tune." "

Piştî vê gotinê em ji qiyameta insanan xilas bûn, me didît ku di hemû rêyên dûr û nêzik de insan hene. Wextê me berê xwe bi Agiriyê vekir, me dît ku ji çiyayê efsaneyan mehşereke insan derketiye rê.

Qey Agirî bûye kaniya insanan. Bi hezaran insan ji paşila wî derketi-ne, ber bi qonaxa pîroz ve diherikin.

Ew çi roj bû, çi zeman bû Xwedayo!

Ew çî zemanê bê nav, çî zemanê nesalixdarî bû!

Wextê min û te destê hev û du girt û ber bi çiyayên bilind ve çûn, nişka ve, Dr. Nûreddîn û Komûtan Pîro bi taximek gerilla re derketin pêşiya me.

Li ser Qilêşa her şervanê Serhedê, guleke sor girêdayî bû.

Nûreddîn wextê ku em dîtîn, gula di lûleya çeka xwe de derxist û dirêjî te kir.

Berê xwe da min û got; "Mêrga Nîşangehê tê bîra te? Ev gul ji wê mêrgê ye."

Piştî wê gotina xwe, ji me xatir nexwest û bi rêket û çû.

Piştî çûyîna wan, îcar jî pênc siwarên lez û bez derketin pêşiya me.

Ji siwaran çarê wan, weke çar zinarên serbilind ji me dûr, bê hereket, bê xeberdan sekinîn. Yek ji wan nêzikî me bû û pirsî;

"Gelî rêwiyên Xwedê, hûn ji ku tên, hûn ê bi ku de herin?"

Wextê ku em xwe bi wî didin naskirin, çavên me bi heyranî ji ser bejn û bala siwaran naqete. Siwar yekî bejinbilind, zeif û xort bû.

Simbêlekî reş ê nûderketî di bin pozê wî de rûniştibû. Dema mirov li rûyê siwar mêze dikir, mirov digot qey tîrêj ji çavên wî diweşin.

Bi sekinandina wî ve, gelek baş xuya dikir ku, ew hem ji mirin û hem jî ji jiyane re amade ye.

Pergel û hespê siwar gelek bala me dikişand. Di lingên wî de, çarixên bi bendên rîz girêdayî, li ser wî libasên bi destaçêkirî hebû. Li kêleka tîfinga wî ya kevnar e, qemeke ji mîs hebû. Gelo xwediyê vî hespê bilind, singfireh û devpiçûk kî bû? gelo ev siwar ji kîjan diyarî, ji kîjan zemanî derketibû hemberî me Xwedayo!

Di çavên me de, her pirsek weke heykelekî sekinîbû.

Siwar ev mereqa me ferq kir û bi devkenî got;

"Em siwarên Hesikê Biroyê Têlî ne. Peyayên Eşîra Celaliya ne."

Piştî vê gotina xwe, wî hespê xwe ajot û çû. Hevalên wî jî dan pey wî.

Me li pêy siwaran nêrî, wan bagera Agirî dabû pişt xwe, bi hev re bi miqamekî hespên xwe dajotin.

Te digot qey kevir û kuçuk, newal û kendalên çiyê li ber lingên hespên wan bûye deşt.

Dilê min!

Piştî van hevdtînan, em çiqas kêfxweş bûbûn, em ewqasî jî ketibûn nava ecêbmayîyek mezin. Em mêvanên zamanekî nesalixdarî bûn. Rebekî nenas ji çiya û baniyê me re rehmî kiribû, qudreta wî Rebî ewqas mezin bû ku, îro hemû şehîd, mirî û koçerên welatê me, careke din derxistibûn ser axê.

Ax welidî bû.

Piştî van rasthatinên me yê ecêb, ji nişka ve daxwaza dîtina Apê Hemo kete dilê me. Te ji min re got; "Canê min! Îro em kê bixwazin, dikarin bibînin. Tu qet mereq neke."

Li ser vê gotina te, me îcar jî berê xwe da Deşta Ixdirê, gundê eşîrê yê li ber çemê Eres.

Min zanibû ku dinya jî xirab bibe, Apê Hemo wê ji cihê xwe nelive. Em ji bajêr û ji çend gundên Eceman derbas bûn.

Wextê em nêzikî Eres bûn, me dît ku ava çemê hesretê miçiqiye.

Rê ji surgunê Welatê Serhedê re vebûye. Eşîran berê xwe dane Girîdaxê, diherikin.

Sîpkane... Birûkane... Xelkane... Angosiyane.

Mizgîniya vê roja pîroz li Kafkasya, li Asya Navîn gîhîştine wan.

Ew çawa çûne welatê xerîbiyê, wisa jî paş ve vedigeriyan.

Em ber bi êla Sipkan ve çûn, Apê Ordî derket pêşiya me. Weke her carî gotinên wî bi ava hesretê hatibû şûştin. Lê îcar rûken bû, digot: "Ay birê min! Em ji Korbûlaxê derketin, buhar bû. Wextê zozanan bû. Me digot; emê herin, lê payîzê emê li warê xwe vegezin. Payîzek ji me re bû sed sal, birê min. Yezdanê mezin rihma xwe heya îro, ji me re veşart. Em dero dero kirin. Cake şukur ji wê rojê, şukur ji vî Xwedayî re, em îro dizivirin hêlîna xwe, birayê min.

Wextê me xatir ji Apê Ordî xwest em hinekî ji wî bi dûr ketin, îcar jî Meta Gogê, meta gêjik derket pêşiya me. Gogê dere û mezerê xwe yê qîzaniyê li xwe kiribû. Kofî û kitan dabû serê xwe. Siya du biskên wê yê henekirî, ketibû ser rûyê wê yê qemer û fireh. Weke hercarî Meta Gogê dîsa dest bi gazinan kir.

"Wan ji me re tu ûrt û ocax nehîştin. Lê min dizanibû, Xwedê ahê me ji Roma reş re nahêle, birayê min."

Wê demeke dirêj, ji me re behsa rêwîtiya xwe kir.

Lazim bû me Apê Hemo bidîta. Me ji bo wê yekê xatir ji Gogê xwest

û em ketin rêya gundê Alût.

Em bi lez û bez çûn, qederekî şûn ve em gîhîştin menzîla xwe. Lê me dît ku li Alûtê, tu teba û tu insan tune ne. Herkesî bar kiriye û çûye. Gund di nava bêdengiyek mirinê de bû, ji bilî bagereke sivik.

Ez ketim pêşiya te, em ber bi mala Apê Hemo ve çûn. Me ew li hewşa mala wî, di bin dareke qeysiyê de dît.

Weke hercarî, di destê wî de, cixara wî, li pêşiya wî jî qutiya titûna wî sekinî bû. Lê weke her carî riha wî ya sipî ne tevlihev bû. Tenê simbelê wî ji ber dûmana titûna qaçax zer bû.

Simbelê wî gur, heta firnikê pozê wî bilind bûbû. Lê belê rûyê wî nû kurkirî bû. Apê Hemo îro kincên teze û paqij li xwe kiribûn. Çavên xwe kutabû dûrtiyê, li nuqteyek ne diyar dinêrî. Ez û tu di nava bêdengiyê de çûn li pêşiya wî sekinîn. Ji nişka ve bêsebrîyek ket hundurê min. Dilê min dikir pite pit, çokên min dilerizîn. Min dixwest tişteki bêjim, lê tu gotin ji devê min dernediket.

Apê Hemo rûyê xwe hêdî hêdî ber bi min û te ve zivirand. Me çend deqeyan, bê xeberdan li çavên hev û du mêze kir. Wê demê min dît ku di kûrahiya çavên Hemo de şewqeke zirav peyda bû. Wî çavên xwe zû ji me revandin.

Wî careke din berê xwe da deştê. Qederekê çavên wî di valahiyê de geriyar. Pişt re herdû lêvên wî di cîhê xwe de hêdî hêdî liviyar.

Du caran li ser hev got:

"Li ber hatinê ne! Li ber hatinê ne!"

Demêke kin, em jî bi Apê Hemo re ketin nava bendewariyekê.

Ji nişka ve min dît ku ji dûriyê, ji qiraxa çemê Eres toz û dûmanek rabûye.

Ji dûr ve heft siwar ber bi me ve dihatin.

Heft siwarên şûrên wan yek... Mertalên wan yek... Heft Siwarên Xeybê...

Siwaran hespên xwe wisa dajotin, gule bihata avêtin nikaribû bigîhîştin ta terkiya wan.

Toz û dûmana ji ber simên hespê wan derdiket, li pey wan dibû babelîsk, babelîskeke ku dikare mirovan darqutîne, zinaran ji erdê rake.

Demê siwar nêzikî me dibin, ji nişka ve, ruh û can tê rûyê Apê Hemo.

Kalemêrê xwedî keder, bê xeberdan ber bi wan ve çû.

Di wê navberê de, Siwarekî Xeybê hat li ber wî sekinî.

Apê Hemo di demeke ji saniyê kêmtir de ji erdê bilind bû û xwe avêt terkiya siwar.

Piştî ku tevî Siwarên Xeybê bû, ew êdî ne kalekî şêst salî, lê xorrekî çardeh salî bû.

Siwarên Xeybê bi carekê ve ji ber çavên me wenda bûn. Piştî çend deqeyan, li dûriyê, li dawiya deştê, li perê Girîdaxê me toz û dûmanek dît.

Piştî vê yekê, şiliyekê dest pê kir.

Ew çî şilî bû Xwedayo!

Te digot qey hemû sitêrkên li esmanan bi destê hev girtine, bi hev re dest bi girî kirine, hêsirên çavên xwe di ser me de dibarînin. Piştî wê bahoza baranê, ez ji xewê hişyar bûm. Xewna min bê dawî ma, delala min!

Min dît ku tu hişyar bû yî, li rûyê min temaşê dikî û hêsirên çavên xwe bi ser min de dibarîni.

Ax dilê min! Ax piçûka min! Xwezila min çend gotin jidevê Apê Hemo bibîhîsta. Min jî ji wî re çen gilî û gazinc bikira û pişt re ez rabûma ser xwe.

Canê min! Tu dibêjî; "Ma tu xewn hene ku dawiya wan hebe?"

Rast e rinda min. Xewn bê dawî ne.

Lê min bi tenê dixwest ku Kalemêrê evîndar, mêrê xwediyê evîna edebî, ji min û te re, hinekî dilê xwe veke. Min jî bikaribûya ji wî re bigota; "Bîst sal berê, wê êvara dereng, wextê te ji min re behsa Gulîzerê kir, min tu baş fêhmnekiribûyî. Lê ez niha baş dizanim, Apê Hemo, te xwestibû ji min re çî bibêjî. Mizgînî ji te re, mêrê rind, ez jî rastî yaziya dilê xwe hatim."

Bes e rinda min! Bes e pitika min! Hêsirên di ser min de nebarîne.

Tu çîroka Apê Hemo bizanibî. Sed car heyf ku ne ez û ne jî kesekî din temamiya vê çîrokê nizane.

Ew tim di nava tefekuratan de bû. Xwedî keder bû. Wî bi dengê xwe wenda kiribû. Nedixwest ji tu kesî re serpêhatiya dilê xwe bibêje. Apê Hemo di cîhanek nedîyar de dijîya. Wî tenê careke ji min re behsa kula li ser dilê xwe, evîna xwe ya nejbîrkirî kir.

Weke îro tê bîra min. Bi çavên girtî, ev gotin ji devê wî derketibûn:
"Gulîzer weke hespeke kihêl bû kurê min."

Piştî vê gotinê, çavên xwe vekirin, li rûyê min nêrî û ji min pirsî:
"Tu dizanî hespên kihêl çewan in, canê min?"

Wî bi xwe bersiva pirsê xwe da:

"Ew hesp tu caran siwarê xwe nawestîne dalalê min. Dema ku ew di-beze tu çiya û banî, tu newal û kendal ji wan re nabin kelem. Çiqas diçin, çiqas dibezin, rê ewqas li pêşiya wan vedibe. Gulîzera min jî, Kihêleke wisa bû. Sê roj û sê şevan em di nava milê hev de şewitîn, heta bedenên me bûn yek. Lê Gulîzera min newestiya, nesekinî, ji hezkirinê têr nebû. Wextê bedena min ber bi sistbûnê ve diçû. Min digot; êdî em xilas dibin. Min dinêrî, Gulîzer careke din di nava doşek û lihêfê de, careke din destpêkiriye diricife, ji tiliyên lingên xwe bigire heta têlên porê xwe. Çemê ji êgir yê di bedena wê de diherikî, min av dida, ez ber bi helandinê ve diçûm, wê devê xwe dixist guhê min, ji min re bi tenê peyvek digot; "jiyanekim" vê gotina wê ez careke din dixistim bîrên kûr, geliyên bêbinî. Ax heyf, sed caran heyf ku min Gulîzera xwe zû wenda kir. Perçeya min ji min zû dûrket. Lê dilê min ê bêbext deriyê xwe tu carî ji tu kesî re venekir. Piştî Gulîzere min fêhm kir ku weke her insanî, qedera her dilî jî heye.

Dilê ku carekê li hemberî qedera xwe derkeve, wê di jiyana de tim pûçbûyî bimîne."

Apê Hemo, piştî van gotinên xwe, zîvirî nava kirasê xwe yê ji pola û xwe ji دنیا me veşart.

Piştî wê rojê jî wî tu carî behsa birîna xwe ya kûr nekir.

Gulîzer kî bû?

Li ku derê rastî Apê Hemo hatibû?

Tu wextî, heta roja îroyîn, mixabin ez hînî bersiva van pirsan nebûm.

Perçeya min! Bedewa min!

Piştî ewqas sal, ewqas zeman, careke din Apê Hemo evîna te derxist pêşiya min. Sed car heyf ku min nikaribû ez mizgîniya te bidim wî.

Min derfet nedît ku ez bêjim; "Apê Hemo, ji min bawer bike, heta roja mirinê, heta ezel û ebed bibe yek, ezê li pêy qedera dilê xwe herim.

Hezkiriya min! Jinika min!

Ez difikirim, ez dizanim ew xewna min a bê dawî, dîtina Apê Hemo, Siwarên Xeybê, çûyîna me ya Welatê Serhedê, ev hêsirên çavên te, ev çemê bi agir yê di hundurê min de diherike, hemû îşaret û elametên şev û rojêke min û te nîşan dide, ji min re dibêjin, ez rastî qedera dilê xwe hatime. Rast e, zeman xortaniya xwe wenda dikir. Lê tu hatî!

Ez dizanim, ez baş dizanim ku vê gavê tu yî rastiya jiyana min.

Lê ev jiyana qirêj, lê ev daristana bêbinî û bêbîhn, sermaya xeribiyê...

Ez ditirsim pitika min!

Niha ez û tu bi destê hev û du bigirin, di dilê jiyane de, bikevin nava reqîseke bêdawî. Gelo emê bikaribin li hemberî vê xirêjiya rojan bisekinin?

Emê bikaribin, xwe li hemberî vî zemanê keftar û bêhiş biparêzin?

Na hêviya min! Na sebra min!

Ez ditirsim, ez naxwazim ji xewna ku ez û tu tê de ne, şiyar bibim.

Were! Em çavên xwe li vê dinyaya derewîn qet venekin. Em evîna xwe bi tenê di nava xewn û xeyalên kûr de bajon.

Ji min dûr nekeve cana min, wek di xewna min ya şeva buhurî de, were careke din porê xwe li ber min veke. Ez bi tayê porê te dakevim nava xewnên bê dawî. Tu jî bi min re were pitika min!

Em di xewneke bêbinî de, bi hev re bihelin, bi hev re bişewitin û bi hev re vemirin. □

neşuştî

porê min
deryayek kurîşkî
bîst û du salan
nehatiye mistan
û neşuştî...
 min ji nerînek xwestek
 xuliqand destê bavan
bûkan tu carî
min ne ricifand
xêzek nekola
li ser rû
û rûpoşê min
 êdî bav ez im
 çend dest hebin
 hûr hûrî dîkin
 bi sîkratan
nerînek xwestek bibînîm
rojekê dîsa
ez ê berî bidim ewran
û biqîrim
helbest mişt derew
em giş derewîn in

EMÎN BOZAN

JEAN-JACQUES ROUSSEAU

FAWAZ HUSÊN



Foto: Lutfi Özkök

Jiyana Rousseau romane-ke bi serê xwe ye. Nêrînên wî li ser sinc û exlaq, baweriyên wî li ser siyaset û civakê di nav dîroka fikrê de ciyekî taybetî digirin. Lê li paş Rousseauyê fîlozof û nivîskar, Rousseauyê mirov hergav diyar e, hergav diêşe û hêviya jiyaneke xweştir dike. Berhemên Rousseau gelekî bi jiyana wî ya kesane, bi sêwîtiya wî, bi rewştenikiya wî û dilşikestinên wî girêdayî ne. Rousseau ciyê xwe di nava civata mirovan de nabîne û tenê bi saya xewnên xwe, hest û ramanên xwe jiyana xwe berde-wam dike û paşê gelekî li civatên paş xwe kêr dike.

Jean-Jacques Rousseau (Bi kurdî Rûso) li komara Genevê

ya protestantî tê dunyayê. Diya wî bi çêbûna wî dimire. Bavê wî Isaac Rousseau sa-
 etçî ye û guh li talîm û fêrbûyîna lawê xwe nake. Ew di diwanzdehsaliya Rousseau
 de wî dixê ber destê hostakî hişk û dilkevirî. Di şanzdehsaliya xwe de Rousseau li
 ber destê hostê xwe hîn dibe derewan bike, tirsonek û şermoke dibe. Ew rojekê de-
 reng vediger û ji ber tirsê nava xwe dev ji bajarê Genêvê berdide û dide ser rêyên
 cîhanê. Ew bêkes û bêxwedî ye û li ser rêya birçîbûnê pêrgî keşakî katolîk tê û ew
 keşe dixwaze wî bike katolîk û wî dişîne bal Kevaniya Warens. Kevaniya Warens ji-
 neke oldar e û alîkariya kesên ku dixwazin bibin katolîk dike. Rousseau rêdigihêje
 ku eger ew bixwaze zikê xwe têr bike û textekî bibîne tê de razê, guhertina ola xwe
 çareserek e. Rousseau ê li bal Kevaniya Warens ê bi cî û war bibe lê ew ê her gav pe-
 ya bide ser reyan û berê xwe bide bajarê Lyonê, bajarê Parîsê. Ew dixwaze biserke-
 ve, ciyê xwe di nava civatê bibîne, ji zîvariyê tev bibe. Lê bi serketin û serfirazî zû bi
 zû jê re nayên û Rousseau ê gelek caran peya û birçî vegere bajarê Chambéry bal
 Kevaniya Warens ku ew ji xwe re dike dayik. Li Les Charmettes, li bal Kevaniya
 Warens demeke baş derbas dike. Ew kêfxweş û bexteweriyê dibîne (1732-1736). Li
 wê derê ew dixwîne, hîni gelek tiştan dibe, xwe amade dike ji bo rojên mezin. Dax-
 waza dilê wî ew e ku ew biçê Parîsê û li wê derê bi saya muzîkê mal û navê dunya-
 yê peyda bike. Lê carekê gava ji gerên xwe vedigere, dibîne ku ciyê wî li ba Kevani-
 ya Warens hatiye girtin. Xortekî din ketiye şûna wî. Di sala 1740î de tiştêk di nav-
 bera wî û vê jinê namîne. Ew di 1742an de bi giştî ji bal Dayê diçe û berê xwe dide
 Parîsê.

Di warê muzîkê de ew gelekî bi ser nakeve û di sala 1743an de dibe sekretêrê sefir
 li bajarê Venîsiyayê. Rewşa wî ya diravî hinekî xweş dibe lê ji ber xuyê xwe yê ne
 xweş, ew û xwedanê karê xwe radibin hev. Rousseau bêgav e vegere Parîsê. Piştî ve-
 gera xwe ew dikeve rewşeke tenik, di odeke biçûk de dijî. Ew dibe hevalê Diderot
 û Ferhengnivîsan, ji bo wan di ferhengê de gotarên li ser muzîkê dinivîsîne. Lê
 rewşa dijwar dihêle ku ew ji karekî pîs here karekî din. Ew dixwaze bi ser bikeve,
 dixwaze çareyekê ji tenikiya halê xwe re bi giştî peyda bike.

Rousseau bi saya muzîkê û hevalên xwe dire nav malmezinan û li eywanên edebî
 dixwe û vedixwe. Lê ew gelekî şermoke ye û bi ser de jî baweriya wî gelekî bi wî
 nayê. Ew newêre çavên xwe berde jineke ji nav malmezinan û dire bi bermalekê re
 bi navê Thérèse Levasseur di sala 1745an de pêwendiyên xwe çêdike. Ev keç xweşik
 û ciwan e, lê tiştêkî li ser muzîk û nivisandinê nizanê. Ew ji maleke biçûk e û Ro-



"Di nivîsên xwe
ên li ser zaniyarî û
huneran û li ser
neberanberiya di
navbera mirovan
de, Rousseau di-
bêje ku mirov bi
xwe paqij e lê ci-
vat wî xerab di-
ke."

usseau ji ber wê şerm dike. Pênc zarokên wan çêdibin lê Rousseau zarokên xwe da-
vêje Mala Sêwiyar. Ew ê paşê gelekî li ber vê yekê bikeve lê hergav jî ê di ber xwe
de bide û bêje ku wilo çêtir bû ji bo wan zarokan. Di wê rewşa nexweş ku ew tê de
bû wî nikarîbû ew xwedî bikirana û ew ê ji birçîna bimirana. Dijminên wî ê hergav
vê yekê lê bigirin nemaze gava Rousseau ê li ser terbiyeta zarokan binivîsîne.

Bi Thérèse Levasseur re Rousseau jiyaneke sexte dijî. Ew wê nake jina xwe û nax-
waze jî wê bi dost û hevalên xwe bide nas kirin. Ev tişt dihêle ku ew ji civatan bire-
ve, dûrî hevalan bikeve, li jiyaneke sade bigere.

Gotara li ser zaniyarî û huneran û pêşneyarên Rousseau ji bo reforman (1750-1752)

Rousseau vê gotarê dinivîsîne û dişîne ji ferhengstana (Akademiya) Dijonê re. Gotara wî xelatê digire, tê weşandin û di cîh de gelekî deng dide. Rousseau di vê nivîsa xwe de diji bajarvaniyê bang dike û xwe dike parêzgerê jiyana sade, jiyana paqij û aram. Piştî vê nivîsê ew hizir û dîtînen xwe li ser napakiya bajarvanî û mulkiya kesane di nivîseke din de berdewam dike. Ew di sala 1755an de Nivîseke li ser sereçava neberaberiyê dinivîsîne û li protestantiya xwe vedigere. Lê ji ber hişkiya nêrînen Rousseau û guhertînen mezin ku ew dixwazin, Akademiya Dijonê ne wê xelat dike, ne belav dike. Lê Rousseau bi xwe bûye mirovekî din, insanekî nû û ew ê hemû temenê xwe bide ser eynî rêyê. Ew ê daxwaza jiyaneke sade bike, ewê pesn û salixdana xwezayê û qenciyan wê bide. Ew ê nêrînen xwe li ser napakiya civata mirovan, li ser siyaseta dewletan, li ser ziyanên mulkiyetê bang bike.

Hermitage

Kevaniya Epinay li bakurî Parîsê di qesra La Chevretê de diji û ji Rousseau dixwaze bê bal wê li Hermitagê, li xaniyekî di nav daran de bijî. Rousseau di salên 1756 û 1757an de vedigere nava xwezayiyê, tebîeta şîrîn, dar û hişnkayiyên dilrevîn. Di nava van herdu salan de û di vê derdora xweş de, ew bingeha hemû berhemên xwe ên mezin saz dike. Ew bi hev re, di eynî wextê de, dest bi nivîsîna çar pênc pirtûkan dike. Ew Ferhenga mûzîkê berdewam dike. Perçenan ji Keşê Saint-Pierre amade dike, Nameya li ser Sernivîstê ji Voltaire re dişîne. Ew Nameya ji d'Alembert dinivîsîne, li ser l'Emile, Peymana civakî, Heloyîza Nû, kar dike. Ew li wê derê dil dikeve Kevaniya Houdetot, mirova Kevaniya Epinay. Evîna vê jina xweşik û malmezîzin pir xurt û paqij e û Rousseau ê her gav wê bi bîra xwe bîne wek nimûneke li ser evîna pak û bilind. Dilê wî ji mêj ve dixwest bi evîneke wilo bi firê biketa, ber bi esmanên hîs û hestên bilind bifriya. Lê ev hezkirina han ligel ku di dilê Rousseau de veşartî ye ji Kevaniya Epinay diyar dibe.

Çar salên Montmorency

Navbera Rousseau û kevaniya Epinay ne xweş dibe û Rousseau ji ba wê bar dike. Ew li ba Mareşalê Luxembourgê li perçakê ji qesra Montmorency bi cîh dibe. Di nav van her çar salên hanê de, ji 1758 ta 1762an, Rousseau bi bêhnfirehî û bi aramî

piraniya berhemên xwe bi gewde dike. Ew Eloyiza Nû, Peymana civakî, l'Emîle tev dike. Lê gava ew perçena ji l'Emîle belav dike û di wan de li ser dîtînen xwe li ser baweriyên oldarî diyar dike fermana Rousseau radibe. Ew bêgav dibe zû direve ta nekeve zindanê û vedigere Komara Genêvê.

Ji vê gavê û vir de, Rousseau nêzikî heyst salan bê cîh û bê war dimîne. Ew ji dereke diçe derekê. Ew di serê xwe de bawer dike ku dunya giş dijminahiya wî dike, ziyane ji bo wî dixwaze. Navbera wî û hevalên kevin gelekî pîs dibe û dijminê wî yê herî mezin Voltaire dev jê bernade. Ew diçe Inglîstanê nêzikî salekê li wê derê dimîne lê Voltaire di rojname û kovarên Londrayê de gotaran dijî Rousseau dinivîse. Paşê navbera Rousseau û hevalê wî, fêlesûfê inglîzî Hume jî nexweş dibe û di 1767an de vedigere Fransayê.

Sirgûn û windabûna Rousseau sê salên din dirêj dikin. Ew xwe dide alî, bêhn-teng e, bawer dike ku giştiya cîhanê dawîya wî dixwaze. Ew vedigere Parîsê û bi tenha xwe dûrî herkesî dijî. Ew li ser giştiya jiyana xwe dirame û dixwaze rûyê xwe li ber axiretê spî bike. Ew Hevpeyvînan, Rousseau di der heqa Jean-Jacques de çi dibêje, Itirafname, Xewn û xeyalên peyayekî bi tenê.

Rousseau di duduyê meha heftan di sala 1778an de dimire û hestiyên wî di sala 1797 tîn guhestinê Panthéonê, goristana Mezinê Fransayê.

Gotara li ser zaniyarî û huneran(1750).(Discours sur les Sciences et les Arts.)

Rojekê Rousseau dide ser rêya Vincennesê dixwaze here serlêdana hevalê xwe Diderot yê ku ji bo gotara xwe Nameya li ser Kwîran di zindanê de ye. Bi rê de ew di kovara di destê xwe de mijarekê dixwîne. Gelo bi pêkanîna Zaniyarî û Huneran sinc û axlaqên mirovan di civatê de paktir bûne? Bi vê ristê, bi vê pirsê îlham bi ser Rousseau tê. Hertişt di serê wî de rewşen û diyar dibe. Jiyaneke nû li ber wî vedibe û ji wî mirovekî nû jî çêdibe. Ew ji Diderot re li ser dîtînen xwe diaxive û Diderot jê dixwaze ku ew bersiva Ferhengstana Dîjonê bide. Hemû felsefa Rousseau di vê nivîsê de bi gewde dibe. Ew dibîne ku mirov berê, di destpêka hebûna xwe li ser rûyê cîhanê bextyar bû lê bajarvaniyê ew malwêran kiriye. Civat û dan û standînen wê mala mirovan divirîtinin, ew bexteweriya pêşîn ji hev dixin. Rousseau rêdigihêje ku xemgînî û serêşên wî dest pê kirine ji wê roja ku ew ketiye nava civatê. Ew dîroka hemû insanîyetê di serpêhatiya xwe de dibîne: Kêfxweşiya mirovê pêşîn, pîsîti

û malwêraniya civata bajarvanî.

Ta ku Rousseau dîtînên xwe bipeyitîne ew li dîroka Atênayê, Roma, Istanbûla kevin vedigere. Ew dibîne ku berî ev serbajar û bajarvanî boşiyê, dewlemendiya pir, xweşiyên bedenên nas bikin ew xurt û pak bûn. Lê gava van bajarvaniyan dest bi kêfê, bi hezkirina nermî û naziyên xweşiyên kirin ew ketin û winda bûn. Zaniyarî û huner mirovan hîn dikin çawa bidin ser rêya tembeliyê, ew mirovan ji sincê, ji pakiya hestan dûr dixin, ew mirovan serxweş dixînin û wilo jî dawiya wan nêzîk dikin. Rousseau bi zimanekî pir xurt, bi dilekî germ, bi gotinên bilind pesnê pakiya berê dide û rexnên tûj li fesadiya demên anuha digire.

Lê belê gelek kes li dijî van dîtînên Rousseau radibin û dibêjin ku Rousseau dixwaze civakê ji hev bixîne, vegere serdemên kevinare, wan çaxên ku mirov mîna jî-neweran (heywanan) di nav daran û di şikeftan de dijîn. Rousseau nêrînên xwe diparêze û li wan kesan vedigerîne ku mebesta wî her gav xweşiya mirovan e û ne vegere jiyana şikeftan ji ber ku mirov nikare paşûber vegere. Ew naxwze ku mirov agir berdin pirtûkxanan û zanîngehan wêran bikin. Rousseau dibêje ku mirovê ku çîrûk (xirab) bûye nikare careke din rindiya windabûyî bibîne. Ew ji zaniyarî û huneran hêvî dike ku ew bi kêmanî hovîtiya mirovên çîrûkbûyî kêr bikin.

Gotara li ser çavkaniya nemûsawatiyê (neberaberiyê) di navbera mirovan de (1755)

Akademiya Dîjonê di sala 1753an de mijarekê pêşkêşî nivîskaran dikir. Mijar ev e: "Sereçava neberaberîya mercan di navbera mirovan de çi ye? Destgeha xwezayî gelo vê neberaberiyê qebûl dike?" Rousseau dîsa bersiva xwe ji akademiya re dişîne lê belê vê carê, gotinên wî berpirsiyaran ditirsînin û ew naxwaz in wê belav bikin. Rousseau di nivîsa xwe de dibêje ku sereçava neberaberiyê di navbera mirovan de mulkiyet e. Reha napakiyê bi xwe di mirovan de tune lê civatê ev reha hanê xistiye nava wan. Xwezayê (tebîatê) mirov çêkirine ta ku ew bi tenha xwe bijîn. Civaka nû serdema neberaberîyan e, ew sûcê hemû derdan e.

Rousseau dibêje ku mirovên pêşîn, mirovên seretayî paqij bûn, rind bûn, xweşbext û bextiyar jî bûn ji ber ku wan nizanibûn mulkiyet çi bû.

"Mirovê seretayî ê ku piştî ku sînorek li dora erdekî çêkir û got: Ev yê min e, û kesine sade jê bawer kirin, ew mirovê hanê sazgerê rastî yê civaka bajarvaniyê ye. Eger wê gavê mirovek rabûya û ew tîrikên hanê rakirana û dora wê erdê car di rast

bikira wî ê mirovantî ji çiqas ceng, kuştin, zîvarî û bobelatan azad bikira. Wî ê çiqasî mirovantî ji wan ziyanan azad bikira eger wî ji kesên wek xwe re bigota: "Li vî sextekarî guhdarî mekin. Hûn ê xwe winda bikin eger hûn ji bîr bikin ku mêwe ji bo herkesî ne, ku zemîn ne ya tukesî ye!" (...) Ta ku mirovan qîma xwe bi xanîkên xwe dianîn, ta ku wan kincên xwe ên ji çerm tenê bi stîrî dar û masiyan didirûtin, ta ku wan bi perîk û şeytanokên deryayê xwe xweşik dikirin, rengên corbecor di laşên xwe didan, tîr û kevanên xwe tekûztir an xweşiktir dikirin, bi kevirên tûj çend qeyikên masîvaniyê saz dikirin, an çend destgehên pêşînê ên muzîkê çêdikirin, bi gotinekê, ta ku wan xwe bi ser karûbarên ku bi tenê mirovekî dikarîbû çêbikira xwar dikirî û pîşeyên (mihneyên) ku hevkarîya gelek destan nedixwestin, ew azad, sax û pak dijiyan û li gor xwezayîya xwe bextyar bûn wan di navbera xwe de karûbarên serbixwe bi xweşî dikirin, lê ji gava ku mirovek bêçare bû alîkarîya yekî din bixwaze, ji gava ku mirov dît ku gengaz e ku ew xwarin û vexwarinên du mirovan bi destê xwe bixîne, beraberî (musawat) winda bû, mulkiyet çêbû, kar bû tiştêkî girîng û daristanên mezin bûn erdên biken ku ji bo avdana wan mirovan gerek bi xwêdana xwe avbidana û di wan de jî di demeke kurt de dîl û zîvariye zîl dan, û bişkuvîn û bi çandinan re mezin û pirtir bûn."

Rousseau di nivîsa xwe de li ser çavkaniya neberaberîyê de dibêje ku gava mirov bi hev re kar bikin ta ku tiştêkî encam bidin, ew bêtir kar dikin û di vî parekirina karan de, mirov azadiya xwe winda dikin. Ew li dîroka mirovan dinere û du beşan dibîne. Pêşî mirov di nav daran de bi tenha xwe dijiya. Zîyan û napakî di vî cîhana sade de tunebûn. Lê pêşveçûna dîrokî bi pêşveçûna ziyane ve girêdayî ye. Rousseau dizane kengî ziyane, napakiyê dest pê kiriye. Zîyan ji mirovan tê û ne ji derveyî wan. Her yek gerek reha napakiyê, sereçava pîsitiyê di nava xwe de bibîne û wan ji xwe paşê dûr bixe.

Rousseau dev davêje sazimanên civakî û destgehên dadmendî. Ew dibîne ku yên têt ta ku çavên feqîran girêdin, ew ji wan re dibêjin werin em di navbera xwe de peymanan çêbikin. Ew destûr û qanûnan çêdikin. Lê bi rastî ew destgeh û destûr û qanûn bêtir ji bo parastina mafên xurtan in û ew neberaberîyê diparêzin. Mirov anuha têdigihêje çima Ferhengstana (akademiya) Dîjonê ev nivîsa hanê belav nekir. Rousseau hemû desthilatên cîhanê dikir dijiyan xwe.

Qanûn û destûrên mirovan li ser meqeresiyê hatine saz kirin. Ew li ser neberaberîyê, newekhevîyê çêbûne. Ew di rûyê belengazan de radiwestin û destên zengî-

nan û desthilatan xurtir dikin. Ev destgeh hemû mirovan dûrî jiyana rastîn, dûrî kêfxweşiya pêşîn dûr dixin. Yê nîzim dixwazin bi saya karê pir bilind bibin. Yê bilind dixwazin bilintir bibin û wilo jî herdu beşên mirovantiyê dûrî bextewerî û diltenikiyê dibin.

Rousseau û romana Heloisa Nû

Li hermitagê, di nav dar û heşînkahiyê, dilê Rousseau bi ser bilindbûn û xweşikbûna hestên evîne vedibe. Ew di van her çar salên vî xaniyê hanê de piraniya berhemên xwe bi gewde dike. Ew di Itrafnameyên xwe de dinivîsîne çawa hizra vê romanê kete dil û serê wî. Ew dibêje ku bîranînên demên têkel yê jiyana wî hiştin ku ew birame. Rousseau dibîne ku dilê wî jî roja roj de tije hest û hîsên bilind e lê belê ew tucarî bi gewdekirina wan hîsan şa nebûye. Ew xwe di nav lepên êşên diwar de dibîne, dinere ku jiyana wî diçe û rojekê bi rastî pêrgî wan hestên bilind nehatiye. Di tenhabûna xwe de û di nav wan dar û heşînkahiya pir de, ew baya nivîsandin û xeyalê li deriyê jiyaneke din dike. Rousseau jî nivîsandinê alîkariyê dixwaze. Ew dixwaze bijî û jî dilê xwe yê evîntije dixwaze bifirê bikeve. Ew Heloisa Nû di sala 1761an de dinivîsîne. Rousseau di vê pirtûkê de nîkiyê digihîne ber perê esmanan. Julie û Saint-Preux jî hev hez dikin lê hezkirina wan erê hezkirineke qedexeyê ew tu kesî biçûk nake. Ew van herdu qehremanan bilintir dike, paqijî û diltenikiya wan dide xuyakirin. Evîna Rousseau jî xwezayî re û dar û heşînkahiyê di vê romanê berfireh dibe. Evîndarên Rousseau nikarin di bajarên de di nav derew û neberaberiyê de bi evîna xwe şa bibin. Ew li nevçeyê xweşik dibişkuve û gûr dibê. Gola Genêvê û çiyayên Valaisê alîkariyê mezînan dikin ta ku evîna evîndarên wî xweştir bibişkuve, bîna xweş bide.

Héloisa Nû canekî dide tenhayiya Rousseau. Nivîskar xwe jî bîr dike û bi saya qehremanê xwe xwe davêje nava pêlên evînek xweş, ew bexteweriyê xeyalî jî xwe re peyda dike. Ev romana dirêj hemû dîtînan û baweriyên Rousseau li ser evîne, li ser dilpakiyê, qenciyê, xwezayê û napakiya bajarvaniyê diyar dike. Rousseau rastî û nerastiyê di vê pirtûkê de tev li hev dike û wilo jî jî jiyana xwe dest pê dike, ber bi jiyaneke bi hevî û bi kêfxweşî diçe.

Romana Héloisa Nû girîng e di jiyana Rousseau de, ew bi rastî xekek e di navbera pirtûkên teorîk û berhemên edebî wek Itirafname, Xewn û xeyalên peyakî bi tenê.

Peymana civakî (1762) le Contrat social

Di nivîsên xwe ên li ser zaniyarî û huneran û li ser neberanberiya di navbera mirovan de, Rousseau dibêje ku mirov bi xwe paqij e lê civat wî xerab dike. Di Peymana civakî de ew dixwaze bingeheke baş bide civatê û mirov ta ku herdu bikaribin bi aşitî bijîn, bêyî ku yek zorê li yê din bike. Rousseau dibîne ku destgehên pîs ên siyasî sûcê hemû dijiwariyan in di hinava civatê de.

Pirtûka yekem: Rousseau kêmasiyên hemû destûran dibîne. Pêşniyariya wî ew e ku, ji bona daxwaza giştî, mirov gerek dev ji perçek azadiyên xwe berde. Her mirov, di civatê de, divê bibe mîna perçeyekî ji laşekî. Hemû perçeyên laş bi wî awayî dikarin li hev bikin û bi hev re bi karûbaran rabin.

Pirtûka duyem:

Rousseau di hemû temenê xwe de û nemaze di salên dawîn de bawer dike ku hemû dunya dek û dolaban li dijî wî tekûz dike û mirina wî dixwaze. Ji ber ku ew civata mirovan suçdarê hemû êşên xwe dibîne, ew ji civat û bajarvaniyê dûr dikeve û li aramiya can û bedena xwe digere. Di pirtûkên xwe ên dawîn de mîna Itîrafatnameyan û di Xewn û xeyalên peyayekî bi tehnê de, ew dîtînen xwe bi aramî û bêhnfirehî rave dike. Ew nêrînen xwe li ser neberanberiyê, pîstiya bajarvaniyê, başbûna xwezayê dugîsin û çargîsin dike. Ew bi rastî jî dûrî dunyayê û tevliheviya karûbarên bajarvaniyê bi rastî dimire û wek mûmekê di tenhayiyê de vedimire.

Li bal Rousseau û di hemû berhemên wî de du tişt herdem diyar in: Rousseau li dijî bajarvaniyê ye û ew wê dike suçê hemû êş û ziyanan. Paşê ew herdem bi navê jiyaneke sade û xwezayî bang dike. Ji roja ku ew biryarê dide Gotara li ser zaniyarî û huneran binivîsîne, tu guhertinên mezin di dîtînen wî de çênabin. Di pirtûkên xwe ên dawîn de Rousseau li ser rastiya xwe bi dirêjayî dinivîsîne. Ew dixwaze bi vî awayî xwe ji rexnan dûr bixe û rûyê xwe li hember cîhanê giştî spî bike.

Hîsên tenik di tenhayiya şev û rojên wî de wî ber bi evîneke xeyalî û stîleke romantîkî dajon. Nivîsên dawîn nazikiya hîsên Rousseau didine xuyakirin.

Rousseau bi nivîsên xwe dibe rêber û hozanê guhertinên şoreşa fransî û guhertinên siyasî û civakî. Şoreşger û serokên şoreşê li ser nivîsên Rousseau kûr dibin.

Ji aliyêkî din, bi saya stîla xwe, Rousseau dibe hosteyê romantîzmê û li romantîzma destpêka sedsala nozdehan bi xurtî kêr dike. □

Dengê rengan

Mirin ji kîjan rengî ye?
Ya jiyân?
Aştiyê xwe şibandiye kîjan rengî?
Evîn, hesret û azadî jî bi reng in gelo?
Rengê hêviyê jî tune ye, loo!?

Me tovek da axê
Wê gulek jê afirand
Guleke sor
Sorekî tîr
Çawa me jê hez dikir
Çawa ji me hez dikir, loo!

Çima her ku diçe gula me reng dide?
Çima her ku diçe spî û gewr dibe?
Û mirin ji kîjan rengî ye?
Rengê hêviyê jî tune ye, loo!?

A. SIWAR YALÇIN

Pisporekî wêneyan: ÇERKEZ QEREDAX

ROHAT ALAKOM

Heta niha him ji herçar perçeyên Kurdistanê, him ji nav kurdên ku li welatên biyanî dijîn gelek nivîskar, hunermend, lêkolîvan û kesên mayîn yên navdar derketine. Lê belê ev kesan ji ber gelek sedem û mercên cuda di nav xwendevanên kurd de zêde nehatine nasîn. Yek ji van jî Çerkez Qeredax e ku ev bîst û pênc sal e bi hunerê wênekêşiyê ve mijûl e û heta niha bi hezaran wêne kişandine û bûye pisporê wênan. Çerkez Qeredax dikare îro yek ji wênekêşên kurd yên pêşketî were hesabandin.

Di vê nivîsê de ezê hewl bidim ku bi peyvan portreke Çerkez Qeredax binîvîsim û derxim an jî çawa bi zimanê wênekêşiyê dibêjin, *bikşînim*. Çerkez Qeredax, di sala 1951ê de li Qaxizmanê (qezake bajarê Qersê) hatiye dinê. Paşê malbata wî mala xwe bar kiriye, çûye bajarê Qerekosê (Agirî). Mirov dikare bêje ku, ew nivî -Qersî û nivî-Qerekosî ye. Eger mirov ji wî bipirse bêguman ewê xwe Qerekoseyî bihesibîne, ji ber ku zaroktiya wî li wir derbas bûye, bîranînen wî yên pêşîn û bingehîn li wir mane. Lê belê navê Qaxizmanê wek navekî şêrîn û delal timê di jiyana Çerkez Qeredax de cîhekî taybetî digre, ji ber ku li wir çavên xwe li dinê vekiriye, ev der cîhê bûyîna wî ye.

Ji kîderê hatiye navê Çerkez? Dema em xwe dirêjî salên zaroktiya wî dikin, em dibînin ku çîrok û serpêhatîke bersiva vê pirsê jî heye. Di piçûktiya wî de navê Mexsud lê dikin. Dema ew diçe dibistanê, nasnama birayê wî Çerkez, di-


din dêst û ew bi wî navî û dokumentê ve diçe dibistanê. Navê birayê wî Çerkez bûye. Di dawiyê de Mexsud dibe Çerkez. Sal derbas dibin, êdî ew hînî wî navî dibe û navê Mexsud ji bîr dike. Ew bi xwe kurd e, lê belê navê wî dibe Çerkez. Di jiyana Çerkez Qeredax de gelek tiştên waha ecêb qewimîne. Demekê birayê wî ji ber dijminahiye lêdixe, yekî din dikuje û di dawiyê de dikeve zindanê. Girtina birê, bêguman bandoreke nebaş li ser Çerkez Qeredax û malbata wî dihêle. Bi taybetî bavê wî, hemû hebûna xwe winda dike û perîşan dibe. Zaroktiya wî wek zarokên gelek kurdên din, di nav mercên giran û dijwar de derbas dibe. Dema zarok bûye, gelek kar kirine, wek barkêşî, şivanî û parêzkariya bostanan. Çerkez Qeredax xwendina xwe ya pêşîn û navîn li Qerekosê diqedîne. Paşê diçe paytextê Tirkîyê, Enqereyê. Li wir beşa resim ya Ensîtuya Qazî ya Perwerdekariyê dixwîne. Piştî qedandina xwendina xwe ya bilind, wek karmend deh salan di Wezereta Çandî de kar dike.

Hunera wênekêşiyê di sala 1972an de ketiye nav jiyana Çerkez Qeredax. Ji vir pê da heta niha bi hezaran wêne kişandine. Demekê, ew bi hevalekî xwe yê etnograf re tevayî diçe Kurdistanê, warên zaroktiya xwe, zozanên Çemçeyê û Sînekê. Li van deveran gelek wêneyan dikişîne. Ew wêneyên ku di vê gera xwe de kişandine, beşeke mezin ya koleksiyona wî ya wêneyan pêk tîne. Babet û mekanên berhemên Çerkez Qeredax ji hev gelek cuda ne û di demên cihê de hatine kişandin. Bandûra rengên reş û sipî di wêneyên wî de gelek hakim û berbiçav in.

Heta niha çend albûmên Çerkez Qeredax yê wêneyan wek pirtûk hatine weşandin. Yek ji wan di sala 1989an de bi navê *Nuans* (Nüans) hatiye weşandin. Çerkez Qeredax di vê berhema xwe de gelek wêneyên ji hev balkêştir, raberî xwendevan û mêzokaran dike. Babeta wêneyên Çerkez Qeredax, anatomiya bedana mirovan e, bi alîkariya faktorên wek tîrêj û siyê gelek wêneyên femînîn kişandine. Di vê pirtûkê de modelên wî hemû jinên tazî ne. Di hemû wêneyan de estetîk û pergalek heye. Babeteke ku bi sedsalan bala gelek hunermendan kişandiye, vê carê bandora xwe li ser naveroka berhemên Çerkez Qeredax jî hiştiye, ango babeta bedena jinan. Weşandina vê pirtûkê, di medya tirkî de wek bûyereke hunerî ya balkêş hatiye hesibîn û çend nivîsên danasînê li ser vê pirtûkê û pêşangehên wî hatine weşandin.




Çerkez Qeredax



Herkes Karadağ

Di sala 1995an de pîrtûka Çerkez Qeredax ya duwemîn bi navê *Sîmayên ku min nas kirine* (Tanıdığım Yüzler) tê weşandin. Pirtûk ji aliyê Wezerata Çandî de hatiye çap kirin. Ev berhema duwemîn ya Çerkez Qeredax zêdetir maskulîn e, lê belê çend portreyên jinên naskirî jî hene. Di nav rûpelên vê albûma hacîmfireh de gelek portreyên naskirî yê tirk û kurd cih girtine. Di nav sîmayên kurd de, kesên wek Ahmed Arîf, Ahmed Aras û Nacî Kutlay hene. Ev berhemên hunerî di sala 1996an de li Parîsê di pêşangeheke bi navê *Les Visages que j'ai connus* de hatine nîşandin. Di vê pêşangehê de wêneyên gelek hunermend, nivîskar û lêkolînavan hatine pêşkêş kirin, wek Orhan Asena, Gürer Aykal, İsmail Beşikçi, Ahmed Arif, Gültekin Emre, Enver Gökçe, Emre Kongar, Ayla Kutlu, Turhan Selçuk, Cahit Kulebi, Ülkü Tamer, Çetin Öner û gelek kesên mayin.

Di sala 1997an de pirtûkeke wî ya mayin bi navê *Baleyîm* hate weşandin. Di vê pirtûkê de sê çilqin hunerîn (bale, edebiyat û wêne) hatine bal hev û ketirine zikê hev, di



nav hev de hatine hûnandin û hevîrkirinê. Ev aliyê pirtûkê gelek bala mirovan dikişîne. Pirtûk, wek lêkolîneke fotografîk ya baleyê dikare bê hesabandin. Di vê albûma sêyemîn de babeta jinan dîsa babeteke berbipêş e. Ne bi tenê wêneyên Çerkez Qeredax, wisan jî hunera baleyê babeteke bingehîn e. Ji aliyê din, pirtûk bi helbestên Yaşar Miraç ve hatiye dewlemend kirin û xemilandin. Belê, di pirtûkê de çawa me li jor jî got sê faktorên artîstîk hene: *bale, edebiyat û wêne*. Çerkez Qeredax modelên xwe vê carê ji nav xwendekarên zanîngeha baleyê li Enqerê hilibijartîye. Hemû wêne bi çavekî hunerî li vê zanîngehê dema ceribandî û pratîkê de hatine kişandin.

Berhemên Çerkez Qeredax heta niha ne bi tenê li Tirkîyê, li gelek welatên mayin jî hatine nîşandin, wek Almanya, Fransa, Ingiltere, Belçîka, Ispanya, Italya, Hollanda, Macaristan, Yugoslavya, Romanya, ABD... Li Tirkîyê heft pêşangehên wî yê şexsî hatine amade kirin. Çerkez Qeredax ji ber hêjabûna xebatên xwe heta niha qasî deh xelat wergirtine û li Tirkîyê wek wênekêşekî navdar tê nas kirin. Çerkez Qeredax ji sala 1990î virda endamê *Federasyona Navnetewî ya Hunera Wênekêşiyê*, FIAP (Fédération Internationale de l'art Photographique) ye.

Çerkez Qeredax çend proje û xebatên pêşerojê dane pêşberî xwe. Navê jek ji van projeyan *Kurd li zozanan* e. Proje, ji wêneyên ku di navbera salên 1972-1982 hatine kişandin, pêk tê. Xebateke wî ya teorîk li ser hunerê wênekêşiyê didomî-

ne. Çerkez Qeredax vê xebata xwe wek pirtûk amade dike. Xebateke wî ya mayîn ji çend portreyên bi wêne û bi nivîs pêk tê. Çerkez Qeredax di vê xebata xwe de dixwaze hin şexsiyetan bi wêne û bi peyv bide nasîn. Babeteke ku zêdetir bala Çerkez Qeredax dikêşîne, figur û nîgarên li ser kevir, zinar û pelên daran e. Di vê jîyana veşartî de gelek dîtem wek wêne hatine kişandin. Ev xebata wî bi *rûber û abstraksiyon* hatiye bi nav kirin.

Bi kurtî di hemû xebatên Çerkez Qeredax de çavên me hertim tevdigerin û aktîv in. Ew her çiqas wênekêş be jî, ne tenê wêneyan dikêşîne, gelek caran ji hunerên mayîn behrê û sudê dibîne, wek edebîyat, bale û resim. Çerkez Qeredax wek grafîkvan demekê bi mîsanpaj, montaj û teknîkên xemlê ve jî mijûl bûye.

Çerkez Qeredax niha li bajarê Enqerê dimîne. Li taxa bajêr ya bi navê Dikmenê, studyoke wî ya xebatê heye û karên xwe li wir dimeşîne. Di studyoya wî de hulm û gulmeke germ û şîrîn bilind dibe. Bi motif û hacetên rohilatê ve hatiye xemilandin û saz kirin. Çerkez Qeredax, ji sala 1987an virda wek wênekêşekî profesyonel, serbest kar dike. Di warê hunera reklamê de jî gelek baş hatiye nas kirin û heta niha çend katalog, salname û pirtûkên danasînê de bi sedan wêneyên wî cîh girtine. Gelek caran Çerkez Qeredax wek hunermendekî reklamê aborî û debara xwe derbas dike.

Dema mirov li studyoya wî digere, mirov xwe li pêşangeheke pir-hunerî û pir-rengîn de dihesibîne. Ji her hunerî nimûneyên berhemên cihê-cihê li studyoya wî hene. Di jîyana Çerkez Qeredax ya hunerî de kamera, boyax, berhemên etnografîk, peyv û gelek faktorên din hev temam dikin. Ev aliyê wî yê hunerî gelek bala mirovan dikêşîne. Wusan tê xuyan Çerkez Qeredax naxwaze hunera wênekêşiyê di nav sînorên teng de bifetisîne, berhemên xwe bêtam û rijî bihêle. Bi kurtî, dema ew wênekê dikêşîne, ew zane û têdighê wekî ew çî dike. Ji aliyê din dema mirov wêneyên Çerkez Qeredax mêze dike, mirov wê demê jê derdixe ku wênekêşî bi rastî hunerek e ku mirovan gelek di bin bandora xwe de dihêle.

ÇAVKANÎ

Çerkez Karadağ, Nüans-Fotoğraflar, Weşanxana Dost, Ankara, 1989.

Gültekin Emre, Çıplaklığını Görmeyen Fotoğraflar, Gösteri Dergisi, hejmar:131, 1991.

Gülümser İşçelebi, Yasakçı Zihniyete Rağmen Çıplak Bedenin Estetiği, Tempo, hejmar:35, 1991.

Adem Altan, Nü'ye Salon Yok..!, Nokta, hejmar:14, 1993.

Çerkez Karadağ, Tanıdığım Yüzler, Kültür Bakanlığı, Ankara,1995.

Alberto Modiano, Yaşamın Tanıdığından, Tanıştığı Yaşamlar, Cumhuriyet Kitap Eki, hejmar: 334, 1996.

Çerkez Karadağ'ın "Balesi", Şekerbank Sanat Dergisi, hejmar:18, 1997.

Çerkez Karadağ, Baleyim, Weşanxana Doruk, Ankara, 1997.

DU CIWAN Û CENAWER

ANTTI OIKARINEN

Cenawer di kevirkursiya xwe de rûniştî bû û ji darbilûra xwe ya kevnar awazek melûl derdixist. Tiliyên Cenawer ên stûr bi giranî li ser kunikên bilûrê digerin lê awaz zelal û paqij derdiket. Wî lédana bilûrê rawestand. Bê ku serê xwe rabi-ke, bang li şikilê, ya ku li salona bisîber rûniştî bû, kir:

– Ji kerema xwe re, hinek av bide min.

Şikil bêpêjin ji ser kurkdoşekê rabû û di salonê re ber bi deriyê bi perdeyê niximandî de çû. Wê perdeya giran veda û derket derê.

Dengê bilûra Cenawer, a ku dîsan jî dest pê kiribû, hêdî hêdî bi çûna wê ya di bersifka (korîdora) di kevir re kolandî de di guhên wê de bêdeng dibû. Li dawiya wê bersifkê axpînek hebû; çaviyek (hucreyek) teng a ku di dîwarên wê re risil hebûn. Derderî bi qumaşekî stûr û mezin hatibû niximandin. Wê dewlikek (cerdelek) ji risilekê ji wan derxist û bi rakirina perdeyê re derket derê.

Bayê germ û ziwa li rûyê wê da, tava zelal nehişt ku ew çavên xwe baş vebike, tozê av anî çavên wê û ew av wek rondikan bi ser gep û alekên gir de diherikî. Wek hêrsbûyî wê rondik û hêsir ji gepên xwe paqij kirin û ebuyê xwe hê jî pehêttir li xwe aland. Ew bi pêngavên aram û lixweşiyar çû cem bîrê.

Bîr kunek, a ku bi dîwarê nizm ê kevir dorlêgirtî bû, bû û girêdayî demsalan ew heta nîvê yan jî tijî av bû. Li cem bîrê werîsekî lihevpeçandî, yê ku zerikek hesinî ya piçûk bi serî ve bû, hebû. Wê dest avêt zerikê û ew berda bîrê. Piştî demeke dirêj dengê bêhêz hat. Wê hişt zerik tijî av bibe û pişt re ew kişand jor. Dema ku wê zerik gihand destê xwe, wê ew rijand sarinca darîn a ku bi wê bernîvî bû. Wê carek

din jî av hilkişand û pê amana (firaqa) xwe tijî kir.

Ew bi xizîni li ser kevir rûnişt û hişt ku çavên wê bi azadî li Çola Rambolê bigerin.

Kelheya Cenawer bilind li Çiyastanê Khand bû. Ji wir, di ser kevirçola Rambolê ya gewr- qehweyî re, ber bi Başûr dihat dîtîn. Xîzewrên Bahozên Hudolegê rakirî, yên ku roj dikir xwîn û çav, guh, kunên pozan û dev bi toza fetisînende (a ku difetisîne), dikarîbûn bi saetan, heta bi rojan berî gihana Rambolê û Çiyayên Khand, bihatina dîtîn.

Dûr li Başûrê Rojhilatê carna dikarîbû bê texmînkirin ku ji çiyayên asê yên Bundun sawerên (xeyaletên) lerizende (ên ku dilerizin) tên dîtîn û hinek caran, mîna niha jî, dûkêlheykelek bilind, ê ku ji çend agirçiyayên (volkanên) Bundun hildiket, dihat dîtîn.

Li Rojava Rêya Janoyê wek xîçek zelal, a ku ji qeraxên Çemê Thaz û bi reh û rîşên çiyayên Khand re ber bi Rojhilatê de diçû Welatê Ciohdika û Andolê, dixwiya.

Hinek niqteyên piçûk dûr li ser rêyê dilivîn.

Wê zerik rakir û evraz ber bi kelheya Cenawer de çû.

Cenawer hê jî li bilûrê dixist. Wê zerik danî erdê û bi bînbiserketî got:

– Mîrza...

Cenawer dev ji bilûrlêdanê ber da, bilûr danî ser çokên xwe.

– Êê...

– Hinek ji Rojava tên.

– Ji Rojava. Komek mezin?

– Qet nebe jî, min bîst niqteyên livende (ên ku dilivin) hesabandin lê ew li dûr bûn. Dibe ku zêdetir jî bin.

– Dixwiye ku ew Aioran e. Wî digot ku ê van deman di vir re derbas bibe.

– Bejnboş (cûce) in.

– Kevirkêş in. Ew ji wê peyva te hez nakin. Ma min negotiye te?

– Belê, mîrza. Li min megire.

– Min hew bimîrzîne. Ez bi temamî girêdayî te me. Em biçin lê binêrin. An jî... pêşî ez dixwazim vebixwim. Bilûrlêxistin dev ziwa dike.

Cenawer madenqedehê ji rex kursiya xwe rakir û raberî jinikê kir. Wê qedeh dagirt û çû cem Cenawerê rûniştî, li ser piyan rawestî, qedeh da ser devê Cenawer û vala kiriyê. Pişt re wê xawlî girt destê xwe û rûyê Cenawer paqij kir.

Kevirkêş Aioran, digel her sê xizmên xwe piçûk bûn, nîv ji bejna mirovan. Lê ew çeleng bûn û zirx û çekên wan komên keleşan jî dixistin fikaran. Laşê wan qehweyî, çavên wan li gor beşên din ên serê wan pir mezin bûn.

Ew li nik kevirkursiya xwediyê malê li ser tabçik bi suprîzî pirsî.

– Ez Cenawer im.

– Nexwe te navek din jî heye.

– Êdî na. Ez tenê cenawer im.

– Ma tu hertim Cenawer bûyî.

Cenawer çavên xwe neqandin û hişt bîranînên wî yên bi kul û bi keder vebigerin.

– Na.

Bêdengî. Jinika pîr li keçikê nêrî û gencîtî û ciwantiya wê dît. Wê çavên xwe danîn ser hev lê dîsan jî keçik didît û bi xwefikirîne re çavnebarî û xwemgîniyek biêş hes kir.

– Berê ez mirov bûm. Ji mêj de. Ez şervan bûm. Min xizmeta mîrzayê Nakabatoî, desthilatdarê Gerfawastê, Dorgul dikir. Em sî kes bûn, efsêrên peyabilind ên Gerfawastê. Em ji xwe razî bûn me bêşnor bawerî bi hêz şiyana xwe hebû. Me niyet dikir em wî ji desthilatdariyê biavêjin û bi xwe desthilatdariya Ēmparatoriya Hendmalê bi rê ve bibin. Ez nizanim ka ew çawan ji plana me haydar bû. Em neqihan tişteki jî bikin. Wî em bi dar ve nekirin... na. Bi sîhibaziya xwe wî...

Deng ji Cenawer derneket. Sîbera bêşnor a janê dada ser rûyê wî.

– Piştî ku wî têra xwe bi laşê me yê guherandî list, wî em azad berdan. Ēbret ji bo kesên din. Em li dor xwe gerîn û erjeng û tirsek ji me ket dilê xelkê. Hevalên min nikarîn bijîn, ew mirin. Min biryar da ku bijîm û bi suprîzî agahdar bûm ku nemir im. Wî kafirbavî jiyana min kir bêdawî ji bilî ku eger ez bêm kuştin an jî ji ber birçîtiyê yan jî têniyê bimirim. Ev ên dawiyê qaljêkirî herdem talûke ne. Bi van destan xwarin nayê berhevkirin û hema mirov nikare pê biavêje devê xwe jî. Divê min herdem kesek, a ku alîkariya min bike, hebe.

Wî li jinika pîr, a ku rûyê xwe jê girt, nêrî.

– Lê ez dikarim tola xwe jê hilînim. An jî qet nebe, bi qasî bikarim, zîyanê bigihînimê.

Sornayê nefesa xwe berda û bi ponijîna li ser wan destên han ên dêwîn lê wek ên zarokan re serê xwe ji xwe re hejand.

Cenawer ji vê yekê agah stand.

– Min salên xwe belaş bernedane, wî da xwiyaandin û ji ser kursiya xwe rabû ser lingan.

Cenawer ber bi paşdîwarê salonê de çû, bi destê xwe yê piçûk di destikê şûrê li dîwarçalê hilawîstî re girt, ew kişand derê û devê wî ber bi ban de kir.

Ax, ew çi şûr bû. Sornayê tu caran ên wisan nedîtibûn. Devê wî yê teyisende ji

bejna mêran dirêjtir, xwedyê biriqa cengên giran bû. Cenawer şûr bi tundî di destê xwe de digirt. Pişt re wî dest bi xîçandina kevaneyên vizende (ên ku divizin) bi devê şûr li hewa kir. Sornayê raste-rast li pêşandana Cenawer temaşe dikir. Wê nikarîbû bawer bike ku di wan destkokên han de ev hêzên wiha hebin.

– Bibore, dixwiye ku ez zêde coşîm, Cenawer bi bexşendeyî got û şûrê xwe bi ciyê berê ve hilawîst.

– Aniha şer ê li hember Dorgul dest pê bike û niyet dikim biçimê. Lê ez bawer im ku tu dixwazî niha bîna xwe bidî û tişteki bixwî, Cenawer ji Sornayê re got.

Sornayê serê xwe çemand.

– Baş e. Wê bibe odeyekê. Xwarinê û kurkan, ên ku ew bikare di nav re binive, bidiyê.

Jinika pîr îşareta lipeyçûnê da Sornayê. Ew bi badandereceyan ve hilketin jor.

– Weyla rebeno, Sorna minî (mine– min kir).

– Ew ne reben e. Ew cenawer e, jinikê şidand.

– Ma ew ji te re xerab e? fikrek bitirs a lezgîn ket dilê Sornayê. – Ma ew naxwaze bi te re...

– Na. Wî tu pêwîstiyên wisan nîn in. Dema ku ew bi cenawer hat guherandin, ew pêwîstî wenda bûn.

Dilê Sornayê hinekî aram bû.

– Belkî min ê xwe li ber hindê negirta, wê ji xwe re got.

Derece bi dawî hatin û ew gihan balkonê di zinarîwar re. Roj ava dibû. Sornayê di ser derabeyê, ya ku digiha navtenga mirov, re li hawirdor nêrî. Zinar bi dehan axûşan qinc (emûdf, dikey) diket jêr û bi bestek keviran a erjeng bi dawî dihat. Sornali xw ezivirî ji bo ku bide pey jinikê lê dît ku ev rojavabûnê temaşe dike.

– Bibexşin, navê we çi bû?

– Min jî nav tune ye. Ew di yek ji kerxaneyên Domelê de wenda bû. Dema ku bejnbostan ez kirîm, min zanî ku ez ê nekevim çiyek xerabtir ji yê ku ez lê bûm. Wan ez anîm vir, cem Cenawer. Pizor (ancax) ez li vir fêrî jiyanê bûm. Em herdu bi hev re girêdayî bûn. Cenawer – wek yekem kes di cîhanê de – bawerî bi min anî. Ji sî salî bêtir em herdu bi hev re jiyan, û ez bextiyar bûm.

Ew li Sornayê zivirî.

– Û niha tu hatî. Genc û ciwan.

Destên wê tundtir debare şidand.

– Tu niyet dikî wî ji min bistîni. Û ew dihêle wisan biqewime. Piştî sî salan ew ê vê yekê bîne serê min. Min ew ji şeydayiyê (depresyonê) xelas kir.

Jinik hema hema dixîskî.

Sornayê niyet dikir tiştêkî bibêje lê peyv dernediketin.

– Te hewl da birevî lê ketî.

Zîkê Sornayê hinekî êşiya. Di destê jinikê de xencerek dirêj a bitirs hebû. Wê êrî-şî Sornayê kir. Sornayê xwe paşde da û di zendê jinika pîr re girt. Devê xencerê bi pîlê wê ket. Sorna ji ber janê qîriya lê destê wê berneda.

– Diz! Adu! Jinik xîskî û çokê xwe li zîkê Sornayê da.

Sorna ofî û helîşî lê dîsan jî bi destêkî destê jinikê, yê ku xencer tê de bû, zeft kir û bi destê din nedihîşt jinik çavên wê biqoqilîne. Xencerê milê Sornayê xîçand. Sorna qîjî û serê li diyaframê jinikê da. Devê xencerê cardin pê ket.

Sornayê hewl da bigezîne lê tenê hinek qumaşê gir ket ber devê wê. Jinikê Sorna pêhnand lê di pêhnan de hêz tune bû ji ber ku Sorna pîr nêzîk bû. Çokê hestîn bi Sornayê ket. Sornayê, ya ku ji ber darbeyan gêj bûbû, xwe paş de avêt û jinik jî bi xwe re rakîşand. Destîkê xencerê li ser rûyê wê bû û wê hes kir ka çawan madenê sar ji guhê wê digirt. Sorna bi korane perpitî, gevizî û pêhnand û jinik bi qulipînê ji ser kelaxê xwe dûr avêt. Sornayê xwe dûr xist û rabû ser xwe. Xencerê bi sivikî ji piyê wê girt. Sorna bê balans pêş de çû lê agahdar bû ku di quncika balkonê de asê ma. Ew li goşeya balkonê, ya ku ji her alî de rê li ber valatîyê vedikir, bû.

– Xwe biavêje, daxwaz ji pişt Soranyê hat bihîstin.

Sorna li xwe zivirî. Jinik, xencer di destî de, pêrgî wê dihat. Xwîn ji pozkunîkek jinikê diçipî. Sorna, bi niyeta êrîşkirinê, ber bi destê wê yê vala de livî. Jinik jî berevajî. Sornayê çend pêngavên lezgîn ber bi xencerê de avêtin, mîna ku wê rabihilîne. Piştî ew zû zivirî û daberizî aliyê din.

Hema hema ew derbas bû. Xencer bi palarînê wê ket û kêlek xîçand. Sornayê bi dozîna xwezayî xwe da paş û li ciyekî hilingivî. Ew rû bi rû ket erdê. Sornayê hewl da ku bi çerixînê rabibe ser lîngan lê piyên jinikê li ber singê xwe dîtin.

Sornayê, ji bo ku darbeya xencerê bibîne, serê xwe rakir. Lê jinik bi saya destên xwe yê piçûk rabû ser xwe. Cenawer bi xemgînî jêr li Sornayê nêrî.

– Ma tu pîr hatî êşandin?

– Na, Sorna xizî, tenê çend selix.

– Tu here jêr salonê. Tu wê ji min re bihêle.

Jinik, tevî şidandina Cenawer jî, arfaram bû. Wê xencer jî ji destê xwe xistibû. Sorna li xwe zivirî û bi dereceyan ve çû jêr. Bi gihana salonê re ew ket û dest bi xîskînê kir.

Cenawer vegehbû. Sornayê nedizanî ka wî demek çiqas dirêj li wê ya paldayî nêribû.

– Li min bibore, wî got

– Ez baş im. Birînên min tenê selix in.
– Min nedizanî ku ew ewqas li min bihêrs e. Nexwe wê niyetên min ên rast nedizanîn jî.

– Ma te ne...

– Tu jî! Cenawer matmayî dixwiya. – Min bi tenê xwest hinekî bi te re li ser vê dunyayê sohbetê bikim. Kevirkêş li derî hertiştî ne. Pişt re min ê bihiştta wan tu bi-birayî Andolê. Lê ev şaş gihîna han... Divê ez bi cidî bi wê re bipeyivim. Belkî tenê-tî ji mirovên adî re ne baştirîn tişt e. Diviyabû me bar bikira Andolê daku min bikariya xizmetên xwe ji padîşah re pêşkêş bikirana.

Sornayê xerab hes kir. Ne bi tenê ji ber xwe lê herwiha ji ber jinika pîr û Cenawer, ên ku herdu ji bûyerên cihana adî bêagah bûn, jî. Jinik tirsîbû ku herkes ê Cenawer jê bistîne û Cenawer jî xeyal kiribû ku carekê tola xwe hilbîne. Ax, çi cot. Sornayê dixwest bigirî lê dema hindê jî ê bihata. Ew rabû ser bêçiyên piyan, bi nermî destê xwe li gepa Cenawer da û hêdîka derket derê.

Hê li derve jî tiliyên wê ji ber rondikên Cenawer şil bûn. □

Wergera ji finî: **HUSEIN MUHAMMED**


Çapa orijînal ya vê çîrokê: Kaksi kaunotarta ja hirvi.

Cara yekem di kovara bi navê Spin (1/86) a science fictionê de hatiye çapkirin.

Ev kurteçîrok dikare herwiha ji Internetê jî bê ditin:

www.welcome.to/husein

Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e



ŞEREFXAN CIZÎRÎ

Di civata kurdan de jin him tê bilindkirin û him jî tê nizmkirin. Ev yeka hanê him ji aliyê dîrokî de wiloye û him jî ji aliyê civatî de wilo ve. Di pirsgerêka jinan de, hergav dîtînen exlaqî, îdeolojîkî, kulturî û çîneyetî xwe nîşanî mirovan didin. Pirsra jinan ji avaniya civatê, danûstandînen

berhemî û ji jiyana sosyal nikarin werin veqetandin. Li pirsra jinan divê mirov bi metodên dîrokî meyze bike. Di pêşketina civata kurdan de, dîtînen li ser jinan çawa hatine guhertin? Li ser vê rasteriya dîrokî mirov dikare gelek mînakên derxîne pêş. Di zargotina civatê de, di kultur û edebiyata bi devkî de, di qerfên erotîkî de, pirsra jinan hergav di rojevê de maye. Wexta ku li hesabê mirovên kurd hatiye wan gotina ku "Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e". Li aliyê din jî mirovên kurd gotine ku "Jin darên şikestî ne", "Ma ew jî jin e, agir kete mala min e". Di navbera van herdu dîtînen ku ji sedî sed li miqabilî hevdu ne, gelek rê û rêçîk hene. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku di civata kurdan de, pirsra jinan pirseke gelek mezin e, lê belê li ser vê pirsê heta niha gelek tiştên telomelo hatine gotin. Tê gotin ku jina kurd hergav kole bûye, bêşexsiyet bûye û reben bûye. Bi raya min ew dîtînen gelekî çewt û dûrî ras-

Di edebiyat û kultura devkî de, jin xwediyê cîhêkî bi rûmet in. Ev cîhê bi rûmet ne bi tenê cîhê rebena ye. Ew ne bi tenê cîhê mirovên kole, cêrî û qerwaşa ye. Hilbet qerwaş û reben jî di van tevgerêdanan de hene. Ma ew di kîjan civatan de tune ne? Ma li hemû civatan ew rastî ne wilo ye? Lê li miqabilî van kategoriyên sosyal, li welatê kurdan xatûn hene, xanim hene, serbizêr hene, evîndarên xurt hene, dayîkên wêrek hene, pîrekên şervan hene û hwd. Wexta ku diya Hemê Gozê ji lawê xwe re dibêje; "De lê xîne lawê mino lê xîne. Pozberano de lê xîne. Lawê mino ne bêje ev lawê filan axayî û bêvan axayî ye. Derba pêşî li bin çengê lawê dewletê xîne", Gozê li vir weke dayîkeke wêrek derdikeve pêşiya mirovan. Li vir Gozê di helwestgirtina xwe de gelekî zelal e û bi hişmendî tevdiqere. Ma li vir Gozê bi rastî weke darekî şikestiyê? Hilbet na. Di vê tevgeradanê de Gozê jineke serbilind e û lawê xwe diajo ser kozikên dijmin. Li ser Hemê Gozê peyayên eşîrên kurdan weke Pencînariyan, Delikiyan û Şexîyan, Musikiyan, Neqîbiyan, Gurdiliyan û Welîyan bûne kom. Şerê navxweyî giran bûye û Hemê Gozê di kozika xwe de weke kewê ribat sekiniye. Gozê ji lawê xwe re, di vî şerî de dibe weke kaniya moral.

Mirovên ku di edebiyat û kultura devkî de qala wana tê kirin, kesên neqandî ne. Ew li Kurdistanê temsîlî hinek hêzên sosyal dikin. Piraniya wan aristokratên eşîran e. Li ser bingêhên pîvanên eşîrî ew têne bilindkirin an jî nizmkirin. Wexta ku dengbêj wan bilind dikin, bi taybetî ji bona exlaq û qîmetên wan ên sosyal ew têne bilindkirin. Wexta ku kirinên mirovan bersiva pîvanên eşîrî yên îdeolojîk didin, wê gavê ew kes ne bi tenê ji bona eşîra xwe, lê belê ji bona hemû eşîrên kurdan dibin nimûneyên sereke. Ew tu caran bêyî encamên rast û ji aliyê exlaqî de paqij, nayêne pesinandin û bilindkirin, lê belê gava ku kirinên wan li dijî pîvanên eşîrî disekinin, li dewsa pesinandinê ew îcar têne ricimandin. Di hemû edebiyat û kultura bi devkî de, li ba gelê kurd dualîtiyeke pir xurt heye. Ev dualîtî xwe di têkoşîna di navbêna qenc û qenciyê li aliyekî û li aliyê din jî xerab û xerabiyê de diyar dike. Ev herdû xetên qalind li dijî hevdu bi gelek haweyan şer dikin. Heq û neheqî li ba dengbêjan dibe weke pîvanên hunerî ku hemû kes karibin vekirî li cem kesên xwedîheq cîhê bigirin. Dengbêj di vê tevgerêdanê de dibe alîkar ji bona ku guhdar helwestên xwe yên îdeolojîkî zelal bikin. Dengbêj bi tenê bi gotinên xwe, bi hîlbijartina kiriyanên ku hevalbendên heqiyê ne, bi helwestên xwe yên zelal û vekirî, bi tona dengê xwe cîhê xwe diyar dike. Guhdar jî bi bêdengî li vê helwesta hunerî guhdar dike û qi-

metên ku di vê tevgirêdanê de derdikevin meydanê, di hundirê xwe diserifîne. Ji aliyê hîsî de guhdar bi van qimetan xurt dibin û dikemilin...

Ew rastiya ku min li jor qal kir, di pîrsa jinan de jî wilo ye. Em baş dizanin ku hemû jinên arîstokratên kurdan an jî hemû jinên zehmetkêşên kurdan nebûne mînak di edebiyat û kultura devkî de. Ji vana hinek hatine hilbijartin. Di dawiya dawî de ew jin temsîlî çîna xwe dikin. Her çiqasî ew weke kesên bijarte dikevin nav refên edebiyat û kultura devkî de jî, dîsa mirov nikare wan ji tevgirêdanên wan ên sosyal îzole bike. Ew bi alîkariya çîna xwe dibin kes û di nav edebiyat û kultura kurdan de bi vî hawayî jî cîhê xwe digirin. Hilbet çîna wana jî bi alîkariya van kesan, ji gelek aliyan de xurt dibe, dibişkive, ruh pê tê û avaniya xwe ya civatî mezintir dike. Çîna ku li vir tê qal kirin ji aliyê kesayetî de dikemile û ji aliyê îdeolojî de jî hîna kûrtir dibe.

Ew tîpên jinan ku min di vê xebatê de anîne ziman, hemû xwediyê navekî xurt in, li gora pîvanên dema xwe ew zana ne. Wan tu caran rêzana ku di rojevê de ye, weke ku ew heye qebûl nekirine. Li himberî normên kevnare ku fonksiyonên xwe yên sosyal winda kirine, ev tîpên jinan ên wilo serî hildane. Li himberî neheqiya civatî, wan bi kirinên xwe, helwestên xwe zelal kirine. Ji bona wan tîpên jinan, kirin ji gotinê girîngtir bûye. Kirin, di pratîkê de liberxwedan bûye. Di civata eşîrî de gotinên zêde, ne sixletê başiyê bûn. Li gora dengbêjê hêja Mihemed Eliyê Kercosî "gotina zêde ji xwediyê xwe re hergav ezab e". Di civata eşîrî de norma sereke ne zêde şitexalî ye, lê belê norma ku li ba kultura eşîrî pir bi rûmet bû, hindik gotinî bû. Ji ber vê yekê jî kirin ji gotinê gelek caran girîngtir dibe. Di tevgirêdanên civata eşîrî de ku derbasî edebiyat û kultura devkî bûne, bi tenê gotinên "pêwîst" têne gotin. Gotinên ku ne pêwîst in, weke ku berê jî hatiye gotin ji xwediyê xwe re dibin ezab. Ew li xwediyê xwe dibin bele. Xwediyê gotinan, piştî gotinên xwe dikarîbûn di bin barê gotinên xwe de, bikevin û careke din jî ranebin. Barê gotinên zêde ji xwediyê xwe re, ji barên kevirên çiyayên Omeriyan gelekî girantir dibû.

Heger mirov xiyala xwe baş bide Epopa Seyra Gulîsor, li vê derê Seyrê tenê gotinên pêwîst dibêje. "Li min Seyrê li min nemayê, Li min destê li ber rûwayê, li min şermikara Welatê Hesenan û Heyderayê..." Di van hevokan de gotinên pûç û vala tunene. Li vir bi tenê gotinên pêwîst hene. Sosreta ku bi serê Seyrê de hatibû, heger ku îro bi serê hinekan bihataya, ewê bi çewalan gotinên vala û "erebesk" ji bo

vê yekê bihatana gotin. Ewê gotinên li ser vê bûyerê weke benîştên etara bihatana cûtin. Ewê di vê serpêhatiyê de gelekî çewsandina hîsan bihata kirin. Seyrê di serpêhatiya xwe de gotinan zêde nazîvirîne, li serê çiya û zinaran wan nagerîne. Gotinan li zimanê xwe naherbilîne. Gotinên Seyrê bi tenê ji bona ku rewşa wê were diyarkirin û fahmkirin, li ser zimanê wê digerin. Ew hemû gotinên pêwîst in. Her hevokek Seyrê bersiva rewşeke hîsî wê dide û dibê weke xelegekê ji bona ku guhdar serpêhatiya Seyrê fahm bikin. Bûyer, gotin û hîsên Seyrê bi haweyekî hunerî, li vir hevdu timam dikin.

Ew tîpên jinan ku em li vir qal dikin, ne kesên rewşenbîr in. Hilbet dema wan ne dema jinên rewşenbîr bû. Di vê dema adetî û eşîrî de zilaman jî nikarîbûn sixletên rewşenbîrî ji xwe re peyde bikirana. Xwendin û nivîsandin di vê demê de, hema hema tune bû. Mirovan xwe li ser hinek sixletên din tov dikirin. Jinan jî vê demê, bi taybetî dixwastin ku hinek sixletên zilamî di xwe de kom bikin. Mêrxasî yek ji wan sixletan bû ku jinên kurd di civata wan de, dikirin xwediyê cîhêkî bijarte. Bedewbûn sixletekî din î sereke bû. Jina bedew xwediyê gelek derfetan bû. Hilbet di vê tevgiredanê de em qala bedewbûna fizîkî dikin, babetên din ên bedewbûnê jî hebûn. Lê belê ew di vê kontekstê de, ne xwediyê cîhên neqandî bûn. Bedewbûna fizîkî û eslê jinan ji wan re dibû weke mertalekî xurt û wan ji gelek êrîşan diparast. Seyra Gulîsor ne bi tenê ji bona ku bedew e lê belê ji bona ku esîle jî, dibe mînak û di edebiyat û kultura devkî de cîhê xwe digire. Gewre Xatûnê ya ku me di Epopa Kalo an jî Nuho de qala wê kir, ew jî di nava civatê de cîhêkî bi rûmet digire. Gewre Xatûnê xwediyê du sixletên sereke ye: Ew bedew e û esil e.

Li vir em dikarin qala Qûmrî Xatûnê jî bikin. Qûmrî Xatûnê û Ahmed Axayê Amûdê, di Epopa Sekvanê Xurikî de derbas dibin. Epopa Sekvanê Xurikî yek ji berhemên Reşîte Omerî ye ku li herema Mêrdînê gelekî tê naskirin. Sekvanê Xurikî di vê Epopê de dibe sembola mêrxasiyê, dibe bextê bav û kalan û exlaqê eşîrî diparêze. Qûmriyê dergistiya lawê apê xwe ye û li bajarê Amûdê runiştîye. Li bajarê Mêrdînê jî Emîn Paşa heye. Lawê Emîn Paşa Çelebî dil dekeve Qûmrî Xatûnê. Weke ku min li jor jî got, Qûmriyê dergistiya lawê apê xwe ye. Lê belê Emîn Paşa bi zorê, bi timayiyê û bi malê dinyayê, Qûmrî Xatûnê ji bavê wê distîne û jî lawê xwe Çelebî re, dibe Mêrdînê. Dergistiya wê bi dû Qûmrî Xatûnê dikeve. Piştî çend rojekî li Mêrdînê, herdu şevêkê ji Keleha Mêrdînê direvin, li hespê xwe siwar di-

bin, serberjêr dibin û berê xwe didin Gundê Bûhêrê û Beriya Mêrdînê. Ew bi hev re dikevin nav henek û laqirdiyan, ji kêfa û agirê evînê ew xwe ji bîra dikin û li wan fereca sibehê lêdixîne. Herdû li hev dinêrin û bi ser halê hevdû de digirin. Qûmrî Xatûnê ji pismamê xwe dipirse; ma pismam çima tu digirî? Pismamê wê bersivê dide; binêre Bavê te ev neheqî li me kir, em niha herin kuderê, hemû hevalbendên Emîn Paşa ne. Li vê qebheta ku bi serê me hatiye binêre. Sitara me li tu deveran nemaye û em nema karin li tu deveran gepik nan jî bixwin... Wê gavê Qûmrî Xatûnê aciz dibe û hema bi carekê re kulmekê li nava serê wî dixîne û jê re dibêje; min digot qey tu li ser namûsa me ya ku wê di nava destên xelkê de bimîne digirî. Pepûko, ma ku niha leşkerê Emîn Paşa bên bi ser me de û min jî bi darê zorê ji te bistînin, wê gavê ewê feleka me li me bigere. Emê wê gavê di nava destên wan de bimînin, emê hêşîr bibin û qebhata mezin jî ji xwe ev e. Ma tu li ser nanê zikê xwe digirî? Dibêje... Bi kurtî Qûmrî Xatûnê di hemû Epopa Sekvanê Xurikî de dîtînin rastî pêşiya pismamê xwe dike û wî ji gelek belan xelas dike. Qûmrî Xatûnê jî him bedew e û him jî esîl e. Di vê Epopê de Qûmrî Xatûnê şexsiyeteke pir xurt e û bedewbûna wê jî, li hemû heremê deng dabû. Wexta ku pismamê wê dikeve taya nanê zikê xwe, Qûmrî Xatûnê fikrên rast û riya namûsê pêş wî dike. Qûmrî di gelek waran de ji pismamê xwe zîrektir û xurtir tevdigere. Bi aqilî û zanêbûna Qûmriyê û mêrxasî û dilovaniya Sekvanê Xurikî, herdû evîndar xwe xelas dikin û ew digîhêjin miradê xwe...

Li aliyê din, keçên kurdan ku evîndar in jî, di edebiyat û kultura devkî de, pir fedakar in, ew heta dawiyê bi evîndarê xwe re ne û tu kes nikarin wan ji riya wan vegêrin. Ew bi sebreke mezin qala evîndarên xwe dikin. Piraniya caran xeyalên wan ên erotîkî hene. Ev xeyalên erotîkî ne fehş in, ne hişk in lê belê mirovî ne, ew germ in, nerm in û paqij in. Tije hîs in. Evîna jinên kurd safî ye, tê de qilopilo tune. Ev hîsên mirovî ku li ba jinên kurd hene bi mijara fedakariyê re, raserî hevdû dimeşin. Keça kurdan ji hemû aliyan de fedakariyê dike. Ji dilê safî bi evîndarê xwe re ye. Şik û fen pê re tune. Wek nimûne, em dikarin bibêjin ku Medîna mala melê tîpeke wilo ye. Evîndara Ehmedê Ronî tîpeke wilo ye. Wexta ku evîndara Ehmedê Ronî jê re dibêje "Ezê bazin û xirxalên xwe bişikînim û ji hespa Ehmedê Ronî re bikim nal û bizmar e. Ji bona ku li welatê xerîbiyê kes ji delalê dilê min re nebêjin; ev çi xortekî bê pergal e." li vir ew evîndareke tîpîk a kurdan e. Mirov baş

dibîne ku di van gotinan de weke ku li vir jî baş tê xuyanîkirin, evîneke pir paqij, zelal, fedakariyeke ji dîl û can, û hezjêkirineke mirovî heye. Li vir xuya dike ku evîndar kesekî xizan e û ji ber wilo jî evîndara wî dixwaze ku bazinên destê xwe ji hespa wî re bike nal û bizmar. Evîndar, hemû hebûnên xwe yê madî feda dike ji bona ku kes henekên xwe bi evîndarê wê neke.

Besna Xelîl jî ku keçeke Omerî ye, ew jî di edebiyat û kultura devkî de tîpeke tije evîn û dilbijandinî ye. Wexta ku ew ji xwe re dibêje” Ez Besna me Besna Xelîl im. Bejna min zirav e weke qendil e. Porê min ji vî milî heta wî milî ne. Min hejmartiye, di serê min de sêsed û sîh û sê kezîn e. Tiliyên min ji mûm û şimayê birîn e”, ew bi rastî eynî tîpeke wilo ye û gelek keçên din ên evîndar ku navên wan ne diyar in jî, wilo tevdigerin. Bavê Besna Xelîl ew dabû yekî bêyî dilê wê. Hilbet ji bona peran û malê dinyayê. Di warê evînê de, dê û bav çiqase çikûs bin jî, li miqabilî vê çikûsiyê keçên kurd hergav bi dilovanî tevdigerin. Li ba keçên kurdan fedakarî û evîna paqij bi hevdû re dimeşin. Tîpolojîya edebiyat û kultura devkî hergav van motîfên ku min li vir qal kirin, derdixîne pêşîya guhdaran û dixwaze ku keça kurd wilo pêşkêşî civata xwe bike.

Di bin hişmendiya keça kurd ya evîndar de, hergav daxwaziyên erotîkî tamorkirine. Ji ber ku gelek caran evîndar nikarin bi haweyekî hêsanî bigîhêjin hevdû, ew hergav daxwaziyên xwe li ba xwe hiltînin. Li wan miqate dibin. Tenê ji derdoreke teng re, ew daxwazî di destpêka evînê de tên vekirin. Ew derdora teng ku ez qal dikim bi mana sosyal teng e. Ji mirovên gelekî nêzik re, ew hîs, daxwazî û dilbijandin tên vekirin. Hemû keçên evîndar ji xwe re cîhekî ”kesî” ava dikin. Vî cîhê ”kesî” kêma kes dizanin. Di destpêka bûyeran de ev rastî wilo pêş de diçe. Piştî ku tiştên bi dizî eşkere dibin, wê gavê jî dîwar li pêşîya evîndaran pir dibin. Sêncên civatî ku li pêşîya wan hatine bilind kirin, bi rastî bilind dibin. Ji ber encamên dînî, çîneyetî, xizanî, heremî û kulturî, ew sêncên civatî gelekî tên bilind kirin. Derbaskirina van sêncên civatî, hewcedariyê bi evîn û şexsiyetên pir xurt derdixîne meydanê. Ji ber ku kes nikarin evîna xwe bi haweyekî hêsanî bijîn, bêrîkirin, daxwaz û dilbijandin, berê xwe didin bin hişmendiya mirovan.

Di bin hişmendiya evîndarê kurdan de, gelek daxwaziyên veşartî hene. Daxwaziyên ku xwe di bin hişmendiya keça kurd de vedişêrin, di pir rewşên sosyal de bi keça evîndar re bi tenê dimînin. Li vir pêşî monologa keça kurd pêş de diçe. Tenê

keça evîndar dikare bi daxwaziyên xwe yên ku ketine bin hişmendiya wê re biaxive. Wekî din axavtin qedexe ye. Di rewşên ku tenêbûn tê de heye, ew daxwazî dibişki-
vin û geş dibin. Evîndar û daxwaziyên ku ketine binê hişmendiya wan, bi hev re
dibin destbirak. Di hemû waran de ew dibin şirikên hevdû. Gelek caran ew li ha-
lên hevdû dipirsin. Bi dizîka ew tiştan ji hevdû re dibêjin. Dibêjin; ma xwişka min
tu çawa yî? Di bersiva pirsyarê de, halên evîndaran yên ruhî derdikevin ser rûyê
avê. Di rewşên fermî de ev daxwazî nikarin werin şirovekirin, ew bi dengê bilind
nayêne gotin, ew di roman û çîrokan de nayêne ser ziman, di film û şano de ew
nayêne eşkerekirin, cihê wan bi tenê di bin hişmendiya evindara de dimîne. Wexta
ku evîndar dixwazin wan hîs û daxwaziyan bidin der, ew bi riya stranên û epopan,
qerfan û dîlanên xwe îfade dikin. Ev stran û epopên hanê dûra dibin anonîm û li
nava gelê kurd jî belav dibin. Ji ber wilo jî gelek stran û epopên kurdan anonîm in.
Heta niha bi hezaran epop û stranên wilo di kultura gelê kurd de çêbûne.

Di civata kurdan ya klasîk de şer û jin, ji nêzikayî de hevdû dişopînin. Dijminatî
di nava eşîrên kurdan de, gelek caran li ser pirsgerîka jinan derdikeve. Heger mirov
lêkolînek piralî li ser şerê ku di edebiyat û kultura devkî de heye, bike, ewê rastiye-
ke civatî û dîrokî ku encamên wê gelek zelal in, derkeve miqabilî mirovan; yek ji
van encamên herî xurt ku şerê eşîran li ser gur dibe, xeleka jinan û dilketinê ye.
Min heta niha ji stranvan û dengbêjan bi sedan bûyerên li ser şer, epopê, lawcê,
dûrik û serpêhatiyên guhdar kiriye ku encamê pevçûna wan, li ser pirsra jinan û dil-
ketinê ye. Hilbet ev dilketin wexta ku ne li gora exlaq, pîvan û qîmetên eşîrî bin,
wê gavê ji bona şer û pevçûnê hemû tişt amade bûne. Heger şeref û namûsa miro-
vên kurd kete nava lîngan (hilbet li gora pîvanên eşîrî), ji şer û pevçûnê pê de, tu
riyê din ji wan re namîne.

Ev tiştên ku min li jor qal kirin, bi zelalî nîşanî mirovan didin ku pirsra jinan yek
jî kilitên civata kurdan e. Ji bona ku mirov karibin li ser civata kurdan ya eşîrî hi-
nek zanebûnên rast derxînin holê, mentalîta Kurdên eşîr piralî fahm bikin, dilbi-
jandin û evîndariya wan ji hevdû vejinînin, divê pirsra jinan baş were analîzkirin.
Pirsra jinan di edebiyat û kultura devkî de weke qesreke çil derî ye. Her ku mirov
deriyekî vedike, şeş deriyên din derdikevin pêşîya mirovan. Her deriyekî pêşî di de-
verekê re diçe. Ev derî dûra hemû li hevdû vedigerin. Kesên ku di karên xwe de ne
hoste bin, karin gelek wextê xwe li vir winda bikin. Dikare sergêjekî li wan bigerin.

Lê kesên ku hayê wan ji civata kurdan hebe, dikarin zû xwe bigihînin hemû deriyên û dîsa zû bi paş de veşerin. Di kûraniya civat û dîroka me de, gelek kes fetisî ne. Em gelekî baş dizanin ku kurdan him di realîta civata xwe de û him jî di edebiyat û kultura xwe de, li ser jinan şer kirin e. Jinên ku mirov ji bona wan şer dikin, hilbet mirovên kurd evîndarên wan jî bûn. Heger ku jinên kurd bêqîmet bûna, ewê mirovên kurd çima ji bona wan şer kiribana? Dayîk, xuşk û evîndara mirovan li ba civata kurdan, xwediyê cîhekî payebilind in. Hilbet jinên ku cihê wan ên sosyal ne zêde bilind bûn jî, di civata me de hebûn. Qerwaş, cêrî, jinebîh û hewî di civata me jî de hebûn. Ez vê yekê baş dizanim. Lê wexta ku mirov civata kurdan bi civatên cîran re bide ber hevdu, ewê eşkere bê xuyakirin ku kurd di derheqa jinan de, ji cîranên xwe nermtir bûne û jinên kurdan jî ji jinên cîranên xwe bi qîmettir bûne. kurdan, ji ber gelek encaman bala xwe baş berdane ser jinên xwe. Ji bona mînak ez bibêjim; tu caran nikare bibe gotineke vala wexta ku kurd vê gotina hanê dibêjin; "Ewê ku zilaman radikî û dixînin jî, jin bi xwe ne", "Stûna malan jin in", û hwd. Ev rastiya civatî û dîrokî divê hergav di bîra mirovan de bê. Ji ber ku mirovên kurd, divê civata xwe û dîroka xwe bi hemû rastiyan wê ve nas bike û li ser hîmê wê naskirinê jî, zanebûna xwe li ser civata kurdan zêde bike. Wê gavê ez bawer im ku ewê edebiyat û kultura kurdan geş bibe, karên rewşenbîrî bi qîmet bibe û zanebûnên heja derkevin miqabilî mirovên kurd. Dewlemendiya civata kurdan heta niha, di warên edebiyat û kultura devkî de bû, hişê civata me ji aliyê dengbêjan, stranbêjan û çîrokbêjan de, hergav dihate xemilandin. Em dizanin ku ew dema ha îcar derbas bûye. Di warên edebiyata nivîsandî de jî, îcar nivîskarên kurdan li ser vî bingehe ku min li jor qal kir, ji niha û pê de dikarin gavên mezin biavêjin. Rola ku berê dengbêjan, stranbêjan û çîrokbêjan dileyîztin, ji niha pê de divê nivîskarên kurd bileyîzin. □

Şiroveya Dîwana Melayê Cizîrî

DÎSA JÊ ŞANÊ WÎ PÎROZ BE! [Ji dengê tîpa elifê]

MELE EHMEDÊ ZIVINGÎ / Wergera ji erebî: EMÎN NAROZÎ

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema
Badexwiran noşînoş mane li dorê cema

Muxbeçe: ji gotina "mux" ku ji bo serkarê meyxaneyê tê bikaranîn û ji peyva "beçe" ku bi maneya zarok e, pêk hatiye û li vir ji bo sengeleyên ku li meyxaneyê li ber mêvanan şerabê digerin, hatiye xebitandin. Ew bi piranî sîpeyên (xortikên) bêmû û rûdelal in ku bala zebûniyên meyxaneyê dikişînin ser xwe û wan li wê derê dicivînin.

Tevahiya maneyê: Ew sîpeyên bêmû yî rûhilû ku li meyxaneyê dixebitin û badeyê li ber araqvexwiran digerin ji bo kêf û dilkêşiya wan her şev heyânî berdestê sibehê lotikan didin û govend û dîlanê digerin. Ew badevexwir jî timî li dora wan lotikvan û govendgêran kom dibin, li hafa wan radiwestin bi dilxweşî li wan temaşe dikin û hê bihtir dibe noşenoşa wan, vedixwin û çoş dibin.

Hin gulê boenber in, hin di şêrînesmer in
Hin guherîdane yin mîslê suheylê sema

Tevahiya maneyê: Hinek ji wan muxbeçeyan mîna gulên bihnenber in [yan jî bihna enberê ji guliyên wan tê], hinek jî rengesmerên pirnazik û xwînsêrî in. Yê dî jî mîna libên gewher û yê mirarî ne ku di delalî û tîrêjvedana xwe de dişibihin wê stêra suheyla ya esmana.

Hin zerî ne purr sîrr in, serbiper in, dêmduur in
Mîn ku di çerxê we dî sebr û qerarim nema

Encama maneyê: Hinek ji wan xebatkaran rengzêrîn û dilruba ne, serên wan yan bi qevdek pirtikên rengîn yan jî bi rêşîk û pelikên zîv û zêr xemilandî ne. A, dema min ew di govendê de bi vî halê dîtî tebat û arama min nema û ez ji ber nazikî û delaliya wan bêhiş ketim.

Sebr û qerarim ku bir can û ceher hûr dikir
Zulmê, we reng kî dikir! Can dibir û dil teba

Encama Maneyê: Dema yarê semax û arama min bir hingê laş û cergê min jî parî parî kir û pê re bir. Ma gelo kesî ku ev cure eziyet bike û can û dil pêk ve bi yek carekê bibe heyê? Na, ji dildarê pê ve zordareke din ê wisa tine.

Can û dilê min ew e, horîweşê min ew e
Padîşehê min ew e, ez li derê wî geda

Encama Maneyê: Ew dildar weke dil û canê min e û li ber çavên min mîna serekhoriyekê (horil'eynê) ye. Ew serwera ku fermandarî li min dike her ew e û ez bi xwe li dergêhê wê weke xîzan û xwestekê li benda qencî, mehrîvanî û dilovaniya wê rawestiya me.*

Yarê ku dî em geda destî bi destê me da
Em bi semayê birin reqs û sema jî we ma

Encama Maneyê: Gava yarê dît ku ez rebenekî muhtacê qencyê me rabû destê xwe da destê min, bi destê min girt û min bir nav gera wê reqs û dîlana ku li hizûra Xwedê digeriya. Herweha ji ber xatirê dildarê rêz û gera wê reqs û dîlana pîroz î payebilind a xwedahî qet neguherî û kes ji bo min jê venekişiya.

Gote me durdaneyê "em ji te û tu ji me yî
Lew bi heqîqet yek in, mes'ele bêşubhe ma

Encama Maneyê: Ew dildara ku delalî û zelaliya wê weke ya libek dur e ji min re got: "Em ji te ne û tu jî ji me yî û ji ber vê yekê jî bi rastî em herdu jî yek in"; nexwe tu guman û dudilî di vê mesele û dozê de nema.

Da mi bi destê surî cama ji rengê durrî
Cezbe giha can û dil pir şewişandin hema

Encama Maneyê: Evîndarê bi destê xwe yê dilruba piyaleya zelal a rengdur da me, yanî me bi şeraba wê avda û bi wê avdanê re dilkêşiyek gihîşte dil û canê me ku ew bêsedem li hev şaş bûn û şewişîn.

Bade mi noşî ji dest, çûme ji xwo mame mest
Qitre bi behrê giha behr-i bi eynê xwo ma

Encama Maneyê: Min qedehek araq ji destê evîndara ku li pêş bihûrî vexwar ez ji ber wê ji hiş çûm û min xwe wenda kir. Ez demekê di wê rewşê de mam û pişt re gewdeyê min fena dilopekê kete nav deryaya heqîqî, lê deryayê qet li eynê xwe dananî û pê kêm û zêde jî nebû; yan jî ew derya bi laşê min ê gemarî qirêjî nebû. Diyar e ku mebest jê ciyê tinebûnê [meqamê fenayê ku mirov pê dibe fena fillah] ye ku bi tenê kesê gihîştîyê dinase.

Goş-i bi 'amê mede, terki medamê mede!
Ekseruhum fi xuma exlebum fi 'ema

Encama Maneyê: Tu guh mede gotin û şîretên xelkê amî û dev ji araq xwe bernede, çiku pirtirînên wan di şeveke ewrav î hîvveşartî û tarî yî bi saw de ne û gelek ji wan jî çavkor in, çavên wan tarî bûne rastiye nabînin û tu tiştî fahm nakin; vêca çawa tu dê bi ya wan bikî û guh bidî şîretên wan.

Herf-i ji yek bûne fêsl, ger bibirî wan bi esl
Herf-i dibit yek xetek xet ku nema nuqte ma

Encama Maneyê: Bêguman herf û tiştên di gerdûnê de pêştî çêbûnê ji hev veqetiyane, digel ku berê tevde yek û pêkve bûn jî. Îcar ger ku tu wan dagerînî ser esl û bingehên wan yên berî dîtîne hingê hemû dibin xetêke bi tenê î bêbeş û ku tu wê xetê jî weha nehêlî û bibî ser eslê wê dê ew jî bibe yek nuqteyek, bê we ku dê nuqte bi tenê bimîne; yanî dê gerdûn giş têkeve hundurê nuqteya hebûna rastî û tiştêkî din namîne.

Ev yeka han çêlî [îşaretê dîtina sofîya ya] "wehdet el-wucûd"ê, yekbûn û yeklaşiyê dike. Şêx jî [Melayê Cizîrî] rehma Xwedê lê be, çawa ku di gelek cihên dîwana xwe de jî diyar dike ji wê beşa sofîyan e ku yekbûn û yeklaşiyê diparêzin (ku li gor dîtina wan gerdûn tev ji yek nuqteyekê hatiye afirandin- E. N.). Yek ji wan cihên ku "wehdet el-wucûd"ê tê de diyar dike jî rêza bê a "We'hdetê mutleq..." ta dawiyê ye.

We'hdeti Mutleq "Mela" nûr e di qelban cela Zorê, di vê mes'elê, ehlê dilan şubhe ma

Cela: yan lêker e bi maneya eşkerebûn û xuyakirina gotinê ji xelkê re ye ku hingê maneya wê dibe: yekîtî rohnîyeke ku di dilan de eşkere û diyar bûye; yan jî nav e û bi maneya kila çavan e çiku ew jî mîna kilê çavan paqij dike û vedike, hingê jî mane weha dibe: yekîtî wek kila ku di dilan de ye, ew çawa çavan paqij dike û vedike wisa ev jî ronahîyeke ku dilan ji wê gemara dilbijînê (nefsanî) û ji patewasên (weswesyên) şeytanî (anîzazî) paqij dike.

Encama Maneyê: Ey Mela bêguman yektahiya sereke rohnîyeke ku di dilan de diyar dibe, yan jî ronahîyek e ku weke kilê, çavan paqij dike û wan ji hev vedike. Dilperwer di vê meselê de pir di gumanê de mane, yan jî pîrrên dilperweran di vê meseleya yektahiya misoger yanî ya yekbûnê (wehdet el-wucûdê) de di şek û şubhê de mane. Lewra ev di nav sofîyan de meseleyeke bi gelş e û ji bo wê gelek cudahî di nav wan de çêbûne, hinek wê rast dibînin û wê diparêzin jî lê hinek jî tê de guman dikin.

*) Çendî şirovekar Zivingî û Seydayê Hejar bi peyvên "horîweş" û "padîşah" xwedê qest kirine û ji wê bonê ji nêrane nivîstine, lê min bi xwe ew məkane nivîsin, çiku dildara merivê mêr mebest jê çi dibe bira bibe li gor zimanê Kurdî divê məkane bê hesabkirin. Ji xwe ji risteyên ku li pey jî tê wisa tê zanîn.

Sererastkirin

Di hejmara Nûdemê ya 28an de ku hinek ji şiroveyê tê de hatibû weşandin çend şaşiyên hûrik çêbûne em di vê hejmarê de wan rast dikin û ji xwendevanan hêviya beşxandinê dikin:

1. Çendî ku du helbestên (qesîdeyên) cuda di hejmara 28an de hatine weşandin jî lê ji ber ku serîkê beşan ku şirovekarî di serê her helbestê de nivîsandîye ji holê rabûye, herdu bûne yak helbest; rastiya wê weha ye:

"Dîsa got şanê wî pîroz be!"

"Îsmê te ye mektûb-i di dîwanê qîdem da . . . " ra dawiyê; ku bi vê risteya jêrî diqede

"îksêrê xemê 'îşqê, ne dînar û dîrem da". Herweha peyva "îksîrê" jî bi şaşî bûye "ksîrê".

Bi vê risteyê re ev qesîde diqede duvre qesîdeya din dîsa weha dest pê dike

"Dîsa got şanê wî pîroz be!"


Meşşateê "husna ezêçengalê zulfan tabî da" ta dawiyê; ev helbest dikeve herdu rêzên binî yê rûpelê 100î.

2. Di rûpelê pêşî de di nav kevaneke de du peyvên çixêzkirî hatine jîbîrkirin; ew ji bo pîrsa maneya gotinekê bûn diviyabû ku piştî jê bihatinaderketin.

3. Di rûpelê 101ê de di paragrafa dawî de transikrîbeyê herfa lama (L) ya erebî şaş derketiye bûye mîna "v" yeke piçûk. Herweha di eynî rûpelî de di rêza pêncan de peyva "darekê" bûye "darekî*", rastiya wê "darekê î*" ye yanê reqema î û stêr li ber ji bo nîşandana jêrenotê ye lê mixabin hem stêr û hem jî reqema î bi gotinê ve zeliqîne û ew nota ku dê pê bihatina nîşanbidan bi şaşî bi ferhengokê re jê hatine avêtin.

4. Herweha di hejmara 27an de jî di pêşkêşkirinê de şaşîyeke çêbûye ku ew jî ev e: Navê "Mele Fethullahê Werqanîsî" bûye "Mele Ebdullahê Werqanîsî" lê rastiya wê "Mele Fethullahê Werqanîsî" ye.

Cirma mezin: AZADIYA FIKRÊ



BEDIRXAN EPÖZDEMİR

Azadiya fikrê ew e ku çî kes, çî sazî, çî dezgeh û civat di bin bandora tu qeyid û bendî de nemîne, pêrgî tu astengiyên neyê û bi hêsanî bikaribe dîtîn, nêrîn û baweriyên xwe, li ser babetên cûre-cûre, bi rengê azad, bi devkî û nivîskî bîne zimên.

Bî dîtina min, anîna zimên jî tenê bi serê xwe ne bes e. Divê fikir di mêjî û di nava du lêvan de nemîne. Sedem ku bê holê û bikaribe di nava jiyandê de rola xwe ya taybetî bilîze, çî encam pêwîst in bîne cih. Bêguman ev girêdayî civat û welatekî demokratîk û nûjen e. Li welat û sazîyên ku dîktatoran lê hukûm kirine, mirov rastî azadiya fikrê nayê. Dev ji azadiya fikrê berdîn, gotina azdiyê bi xwe qedexeyê. Mirov dikare bi kurtî bibêje, hebûn û tunebûna azadiya fikrê, bi hebûna demokrasiyê û nûjeniyê ve girêdayî ye.

Bêşansiya kurdan ew e ku yê ku welatên wan dagir kirine, hov û har in. Para xwe ji nûjenî û demokrasiyê nestandine. Kurd bê dewlet in, ji sazî û dezgehên demokratîk bêpar in. Li ba kurdan kevneşopiyên demokrasiyê pir jar in. Loma jî pir-

dengî, xweşdîtin û tolerans an kême, an jî qet tune. Êşa me ya girîng jî ji tunebûna wan tê.

Ez dikarim bibêjim ku heta niha kurd ne li hemberî hev, ne jî li hemberî neyaran negihîştine tama azadiya fikrê. Kurd ji dagirkeran wêdetir ji hev ditirsin. Bê guman sedemên sunî û tabîî yê wê tirsê hene. Êş be jî, jan be jî rastiya me li holê ye. Em azadî û demokrasiyê dixwazin û bi salan e ku em di wê rê de têdikoşin. Lê sed mixabin, em azadî û demokrasiyê ji hev re zehf dibînin. Wê demê jî mêjiyên nûjen û azad naxulîqin.

Descartes bi sedsalan berê gotiye "Difikirim, nexwe ez heme." Lê li welatên paşdemayî ev gotin bûye cirmekî mezin; "Difikirim, nexwe li min xin." Insan bi fikra xwe heye, insan bê fikir mirî ye. Divê azadiya fikrê xwedan erdem be, azadiya fikrê li ser erdemê bilind bibe.

Di warê edebî û siyasî de zimanê ku kurd li hemberî hev bi kar tînin, neynika rewşa me û welatê me ye. Paşvemayî, xizanî û nezanî em kambax kirine. Xerabkirin hêsan e, avakirin zehmet e. Ji berdêla ku em hevdu hemêz bikin, em hevdu dehf didin. Hesûdî, bexuzî, çavreşî li ba me zêde ye. Em hînî başî û delaliyên hev nebûne. Em lê digerin ka me çawa kêmasî û qulpekê ji hev re bibînin. Şik tune ye ku ev hemû taybetiyên civakên paşvemayî in. Gava rewş ev be, zimanê ku em li hemberî hev bi kar tînin jî, li gora wê şikil distîne. Em bi mûçingana li gotinan digerin da ku em pê hevdu piçûk bixin û bi şexsiyeta hev bilîzin.

Bi gelemperî li ba kurdan rexne û rexnegirî tune. Yan reşkirin heye yan jî me-tihkirin. Sifat, gotin û şîrat li gora dîtinên siyasî hatine dabêşkirin. Vê rewşê pêşî li zimanekî hevbeş girtiye. Vêca ku xetmeke siyasî li ser eniya te tunebe, bi gotina biraderên dimilî; halê to yamano.

Bê hêviya civateke hêsa û nûjen.

Bi hêviya azadbûna azadiya fikrê. □

Topa Mizîzexê

ABBAS ABBAS

Kovara Nûdemê, wek em dizanin di nav xwendevanên kurd de kovara herî pir rê xwendin û ya herî nas e. Ji sê mehan carekê em rûyê wê dibînin!... Loma jî, rebenên wek min, di vê demê de bi germî berbend in.

Hejmara 29an, ji sala 99an, ket nav destê min û min jî bi lez cihê xwe ji xwendina wê re xweş kir û wek zarokekî ku diyariyek bi nav destan bikeve, min kovar di nav destên xwe de quliband û ji nêvî ve ji hev vekir!..

Ez pêrgî navê nivîskarekî nû bûm, loma jî ez bi nivîsara wî re girêdayî mam û min ew bi kêfxweşî xwend. Bi rastî, ji destpêkê de kêfa min jê re hat, çimkî nave-rok li ser nivîskar Mehmed Uzun bû; ji ber di dilê min de jî hebû, ku ez rojekê berhemên birêz Uzun binirxînim!..

Birêz Mûrad Ciwan, nivîsa wî heya ber bi dawî jî bû, lê ne nexr û ne rexne li berhemên birêz Uzun dikir!.. Lê belê, kesîtiya nivîskêr bi xwe dabû ber çavan, ez jî wek xwendevanekî ji xwendevanên vê kovarê, min cihê vê gotinê ne di nav rûpelên wê de dît!.. Lewre jî, min nivîsara wî bi lez qedand, piştî ku min çend xetên dawî qurpandin, û paşê bi acizî devê kovarê girt!..

Ez ne qelûnkêş im, da di ser vê nivîsarê de, bi çixarekê kezeba xwe hênik û bêhna xwe fereh bikim!.. Loma jî, min dada deriyê oda xwe, ew girt û heya ji min hat qîr kir strana (Bavê Fexro) û tev û li hev da!.. Piştî ku min bêhna xwe li Bavê Fexriya fereh kir, ez careke dî li kovara xwe vegeyriyam!..

Vê carê, min kovar bi dilekî xweş ji nivîsara Firat Cewerî dest pê kir û min dizanî ku birêz Cewerî, ji bîranîn û serpêhatiyên kevin û şîretan pê ve li me nake, û hinceta wî jî, da me ji kel bihejîne!... Loma jî, tim ez ji naverokên nivîsarên wî re amade me. Lê di vê hijmarê de, birfna min, ya hîn tîr û hêwî tijî xwê kir!.. ku girtina serok Apo di rûpelên pêşî de, anîbû zimên.

Min lêkolîn li dûv helbestên xweş û şêrîn xwendin û ez di ser nivîsara birêz Ciwan re derbas bûm û rû bi rû, pêrgî navê nivîskar M. Uzun hatim!..

Di dilê xwe de, min got ku wê a niha birêz Uzun di vê lêkolînê de, bide diyarkirin bê çiqas birêz Ciwan şaş û neheqî kiriye. Lê mixabin, min nizanîbû ku wî berî me nivîsara birêz Ciwan xwendiyê û bersiva wê daye.

Ji destpêkê de, nivîskar M. Uzun ez hildam û di nav kuçe û kolanên gundê Mizîzexê de danîm û berberiya di navbera (Hevêrk û Dekşûriyan) de anî ber çavan!...(Hevêrk û Dekşûrî yek bavik in).

Dawî û li gor aqilê xwe, min got ku bi Xwedê, jinên van herdû kesan, baş hevûdin nas dikin!.. Û yek ji wan Hevêrkî ye û ya dî jî Dekşûrî ye!... Ma naxwe, heger ne av sedeme be, wê çî sedemên dî hebin ku bihêlin nivîskarê romana kurdî, çil û du caran di vê nivîsara ha ku ji sê rûpelan pêkhatiyê, navê Generalê Bênefer, bîne zimên!..

Li vir, ez bi xwe jî ne ew rexnegir im, da ji birêz Ciwan re, rêya rexngeriye bidim xwiyakirin!... Lê ez xwendevan im, xwendevanê romana kurdî û yê vê kovarê jî me, lewre dibînim ku ji mafê min e, ez rexnê li M. Uzun jî bikim, da ku sînga wî ji me re, ji halo ferehtir be!.. Û wilo, ez li berpirsiyarê vê kovarê jî dikim, da ev kovara me bimîne kovara hunerî, edebî û çandî, nebe topek ji topên Mizîzexê!..Wek ku van herdu Generalan xwest lê bikin. □

14-4-99 Aachen-Almaniye

Hustuyê devê û rastiya Mehmed Uzunî

Ji devê pirsîne ku "çima hustuyê te xwar e".
Devê bersîv daye: "ma ku dera min rast e ku.."

Gotineka bav û kalan



MÛRAD CIWAN

Yên ku hejmara berê ya Nûdemê (No:29) xwendibin, wê bibîr bînin ku nivîseka min li ser hin axaftinên Mehmed Uzunî ên li ser ziman û edebiyata kurdî derketibû. Nivîsa min li ser hin tashîtên programeka kanaleka televîzyona swêdî bû ku Mehmed Uzun jî tê de beşdar bû. Di wê programê de wî îdîa dikir ku berî ew romanên xwe binivîse zimanekî edebî yê kurdî, romana kurdî tunebû. Wî dengbêjên kurdan ji xwe re kiribûn bingeh û bi romanên xwe zimanekî kurdî yê edebî afirandibû. Min ev îdîa rexne dikir. Min rexne li Yaşar Kemalî jî dikir ku bêyî karibe bi kurdî bixwîne û binivîse îdîa kiribû ku herçî romanên kurdî yên berê hatibûn nivîsîn, ne roman lê miswede ne, romana kurdî bi Mehmed Uzunî dest pê kiriye. Mehmed Uzunî her di eynî hejmarê de xwedêgiravî bersîva nivîsa min da.

Min ê ev nivîs nenivîsiya heke ne ji ber du sedeman bûya ku bi wê nivîsa Mehmed Uzunî re rû dan.

Yek jê, nivîsiye ku wî di wê programê de îdfayên bi wî awayî nekirine. Gava li ser buyereka rûdayî du îdfayên dijê hev hebin, a baş ew e meriv biçe serî li rûdane bide, îdfayên dijê hev bide ber wê, da xwendevan bi xwe bibînin bê ka kîjan rast e. Heke *Nûdemê* ev yek di hejmara borî de kiribûya belkî min îhtiyaciya nivîseka wiha nedîtaya. Lê xwiya ye wê ev îmkan bi dest nexistiye. Bi vê nivîsê re ez ê wan xalên ku îdfâ li ser wan hene hem bi swêdî, hem jî bi kurdîya wan raxim ber çavên xwendevanan da ew bi xwe biryarê bidin.

Sedemekî din ê ku ez mecbûrê vê nivîsê kirim ew e ku Mehmed Uzun ji dêlva bersiva îdfayên min bide, li ser şexsiyeta min û kar û barên min hin zimandirêjî kirine ku tu têkiliya wan bi wê nivîsa min re nînin. Di nava wan îdfayan de gellek buhtanên bêbingeh jî li pey hev rêz bûne. Helbet ez tenezula muxatabiya zimandirêjîyan nakim, terbiye û têgihîştina min rê nade ku ez xwe li tiştên şexsî û buhtanan deynim. Lê min divê ez li ser çend xalan rawestim da xwendevan bibînin ku îdfayên wî çend ji rastî û durustiyê bêpar in.

"Afirînerê zimanê edebî"

Berê, ez ê bi îdfayên xwe û wî yên li ser programa televîzyonê dest pê bikim. Çimkî mijara esasî ew e, yên din talî ne. Mehmed Uzun dinivîse ku wî di programê de hew behsa "afirandina zimanekî romanê ji zimanekî qedexekirî" kiriye û wiha didomîne, "Mebest bi zimanê qedexekirî, zimanê kurdî ye. Mebest bi zimanê romanê, zimanê romanên min e." Li cihekî din ê nivîsa xwe jî wiha dinivîse "... di edebiyatê de jî zimanê şihîrê, romanê, piyesê, ceribandî û hwd. hene" û lê zêde dike "Ez dubare bikim, zimanê ku ez qal dikim, zimanê romanê ye û ne zimanê romanên hin kesên din, zimanê romanên min." Ew mesela înkarkirina berhemên edebî yên beriya xwe jî red dike.

Madem wiha ye, başe ku ez li vê derê wan axaftinên wî û yên pêşkêşkera televîzyonê him bi swêdî him jî bi kurdî li ber çavan raxim. Wê çaxê diyar dibe bê kî rast dibêje. Eslê axaftinan yên bi swêdî di jêrenotan de ne. Pêşkêşkera programê bi wî awayî dest bi bernamêya xwe dike: "Ya balkêştirin ew e ku berê roman bi kurdî nehatine nivîsîn. Helbet kurdan ji dewrên berê yên kevntirîn de çîrok gotin, xwe îfade kirin. Lê di stiran û helbestan de, ne di forma romanê de. Mehmed Uzun li vê derê, li Swêdê zimanekî nesrêr yê kurdî afirand. Mehmed te awayekî bikaranîna zimanekî peşxanê îcad kir!"²

Piştî vê pêşkêşkirinê, Mehmed Uzun, behsa hatina xwe ya Swêdê, têkiliyên xwe

yên bi nivîskaran re, endametiya xwe ya PENê dike û wiha dibêje: “Wê gavê xelkê ji min pirsî ku gello tu edebiyateka modern a kurdî heye, gello tu romaneka modern a kurdî heye. Û bi rastî jî tunebû.”³

Pêşkêşkera programê jê dipirse: “Gotineka ku car bi car di berhema te ya ceribandinan de berpêştê ‘dengbêj’ e, ew gerokên stiranbêj, çîrokbêj. Ew ên ku bi awayekî ji bo kurdan wekî bîrekê (hafizayekê) ne. Bi çi awayî tu îlhamê ji wan werdigirî?”⁴

Mehmed Uzun, wiha bersivê dide: “Ez di dorhêleka kurd de hatime dinyayê û mezin bûme. Ji bo ku ziman qedexekirî bû, yê ku mîrasê kulturî bi xwe re hildigirtin adetên devkî bûn. Ez di nava vê de hatime dinyayê û mezin bûme. Ev bi xurtî di bîra min de ye. Pişt re gava min ê ji bo vî zimanê qedexekirî zimanekî romanê biafirandaya û ava bikiraya, wê gavê çavkanî ji min re lazim bûn da ez bikaribim zimên biafirînim. Û ev dengbêj belkî jî çavkaniyên herî mezin bûn ji bo min. Gava min dest bi nivîsînê kir, li pêşberî min ferhengek jî tunebû, li pêşberî min romanek jî tunebû. Ez mecbûr bûm ku zimanekî biafirînim, zimanekî modern ê edebî. Wê gavê yê ku alîkariya min kirin dengbêj bûn.”⁵

Li ser vê axaftina wî, pêşkêşkera programê vedigere ser beşdarekî din ê programê û dipirse: “Olle Hessler, tu nivîskar, rexnegir û wergêr î. Gava tu vê çîroka têkoşîna Mehmed Uzunî ya bi zimên re, ya afirandina zimanekî dibihîzî, çi ramanên te li ser zimanê te hene?”⁶

Olle Hessler, wiha bersivê dide: “Gava li ser riya hatina vir a di teyarê de îmkana rûniştina bi Mehmedî re çê bû, em piçekî li ser afirandina zimanekî ya ji zimanekî qedexekirî jî rawestiyay. Guftûgoyeka bi vî awayî heyatî ye.”⁷

Piştî vê pêşkêşkirinê, Olle Hessler tê ser pirsê zimanê swêdî, li ser wan tesîrên hûr û gir ên ku ziman kiz dikin radiweste. Bi pirsên pêşkêşkerê, bi bersivên wî û yê Olle Hesslerî baş diyar dibin ku mijar ne mijara zimanê romanên wî, lê ya afirandina zimanên edebî ye û ew, di îdfaya afirandina zimanekî edebî yê kurdî de ye. Ji xwe romanên wî bi swêdî neweşiyane, swêdî wê çawa karibin li ser zimanê romanên wî biaxivin?

Di programê de hin hevpeyvînên ji Kurdistanê jî hene ku diyar e Mehmed Uzunî ew ji welêt anîne, dane pêşkêşkera programê da biweşîne. Di wir de xortek wiha dibêje: “Zimanê kurdî ev 70 sal in ji bal rejima heyî tê înkarkirin û wekî encama zimanên cuda tê pêşkêşkirin. Lê heqîqeta rojê çawa eşkere ye, ew qas diyar e ku Mehmed Uzun wekî veafirîner û avakerê zimanekî heyî, gellek tiştan dide me, ew zimanekî nuh diafirîne. Di gotarên xwe de, di romanên xwe de, bi riya roman-

nivîsînê ya ku karekî gellek dijwar e, ew di çarçewa dinyayê de zimanekî ji nuh ve ava dike ku hê devkî ye, derbasî nivîsînê nebûye.”⁸

Balkêşe ku Mehmed Uzun xwedî li gotinên xwe dernakeve. Heke baweriya meriv bi tişteki tê û meriv pê radibe, divê ew cesareta medenî bi meriv re hebe ku xwedî li gotina xwe derkeve. Esas îdîaya wî ya ku xwe wekî afirînerê zimanê edebî yê kurdî dibîne, ne carekê tenê û ne bes di televizyona swêdiyan de hatiye zimên. Berî wê, li Tirkiyê gava Nilüfer Kuyaşê di rojnameya tirkî Milliyetê de pê re hevpeyivînekê dike, ew li wê derê jî bi vê îdîayê radibe. Mehmed Uzun wiha dibêje: “Ez bi salan li gundên kurdan ên li Sûriyê digeriyam û min guh dida wan dengbêjan, her tiştê ku ji bo avakirina zimanekî edebî yê kurdî ji min re lazim bibe min derdixist.”⁹

Kî zane bê Mehmed Uzun di heqê “xebata xwe ya li ser ziman û edebiyata kurdî” de ji Nilüfer Kuyaşê re çî gotiye ku ew jiyana Mehmed Uzunî dişibîne ya Celadet Alî Bedirxanî û wiha dinivîse: “...

Pişt re barkirina ji bo Swêdê. Li Unîversîteya Stockholmê zimannasî (dilbilim), li Sorbonê hînbûna ziman û edebiyata Fransî; endametiya komîta giştî ya Yekîtiya Nivîskarên Swêdê; her wekî qehremanê *Bîra Qederê* (qesd jê Celadet Alî Bedirxan e M. C.) li sirgûnê jiyaneka ku li ziman û edebiyatê hatiye hesirkirin (gelo nizanîm xebata wî ya li ser ziman û dîplomeya ku ji Sorbonê girtiye çî ye? M.C.)”¹⁰

Nilüfer Kuyaş wiha berdeyam dike di Milliyetê de: “Lê Mehmed Uzun dibêje ku ew van hemuyan ne ku bi bîr û baweriyeka milletperwerî dike. Heta li gor beyana wî heke kurdî ji qewlî wî ve ew qas ne di bin tehdîdê de be, wê li Swêdê rûnenê û teşebbusî “dînîti”yeka wiha ya afirandina zimanekî kurdî yê roman û edebiyatê neke.”¹¹

Hetta li gora Nilüfer Kuyaşê, Mehmed Uzun bi vê yekê tenê nemaye, gotiye ku ew hemî van karan, li Swêdê bi tena serê xwe dike. Wiha dinivîse Nilüfer Kuyaş: “Di wê muhaweleya wî ya îroyîn de ya ku dibêje ‘Ez bi tena serê xwe muhaweleya dikim ku zimanê romana kurdî, yê edebiyata kurdî ava bikim’ wekî çavkanî roleka mezin a destan û efsaneyan heye.”¹²

Eşkere ye ku Mehmed Uzun bi van axaftin û tesbîtên xwe ne di wê muhawelê de ye ku behsa zimanê romanên xwe bike, lê ew bi devê xwe û bi kombînezyonên li dora şexsê xwe avakirî, derewekê bi her wesîleyê belav dike ku berî romanên wî, berî xebatên wî yê “li ser ziman û edebiyata kurdî” tu romanên kurdî tunebûn, zimanekî edebî yê kurdî tunebû, wî zimanê edebî yê kurdî, zimanê romana kurdî afirand.

Romanên Uzunî

Di vê îdîayê de yê ku wî ji xwe re kiriye palpişteki mezin Yaşar Kemal e. Li ser gotina Mehmed Uzunî, tevî ku Yaşar Kemal xwendin û nivîsandina kurdî nizane jî li ser romanên wî û yê kurdên din wiha dibêje: “Xizmeteka gellek mezin a edebiyata Mehmedî li zimanê kurdî bû. Wî heta niha şeşroman nivîsîn. Hemû jî bi kurdî nivîsîn. Mehmed Uzun ew însan e ku romana modern a kurdî ya herî pêşîn nivîsiye. Û di dema me de jî di roja me de jî yek ji wan kesan e ku romanên herî baş dinivîsin Yanî romanên modern ên Mehmed Uzunî di sewiya bilind de ne û ew roman in ku bi kurdî hatine nivîsîn. Ez vê yekê xizmeta herî mezin a ji kutlura tirkî re hesab dikim. Wî li Tirkiyê, romanên xwe hem bi tirkî hem jî bi kurdî weşandin û çî gelê tirk be çî jî gelê kurd be ji van romanên hez kir. Romanên Mehmed Uzunî heke ez nikaribim bibêjim rekorên firotinê şikandin jî xwe gîhandin kutleyeka gellek mezin a xwendevanan. Kurdî zimanekî gelleki dewlemend e, her weki ku tirkî jî welê ye. Heta niha romanên modern ên kurdî nehatin nivîsîn. Li dinyayê jî, yanî li Îraqê, li Îranê, li Sûriyê û li Yekîtiya Sovyetan romanên modern nehatin nivîsîn. Berî Mehmedî, di vî zimanî de yek du muswedên romanên hene. Ev ne roman in.”¹³

Gava meriv bala xwe dide nivîsarên Mehmed Uzunî, yan hevpeyvînên li gel wî kirî ku bi swêdî an tirkî ne, yanî yê ku xîtabî xerîban dikin, fikreka wiha rasterast bi meriv re peyda dibe ku berî romanên Mehmed Uzunî tenê dengbêj û çîrokbêjên kurdan hebûn. Wî ew ji xwe re kirin çavkanî û îlham û bi romanên xwe, zimanê edebî yê kurdî afirand. Ew, hemû wê qonaxa edebî ya bi kêmasî beriya 1000 salan dest pê kiriye, wê qonaxa zimanê peşanê, ya rojnamevaniyê, ya çîroka kurdî yê ku qirnekî berê, ya romana kurdî ku ev sê çarîk sedsal in dest pê kirine înkâr dike. Ew, wê xebata qirnekî ya li Kurdistanê Îraqê, ya li Kurdistanê Sûriyê, pişt re ya li Kurdistanê Îranê û hela hela ya kurdên Sovyeta kevn ku damezrênerê romana kurdî hê beriya ku Mehmed Uzun ji diya xwe bibe li wê derê serî hilda, hîç û pûç dike. Bi ya wî, gava wî dest bi romannivîsiyê kir ne ferheng ne jî romaneka kurdî hebû ku ew karibe ji xwe re bike bingeh, tenê çîrok û stranên dengbêjan bûn.

Lê weki ku di Armançê de (hejmar 142; Îlona 1993-yê) di wextê xwe de hat eşke-rekirin, gava wî romana xwe ya pêşîn a bi navê “TU” nivîsî li ber wî ne stranên dengbêjan lê “Hawar” a Celadet Alî Bedirxanî, “Ronahî” ya Dr. Kamuran Bedirxanî û hin berhemên wan ên din hebûn ku wî paragraf bi paragraf ji wan girt û xist romana xwe. Wî, wê gavê dengbêj nas nedikirin, pişt re çû Sûriyê, ba Rewşen Bedir-

xan Xanimê; jina Mîr Celadet Alî Bedirxanî. Wê ew tekst, foto û belgeyên ku ji bal Celadet Alî Bedirxanî ve hatibûn civandin, yê ji devê dengbêjan hatibûn berhev- kirin, kovarên ku di dehsalên sih û çilî de di bin serokatiya Celadet Alî Bedirxanî û Kamiran Alî Bedirxanî de hatibûn weşandin, gellek berhemên wan ên din ên çap- bûyî û çapnebûyî dane wî. Qewl wiha bû ku wî yê ev berhem amade bikirana û bi- weşandana, xebatên wan çîlekêşên kurdan derxistina ronahiyê. Lê wî, ew berhem hemî anîn, li ser wan rûnişt, ji romanên xwe yê bi navê “Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê” û “Bîra Qederê” re kirin hevîr. Îro şahid û belge hene ku Rewşen Bedir- xan Xanimê heta ku mir ji Mehmed Uzun efû nekir.

Dibe ku gava wî dest bi nivîskariyê kir, ne ferheng, ne jî romaneka kurdî li ber wî hebû. Lê ev ne delîl e ku kurd ji roman û ferhengan, ji zimanekî edebî bêpar bûn. Ev delîlê wê yekê ye ku Mehmed Uzunî hay ji roman û edebiyata kurdî ne- bû. Helbet ev rebeniyek e ku gava yek biryara romannivîsiyê dide hay ji edebiyata xwe nebe. Heke meriv trajediya kurdan li ber çav bigre, meriv belkî rebeniya wî fahm bike. Lê ji dêlva ku bêje “min hay ji kultur û edebiyata milletê xwe nebû” ra- dibe li her derê belav dike ku kurd ji romanê, ji zimanekî edebî yê nivîskî û ji nivîs- karan bêpar bûn. Ev yek nayê fahmkirin. Ji vê re dibêjin uzrê ji qebahetê mestir.

Di dema destpêka nivîskariya xwe de, wî hay ji berhemên kurdan nebû, lê îro te- vî ku hay ji wan heye jî wan înkâr dike. Di nivîsa xwe ya xwedêgiravî bersîva nivîsa min de jî daxwazê dike ku ka romanên berî romanên wî çi ne em binav bikin. Xwiya ye Mehmed Uzunî naveroka nivîsa xwe ya bi navê “Edebiyata Kurdî” ya li destpêka Antolojiya Edebiyata Kurdî jibîr kiriye, ez wê bi bîrê dixim. Di wir de ne pir tekûz û berfireh be jî wî nivîsiye ku romana kurdî kengî hatiye nivîsîn, kî dane- rê romana kurdî ye û heta bigihê wî çend romanên kurdî hatine nivîsîn. Ji wê jî gi- rîngtir van demên dawiyê nivîseka hêja ya Dr. Nacî Kutlay a bi navê “Romana Kurdî” di Warê (Havîn-Payîz 1998) de weşiya. Ew dikare wê nivîsê bixwîne û pişt re berê xwe bide mirêkekê bê ka ruyê wî sor dibe yan na.

Destpêka romana kurdî

Ez li vê derê helbet ne di wê îdîayê de me ku edebiyateka xurt a kurdî heye, bi he- zaran romanên kurdî çap bûne. Her kes jî dizane ku milletê kurd di vî warî de gel- lekî feqîr e. Lê ya ku ez li pê me, diviyayiya înkarnekirina mîrasê xwe yê heyî, wefa- dariya li hemberê xebatkarên çîlekêşên kultur û edebiyata xwe ye.

Pişt re rastî çi ye divê meriv wê bibêje. Gava Mehmed Uzunî dest bi romanê kir

romanên kurdî hebûn. Avakerê romana kurdî jî ne Mehmed Uzun lê nivîskarekî kurd ê din e. Ez ê li vê derê nivîsa Dr. Naci Kutlay esas bigrim û ji bo xwendevanan çend nimûneyan bidim. Romana kurdî ya pêşîn di sala 1935-ê de (di çavkaniyekê de di 1930-î de. Binêre; Azadî şêrîn, "Romana jiyana kurdewarî û berxwedanê 'Dimdim'", Hêvî, Îstanbul, 10-16 nîsan 1999) berî romana Uzunî bi 55 salan ji bal Erebe şemo ve hatiye nivîsîn. Navê wê *Şivanê Kurd* e. Danerê romana kurdî jî *Ereb Şemo* ye. Wî çar roman nivîsîne. Wekî me got, ya pêşîn *Şivanê Kurd* bû. Pişt re *Jiyana Bextewer*, di 1959-ê de, *Dimdim* di 1966-ê de û *Hopo* di 1969-ê de hatin weşandin.



Li gora M. Ciwan, Mehmed Uzun hem yên berî xwe hem jî hevdemên xwe inkar dike.

Şivanê Kurd di sala 1977-ê de li Kurdistanê Tirkîyê ji bal Weşanên Özgürlük Yoluyê û *Dimdim* di 1983-ê de li Stockholmê, yanî salekê beriya romana pêşîn a Mehmed Uzunî li ber pozê wî hat weşandin. Romanên Erebe Şemo, cara pêşîn bi kurmanciya kurdên Sovyetê hatin weşandin. Ew bi zimanê xwe, di standardê bilind ê edebiyata kurdên Sovyeta berê de ne, bi teknîk û hunera xwe jî li ser standardên romana realîstiya sosyal de ne û di ser romanên Mehmed Uzunî re ne. Loma jî bi her aliyên xwe nivîskarê wan layiq e ku danerê romana kurdî bê qebûlîkirin û welê jî tê qebûlîkirin. Eliyê Evdirrehman romana xwe ya bi navê *Xatê Xanim* di 1958-ê de, *Gundê Mêrxasa* di 1968-ê de û *Şer Çiya da* di 1989-ê de da weşandin. Romana Heciyê Cindî ya bi navê *Hewarî* di sala 1967-ê de hat weşandin. Romana Seîdê Îbo ya bi navê *Kurdên Rêwî* di 1981-ê de, ya Egîdê Xudo ya bi navê *Dê û Damarî* di 1986-ê de hatin weşandin. Îbrahîm Ahmed di 1956-ê de dest bi nivîsîna romana xwe ya bi navê *Janî Gel* kir, ew di 1972-yê de ket nava kutubxaneyê edebiyata kurdî. Romana Rehîmê Qazî ya bi navê *Pêşmerge* di 1961-ê de hat nivîsîn (Antolojiya Edebiyata Kurdî). Kurdiya romana Bavê Nazê ya ku cara pêşîn li Sovyetê bi

rûsî hat weşandin di 1989-ê de li Stockholmê çap bû. Romana wî ya duduyê ya bi navê *Stockholmê Te Çi Dîtiye Bêje* di 1987-ê de hat weşandin. Qasî ku Dr. Nacî Kutlay dinivîse Huseyîn Arif romana bi navê *Şar* û Mihemmed Mukrî ya bi navê Heres li Kurdistanê Iraqê weşandin. Romana Mahmûd Baksî ya bi navê *Hêlîn* di 1984-ê de, ya bi navê *Gundikê Dono* di 1988-ê de li Stockholmê hatin weşandin. *Zeviyê Soro* ya Dr. Nacî Kutlayî di 1987-ê de li Stockholmê derçû. Ev hemî romanên kurdî ne ku beriya romanên Mehmed Uzun û di dema yên wî de xizmeta geşbûna zimanê edebî yê kurdî kirin. Destana *Memê Alan* a dewlemend di 1978-ê de li Tirkîyê hate weşandin ku weka romanekê bi hunerê xwe yê edebî bilind û dewlemend e. Li her çar perçên Kurdistanê ji bal kurdên Sovyeta kevn ve û li Awrûpayê bi taybetî jî li Swêdê, di van deman de bi sedan berhemên din ên edebî yên wekî kurteçîrok, helbest û wergerên curbecur hatin weşandin.

Rola Swêdê di edebiyata kurdî de

Gava min di nivîsa xwe ya hejmarê berê ya *Nûdem* de hin navên nivîskarên kurdan ku li Swêdê dijîn û berî Mehmed Uzunî an di dema wî de dest bi xebata edebî kirine wî, di nivîsa xwe ya bersîvê de, bi riyakariyeka mezin pesnê wan nivîskaran da û nivîsî ku qedr û qîmeteka mezin dide wan û xebat û berhemên wan. Lê ew di vê peyva xwe de ne samîmî bû, heke samîmî bûya di Milliyetê de nedigot ku ew li Swêdê bi tena serê xwe mihawele dike ku zimanê romana kurdî, yê edebiyata kurdî ava bike. Ew bi vê gotinê jî nemaye, ka bala xwe bidinê bê li ser rewşa kurdên Swêdê û nivîskaran çî cewheran dirêje: "Ez tim li sirgûnê me. Ji ber zimanê ku ez pê dinivîsim ez li sirgûnê me. Ez li nav kurdan jî li sirgûnê me. Çimkî ez tenê me. Romannivîsên din nînin, nivîskar, rexnegir nînin. Tu dezge an kanal nîn in ku jiyane-ka edebî ya zindî pêk bînin."¹⁴

Gelo tu para rastiye di van îdiayên Mehmed Uzunî de heye, gelo bi rastî jî li Swêdê her tişt miriye? Li gora lêkolînekê ku ji bal Mahmûd Lewendî ve hatiye kirin, di navbera 1980-1998-ê de, li Swêdê, li ser hev 820 kitêb, 138 kovar û rojname derketine, 24 weşanxaneyên resmî hatine danîn. Li ser navê van weşanxaneyan 585 kitêb derketine. Kitêbên kurdî (kurmancî, soranî, dimilî) 420 heb in. Di 1989-ê de Yekitiya Nivîskarên Kurd bi endametiya 38 nivîskaran hat damezirandin. Piştî re gava Komeleya Nivîskarên Kurd hat avakirin, nêzîki 50 endamên wê hebûn ku nivîskarên kurd ên soranîxêv ne di nava vê hejmarê de ne. Federasyoneka komeleyên Kurdistanî her jekê li bajarekî ji 34 komeleyan pêk tê. Ji dervayî komeleyên fe-

derasyonê ji yên wê ne kêmtir komeleyên cur be cur ên kurdistanî hene. Li Stockholmê weqif, kutubxane û enstîtuya kurdan her yekê li gora xwe xebatekê dike. Swêd li ser ruyê erdê yek ji wan waran e ku xebata edebî, kulturî, dîrokî û ziman-nasî ya kurdî, bi taybetî piştî salên 80-yan lê gurr û geş bû. Beriya her derê li wê derê zarokên kurdan îmkân dîtî ku bi zimanê xwe hîn bibin. Li Unîversîteya Stockholmê beşê kurdî yê mamosteyên kurdî (1984) hat avakirin, di wir de ji bo zarokên kurdan mamoste hatin gîhandin.

Li Uppsalayê li unîversîteyê kurdî tê xwendin. Xebata edebiyat û zimanê kurdî di dereceyeka wiha de pêşde diçe ku kurdnasên weka Joyce Blau û Martin van Bruinessen behsa ronesansa zimanê kurdî ya li ser bizava kurdên Swêdê kirin. De îcar Mehmed Uzun bi kîjan aqil û çi însafê dibêje ku li Swêdê "romannivîsên din nînin, nivîskar, rexnegir nînin. Tu dezge an kanal nîn in ku jiyaneke edebî ya zindî pêk bînin"

Nexweşiya ku Mehmed Uzun di xebata ji bo ziman û edebiyata kurdî de yê pêşîn e û bi tenê ye hema hema li her derê bi wî re ye. Di sala 1995-ê de piştî ronahî-dîtina Antolojîya Edebiyata Kurdî, di rojnameyeka swêdî ya bi navê Dagens Nyheter de hevpeyvînek bi Mehmed Uzunî re hat kirin, li wê derê jî wî îdîa dikir ku ew dîroknasê herî pêşîn ê edebiyata kurdî ye, wî edebiyata kurdî ji tarîtiyê xelas kiriye. (DN 3. 10. 1995) Di hevpeyvînê de ya girîng ji bo Mehmed Uzunî ne ew e ku edebiyata kurdî tune bide nasandin, ya girîng ew e ku bêje heta niha kesî dernexistiye meydanê, dokumante nekiriye, cara pêşîn wî daye naskirin, ew, dîroknasê edebiyata kurdî yê pêşîn e. Loma jî hevpeyvîna li ser wî esasî daye avakirin. Pişt re Ferhad Shakely her di wê rojnameyê de (DN 12. 10. 1995) rexne lê girt, di bersîva xwe de (DN 13. 10. 1995) Mehmed Uzunî çiv dan xwe û gunehkariya ku xwe wekî yeke-mîn dîroknasê edebiyata kurdî lanse dike xist hustiyê amadekerê hevpeyvîne yê swêdî.

Yên ku *Antolojîya Edebiyata Kurdî* dîtîbin dizanin ku ew ji bilî Mehmed Uzunî bi beşdarbûna 32 nivîskar û lêkolerên kurd ên din amade buye. Lê di hejmara *Nûdemê* ya berê de xwedêgiravî gava ew behsa wê yekê dike ku çî qas di xizmeta nasandina nivîskarên kurd de ye, ew wê Antolojîyê dike tenê ya xwe, wan 32 nivîskarên wê antolojîyê bincil dike û wiha dinivîse:

"Di salên 1980-yan de, di rûpelên *Kurdistan Press*ê de, min li ser van hevalan(qesda wî nivîskarên kurd e) xebat û berhemên wan gellek tişt nivîsîne, ew dane nasîn, bi dû re jî di kitaba "Antolojîya Edebiyata Kurdî" de, ku ji du cildan tê pê, ew, yek bi yek û bi firehî, tevî danasîn û berhemên wan, pêşkêşî xwendevanên kur-

dên Tirkîyê kirine.” Ev yek ne tenê di wê nivîsê de hatiye zimên, li her derê gava listeya berhemên Mehmed Uzunî dertê ev berhem tik û tenha bi navê wî re tê pêşkêşkirin. Ne ku navê wan nayê dayîn behsa wê yekê nayê kirin ku bi amadekariya wan jî hatiye afirandin.

Nivîskariya Uzunî ya swêdî

Di nivîsa xwe ya hejmara berê de, min bal kişandibû ser wê yekê ku heta niha her çendî berhemeka Mehmed Uzunî jî bi swêdî nehatibe nivîsîn wî xwe nivîskarekî swêdî îlan kiriye. Ew vê yekê jî înkâr û tahrîf dike:

“Ez di programê de dibêjim ‘jag upplever mig som en svensk författare också...’ (bi swêdî)

Bi kurdî; ez xwe mîna nivîskarekî swêdîjî hîs dikim.”

Rast nanivîse. Ka bala xwe bidinê bê dibêje çî.

Pêşkêşkera programê jê dipirse:

“Gelo hîç toneka swêdî di awayê te yê nivîsîna bi kurdî de heye?”

Uzun bersivê dide: “Ez xwe di dereceya mezintirîn de nivîskarekî swêdî hîs dikim. Tevî ku ez romanên bi swêdî nanivîsim, tevî ku min hê dest pê nekiriye tecrubeyên xwe yên li Swêdê nenivîsîne. Lê helbet ez nivîskarekî swêdî me. Û ez vê yekê li Tirkîyê jî dibêjim.”¹⁵ Ka di vê îdîayê de “ez xwe mîna nivîskarekî swêdî jî hîs dikim” di ku de ye? Mehmed Uzun e, xwe çî hîs bike dike. Lê tenê bi hîskirinê meriv nabe nivîskarê milletekî. Ji bo meriv nivîskarê milletekî bê hesibandinê divê kêmtirîn meriv bi zimanê wî milletî berhemê dabîn. Ma ew nafikire ku swêdî çima Theodor Khalifatidesê yunanî nivîskarekî swêdî dihesibînin û wî na?!

Zimandirêjiya li ser şexsê min

Her çendî Mehmed Uzun xwe nivîskarê swêdî hîs dike jî, bi rabûnê rûniştinê û muameleya xwe, xwe dide dest ku ew gellekî ji cesareta medenî û durustuya entelektuelîya nivîskarên swêdî dûr e û pirtir nêzî exlaqê pîrîniya siyasetmedarên tirkî e. Meşhûr e di kar û barên xwe de, siyasetmedarên tirkî, gellek bi hêsanî xwe ji rastî û durustuyê dûr dixin, di pêşveçûna xwe de, ji bo rê li ber xwe vekin, karin mafên gellekan bixwin, keda gellekan înkâr bikin û buhtana li gellekan bikin. Lê gava meriv behsa vê nelirêtiya wan bike, ji dêlva ku bersîva meriv bidin, bi cîrcîreka mezin radîbin pêdarê, bi nutqên “weten, millet û Sakarya” sînga xwe dikutin ku goya ji bo welat, millet û xelkê xwe çî fedakariyê dikin. Di cîyê çî de meriv “xa-

yin” îlan dikin. Mehmed Uzunî jî ji dêlva ku bersîva min bide buhtan li ser şexsê min kirine, xwestiye xebata ku ez dikim reş bike, heta mesele biriye bi êsîrgirtina Abdullah Öcalanî û yekîtiya millet ve girêdaye, tu nemaye îdîa bike ku di dewreka wiha de ku roj roja yekbûnê ye ez fitne û fesadiyê dixim nava milletî.

Herçî mesela reşkirina xebata min a li ser zimên, dîrok, edebiyat û pirsên civaka kurdan e ez hêjayî bersîvdanê nabînim. Ew xebatên ku ez dikim, berhemên ku ez didim li gora qenaeta xwe ya şexsî ez wan bikêr û hêja dibînim, loma jî pêşkêşî xwendevanan dikim. Xwendevanên kurd wan hêja dibînin, nabînin îdî ew, teqdîra wan e, yên ku bibînin wê bibînin, yên ku nebînin jî wê nebînin. Ji vê tebîttir jî tu tişt tune. Lê ez baş dizanim ku hêjayiya xebatên min, bi her awayî di seriya hedd û hidûdên teqdîrkirina wî Mehmed Uzunî re ne, yê ku di lehzeyekê de dikare bi dehan rûmetên însanî û exlaqî binpê bike.

Di nivîsa wî de hin tehrîfat jî hene ku tenê bi şexsê min namînin, herçî bi nav nekiribe jî heqaretê dibin digihînin hin nivîskar û lêkolerên me yên rûmetbilind jî. Min divê ez bersîva wan tehrîfatên wî bidim.

Ew wiha dinivîse “Mirad Ciwan û girûba wî ne niha, ji panzdeh salan û vir ve ye ku li dijî min, bi xurtî, dinivîsin, dipeyivin, dixebitin.” Yek ji van îdîayên di vê cumleyê de jî ne rast in, xwe ji Xwedê û heqaniyetê dikin. Carekê ev heşt sal in, min dev ji xebata siyasî ya aktîf berdaye, ez ne di tu grûb û partiyên siyasî de kar dikim, ne jî grûba min heye. Min bixwe heta niha bes carekê li ser wî nivîsiye, ew jî di hejmara berê ya *Nûdemê* de ye. Dewreka ne kin min berpîrsiyariya rojnameya *Armancê* kir. Di wê dewrê de nivîseka bi navê “Mehmed Uzun û çîroka diziya “Tu”, li ser romana Mehmed Uzunî ya pêşîn a bi navê TU derket ku wê romanê çawa paragraf bi paragraf ji *Hawarê* metin neqlê nava rûpelên xwe kirine. Ew îdîa jî rastiyeke bû. Mehmed Uzun keda hinên din bi dizî anîbû xistibî nava keda xwe û wekî ya xwe nîşan dida, kî bûya diviya ev rastî eşkere bikiraya. Berê nexwest vê yekê qebûl bike, wekî niha, got ku “Armanc bela xwe di min dide”, pişt re bi awayekî nedurust di kitêba xwe de ya bi navê *Hêz û Bedewiya Pênûsê* ev şêlandin îtîraf kir. Derketina wê nivîsê di *Armancê* de, nayê maneya ku min 15 salan dijîminatiya Mehmed Uzunî kiriye. Bi eksê wê, gellek tiştên din hebûne ku meriv li ser xebata wî binivîse lê me îhmal kirine. Pişt re *Armanc* qet ne dijîminê wî bû, heta demekê quncikek jî wî re veqetand wî tê de nivîsî.

Wan kesên ku li ser Mehmed Uzunî nivîsîne; min û hinên ji wan me di demên berê de hevaltiya siyasî kiriye. Îro, ne ew, ne jî ez, em aktîf ne di siyasetan de, ne jî di grûban de ne. Lê em hîn jî hevalên hev ên şexsî ne û hevaltiya bi wan re jî bo

min serbilindiyek e. Ne ku ev 15 sal in dijminatîya Mehmed Uzunî dikin , lê carekê du caran li ser şaşî û xerabiyên wî nivîsîne. Ez li vê derê bang li Mehmed Uzunî dikim, ew tiştên ku wan nivîsîne heke ew îsbat bike ku yek ji wan jî xîlafî heqîqetê ne ez ê herim uzrê xwe jê bixwazim. Mehmed Uzun him gazinan dike ku li Swêdê nivîskar û rexnegirên kurd nînin, him jî gava di heqê wî de tiştek tê nivîsîn har û hêç dibe. Heke tiştên tînin nivîsîn giran bin, nexwe wî xerabîni giran kirine. Li ku hatiye dîtin ku yek xerabîyan bike ne şerm be, lê ji yê rabe bibêje te ev xerabî kiriye re şerm be. Islûbên wiha, pirtir li Tirkîyê gellekî di rewacê de ne.

Mehmed Uzunî xwestiye rutbeyeka pir layiqê navê xwe bi şexsê min ve biperçimîne: "generalê bênefer". Ez heta beriya heşt salan aktîf di xebata siyasî ya kurdewariyê de bûm û di dereca yekem de jî berpirsiyarê partiyeka siyasî bûm. Lê ji ber ku ez tucarê ne li pey îxtîfîrasa rutbe, kariyer û nîşanên siyasî bûm, gava ew uslûba siyasî ya li rewacê ya li Kurdistanê bi min ne xweş hat, min bi xwe dev ji berpirsiyariya partiyê jî û dev ji xebata aktîf a siyasî jî berda. Min siyaseta tu car ji bo bilindkirina xwe ya bi rutban wekî pêpelûk nedît û di siyaseta de min tucarî tenezullî entrîka û kompoyan nekir. Ji bo ez herim jorê, ne di hundurê partiyê de ne jî li derwayî wê, min pê li pişt kesekî nekir. Min siyaseta wekî mîsyon dît, ne wekî kariyer û rutbe û şan şuhret. Loma jî di jiyana xwe ya siyasî de tu carî ez ji ber xwe ve nebûm telebkarê tu rutbe û meqaman, lê gava hevalên min, însanên ku baweriya xwe bi min dianîn wazîfeyek dan ser milê min jî ez jê venekişiyam, bêyî ku ez pê mexrûr bibim min qebûl kir. Gava ez heşt sal berê ji siyaseta vekişiyam, erê, partiya ku ez berpirsiyarê wê bûm, di bin darbeya 12- Îlonê, teror û şiddeta li Kurdistanê de wekî partiyên Kurdîstana Tirkîyê yê din gellek ji hêza xwe wenda kiribû, lê partiyek bû ku li her çar perçeyên Kurdistanê xwedan cih û roleka taybetî ya xwedan alternatîfê xwe dihat naskirin, bi partiyên her çar perçeyên Kurdistanê re têkiliyên wê yê xurt ên dostane û biratî hebûn. Aktîf dixebitî da li Kurdîstana Tirkîyê yekîtiya siyasî û cebheyeka netewî ava bibe û bi pêşkeve, li her çar perçeyên Kurdistanê kongreyeka netewî bê danîn. Heke Mehmed Uzun berê xwe bide tarîxa siyasî ya Kurdistanê, wê bibîne ku partiya siyasî ya cara pêşîn dawa kongreyeka millî ya seranserê Kurdistanê kiriye û ji bo wê bername pêşkêş kiriye ew partî ye ku ez berpirsiyarê wê bûm. Gava ez ji siyaseta vekişiyam jî, heta partî neçû kongrê, heta min hemû hesabê xwe neda partiyê û ew têkiliyên hêja yê Kurdistanê dewrî partiyê nekir, ez venekişiyam.

Di siyaseta de, têkiliyên min ên bi hevalên min ên siyasî re jî pirtir li ser esasê întellektueliyê bûn, çî di hundurê partiyê de çî jî li derwayî wê be her ku wesîle û fir-

send bi destê min ket min têkiliyên întellektuelî pirtir dan pêş.

Lê gelo jiyana siyasî ya Mehmed Uzunî ji ku hat ku derê? Berî salên 80-yan ew li welêt berpirsiyarekî *Rizgariyê* bû. Hê di nava wan de, ji bo ku lê dihat gerandin, ji wan xwest ku îzna wî bidin ew here li derveyê welêt temsîla wan bike. Bêyî haya wan jî xwe nêzî Necmeddîn Büyükkaya û hevalên wî yên wê demê kir da wî derê-xin derveyî welêt. Wan ew derxistin, Mehmed Uzun piştî demekê hat li Swêdê bi cîh bû. Vê carê grûbek bi navê *Rizgariya Kurdistan* ava kir ku li dora kovareka her bi wî navî kom bûbû. Li wir, pirtir bû mixalîfê siyaseta xwe ya kevn a ku xwedêgiravî derketibû dervayê welêt da temsîla wan bike. Ji qewlî wî ve bû generalê wê grûbê heta hemû hevalên wî dev jê bernedan û ew bi tena serê xwe nema wî dev jê berneda.

Li ser Mehmed Uzun gellek tişt dikarin bèn gotin. Li ser berhemên wî jî, ji alî ziman û teknîka edebî û estetîkê, tiştên ku meriv bibêje gellek in. Lê xerabî û şaştiyên ku ew tê de ne qîmetê jê re nahêlin ku meriv were ser van waran. Bifikirin ku romanek li ser dizîyê, li ser şelandina keda hinên din ava bûbe, ew roman zeîf be çi ye, klasîkeka cîhanê be çi ye? Ji alî edebî de kêmasî û şaşiyên Mehmed Uzun û qencî û xizmetên wî ji hene. Lê ev xeyrêşer'îya ku lê bûye kurm, rê nade ku lêkolêr û rexnegirên ciddî muhasebeyeka edebî û zimanewarî li ser berhemên wî çêkin. Heke kêmasiyek di van waran de hebe, cardin yê gunehkar ew e.

Ez dixwazim nivîsa xwe bi tesbîteka Mehmed Uzunî xelas bikim. Ew min wekî xwendevanekî xwe dihesibîne, lê îtîraf dike ku ez ne xwendevanekî wî yê dilsoz û sadiq im. Îtîrafa wî di cîh de ye. Ji ber berpirsiyarîya xwe ya li hemberî kultur û edebiyata kurdî ez mihaweke dikim da bibim xwendevanê her nivîskarekî kurd. Lê rast e ku ez ne xwendevanekî wî yê dilsoz û sadiq im. Ez dixwazim, lê nabe. Çawa meriv dikare dilsoz û sadiqê şêlandin, kedxwirî û buhtanan be. Nabe. □

1 Li vê derê pêşkêşker "berättar språk" derdixê pêşberî "sång"(stran) û poesi"(şîir)yê. Bi tirkî meriv dikare bibêje "anlatım dili", ya rasttir "yazılı anlatım dili" bi kurdî jî meriv dikare bibêje "zimanê pexşanê" yan jî "zimanê nesrê".

2 Det allra märkligaste är att det har inte skrivits romaner på kurdiska tidigare. Kurderna har berättat förstås, sedan urminnes tider. Men i sånger och poesier, inte i romanform. Mehmed Uzun har skapat ett berättar språk på kurdiska, här, ifrån Sverige. Mehmed du har upfunnit ett sätt att berätta.

3 Då frågade folk mig om det fanns då någon modern kurdisk litteratur, om det fanns då någon modern kurdisk roman. Och det saknades faktiskt.

4 Ett ord som återkommer i ditt essäsamling är 'dengbêj', de vandrade sångarna, berättarna. De som på något sätt är minnet för kurderna. På vilken sätt inspireras du ut av dessa?

- 5 Jag är född och uppvuxen i en kurdisk miljö. Och i med att språket var förbjudet då var den muntliga traditionen som var bärande för den kulturella arvet. Och jag är då född och uppvuxen i det. Så har jag väldigt starka minnen av det. Men sedan när jag skulle skapa, bygga upp då ett roman språk för detta förbjudna språk, då behövde jag källor för att skapa ett språk. Och de här dengbêjerna var kanske den största källor för mig. Jag hade inte ens ett lexikon framför mig, jag hade inte ens en roman framför mig när jag började skriva. Jag var tvungen att skapa ett språk, ett modernt litterär språk. Men då var det dengbêjerna som hjälpte mig.
- 6 Olle Hessler, du är författare, kritiker och översättare. När du hör den här berättelsen om Mehmed Uzuns kamp med språket, skapandet av ett språk, hur reflekterar du över ditt eget språk då?
- 7 När hade jag förmånen och sitta med Mehmed på flyget hit, vi pratade lite grand då bl annat om att skapa ett språk från ett hotade språk. En sådant samtal är oerhört avgörande.
- 8 Kürt dili 70 yıldır kurulu düzen tarafından inkar edilmekte ve değişik dillerin bir sonucu olarak lanse edilmektedir. Ancak güneşin gerçekliği nasıl ortadaysa, Mehmet Uzun da yine olan bir dilin yeniden yaratıcısı olarak, yeniden oluşturucusu olarak bizlere çok şey veriyor, yeni bir dil yaratıyor. Kendi söylemlerinde, romanlarında da konuşulan bir dili, yazıya geçmemiş bir dili, roman gibi zor bir alanda dünya çapında yeniden oluşturmaya çalışıyor.
- 9 Ben yıllarca Suriye'deki Kürt köylerini gezerek bu dengbêjleri dinliyordum, bir yazılı edebiyat dili kurmama gerekli olabilecek her şeyi çıkarıyordum.
- 10 ...
Ardından da İsveç'e göç. Stockholm Üniversitesi'nde dilbilim, Sorbone'da Fransız dili ve edebiyatı eğitimi; İsveç Yazarlar Birliği yönetim kurulu üyeliği; tıpkı Kader Kuyusu'nun kahramanı (Yani Celadet Alî Bedirxan M.C.) gibi sürgünde edebiyata ve dile adanmış bir yaşam.
- 11 Ama bütün bunları milliyetçi bir bakışla yapmadığımı söylüyor Mehmed Uzun. Hatta Kürtçe kendi ifadesiyle bu kadar büyük bir tehdit altında olmasa, İsveç'te oturup Kürtçe roman ve edebiyat dili kurmak gibi bir 'çılgnlığa' belki de kalkışmayacağını söylüyor.
- 12 Bugün, "Tek başıma modern Kürt roman dilini, edebiyat dilini kurmaya çalışıyorum" dediği çabasında bu sözlü kültürün, destan ve efsanelerin kaynak olarak büyük rolü var.
- 13 Mehmed'in edebiyatının Kürt diline çok büyük hizmeti oldu. Altı roman yazdı şimdiye kadar. Hepsini de Kürtçe yazdı. Mehmed Uzun ilk Kürt modern romanını yazan insandır. Ve bizim çağımızda da, günümüzde de en iyi romanları yazanlardan birisidir. Yani üstün düzeydedir modern romanları Mehmed Uzun'un ve Kürtçe yazılmış romanlardır. Türk kültürüne en büyük hizmet olarak sayıyorum ben bunu. Türkiye'de hem Kürtçe'de hem de Türkçe'de yayınladı romanlarını ve Türk halkı olsun, Kürt halkı olsun bu romanları sevdi. Satış rekorları kırdı diyemesem bile, çok büyük okuyucu kitlesine kavuştu Mehmed Uzun'un romanları. Kürtçe çok zengin bir dildir, Türkçenin de olduğu gibi. Kürtçe'nin modern romanları şimdiye kadar yazılmadı. Dünyada da, yani Irak'ta, İran'da, Suriye'de ve Sovyetler Birliği'nde modern roman yazılmadı. Bir iki tane roman taslağı var Mehmed'den önce bu dilde. Roman değildir bunlar.
- 14 Ben hep sürgündeyim. Yazdığım dil gereği sürgündeyim. Kürtlerin arasında da da sürgündeyim Çünkü yalnızım. Başka romancılar yok, yazarlar ve eleştirmenler yok. Canlı bir edebi yaşamın varolmasını sağlayacak hiçbir kurum yok, kanal yok.
- 15 Jag upplever mig i allra högsta grad som en svensk författare. Trots att jag inte skriver romaner på svenska, trots att jag inte har då börjat skriva mina erfarenheter i Sverige. Men jag är ju en svensk författare. Och jag säger det här i Turkiet också.

Qonaxek şev e yek...

Bo apê min Evdilmecîd

I.

heyvê rahişt miskê
bi serê xwe dakir;
şev heliya û çû...

dîlana heyvê kirin;
şev weke diyekê giriya;
hêsirên wê bûn lat li devê şikeftê
di şikeftê de ew bû dîsa

heyv çû ber mirêkê;
şev û zarûyên xwe weke kavilekî û hejîreke berrî giriyan
û bêriya sermayê kirin
-di sermayê de
bêhtir bi xwe dihisin sin-
melkes dan destê heyvê
û gotinê, "ji lîwanê û wê de neçin piyên te!"

(lîwaneke berazî bû;
ewqasî ji hal û wextan dûr bû ku mirin lê
bi pîrpirînekên mizgîniyê re bi laş dibû
derdor jî pê bi kêferattir dibû!)

anî bîra xwe
roniya her du çavên wê:
li Dehkê Kewa bû riya min hingê
belê, min bi xortekî gomlegzer vedabû
lê niha...
li lîwana wî kuştîyî me

şev, ey şev, tu ê kengî bê bi me ve?
ez ê kengî li qesra ayetan
qîza herî delal bim dîsa?

(bi hilma *tarîxan* vedibû û asê dibû
deriyê bakûr yê qesrê...)

ez a li ser axa ku heft şaristanî
lê ava bûne û xera bûne bûme piçik û parî
de ka kengî ez ê bi vê melkesê
xwe rêş bikim êdî?

(kevirê di navbera heyv û şevê de,
ew kevirê ku ji axa sar hez nake
didît, latên ku dihatin ajotin
ber bi xwîna genimî ve
û bi perengê agirê Xwedayan
çavê xwe dax dida..
guhê xwe bi yê wan ve kir carekê
û zemanekî qufilî danî ser lêva xwe:
ku behsa nebî bû
wê ew axîna sor tevî xweliyê bike...)

"şevê evîn jî terkand"
wilo digotin evîndar
û ji dilê xwe diketin...
êdî wê ne mexelê şahiyên laş ba şev,
wê ne hêlîn ba ji bo refê dilîniyan
wê ne perestgeh ba ji qralî û sîsalkên dil re

ku heyv jî giriya
rengê wê tefiya û çû
ez ê li şînê bim dîsa

2.

piştî ew gomlegê zer î bi xwîn
li navbera du qesrên ava
hejiya di destên girî de,
hûn ey gir û mehserên ku vê carê bê ba û baran man
di vê şîna zû de,
we jî yekcar xwe bi dilê tariyê de berda xwar
nazenîn,
lê dîsa hawar bi hawar...

Qudbê, her kevirekî wê
li aliyekî şopê ditefiya
û hemû darberû li milê meşê

hewce nedikir, pel ji zû ve weşiyane
û hemû xiştexişt û awaz jixwe reş girêdane.

ku bi meşa te ve nedihatîn stêrk
yan jî ji berê ve nebûn
qey ji axê re jî hewce dibû li hêfeke din

jixwe niha milekî wê sar bû ax;
li Erbeta ku çartêl li pişt xwe şidandibû
Memekî din dîker ser bêxewiya demê de
û bi firmêskên ku tevî avika sosinê dibûn,
em yên dest li ber rû
wek hêt
didîtin.

(kêl, ev çend car bûn
ku henekê xwe bi dest û rûyan dîkirin?!)

kul, dikarîbû xwe bigihîne Zînê
di binê erdê re,
li pişt çartêlê;
ew birîna hê nû dikemilî...

25.05.1998/Stenbol

Gêre

1.
govend e
li qesra ba ye
rebax e
hejik li milê dilan e,
û bi miştaxan re
li benda zirnê ne çiya:

(her du dûrayiyên ku ba
bi laş dîkin û bêriyê dîkin.)

2.

ji ber nebûnê;
ya dest û piyên tengezarî û xerîbiyê...
va ye li çûnê ne
-çûna giran-
gul-genim
rû-zevî

niha fîkefîka wargehê kelê ye
û şûnwaran xefka xwe li çavên Şahmaran vedaye:
li tevna milê rastê dê ye,
û li ya milê diêşe
kevir:

(her du şîniyan jî
xwe bi ser sûravka dil de berdaye
dil, dimsa xwe
bi firmêskên dil-ketinê
tirş dike dîsa
û meya şor,
bi ser sînga
kevirê bêstî de
dirije û ditefe
ronahî ditefe
û tefîn, barana reş dihêle
li şûna xwe


ez bi firmêskan re li erdê dikevîm
teşîya felekê
gêreya vî dilî
li mirinê dirêse...

19.04.1998/Nisêbîn

OSMAN MEHMED

Not: Di tîprêziya van herdu şîran de hin şaşî çêbûbûn, em ji şairê xwe û ji xwendevanên xwe lêborîne dixwazin û herdu şîran ji nû ve diweşînin.

DANASÎNA KITÊBAN



Di van salên dawiyê de li ser kurdan û di derheqa kurdan de bi zimanê tirkî gelek kitêb hatin weşandin. Piraniya kitêbên ku hatine weşandin an gernameyên gerokên biyanî ne, an jî kitêbên li ser dîroka kurd û Kurdistanê ne. Herçî kitêbên li ser edebiyata kurdî ya modern e, an jî kitêbên bi raybetî li ser şaxekî edebiyata kurdî ne, çî bigire nehatine weşandin. Ev kitêba ku ji aliyê Ferhad Shakely ve bi swêdî hatiye nivîsandin û ji aliyê Rohat Alakom ve li tirkî hatiye

wergerandin, di warê xwe de kitêba yekemîn e. Kitêb li ser dîrok û hunera çîroka kurdî ye. Shakely dîroka çîroka kurdî ya modern digihîne salên 1920î. Ew ji sala 1920î û heta roja me çî bigire hemû çîrok û çîroknivîsên hemû perçeyên Kurdistanê, bi naverok, form û stîla wan ve analîz û şîrove dike û resimekî sedsaleke hunera çîroka kurdî ya modern radixe ber çavan. □

Ferhad Shakely
Modern Kürt Öykü sanatı
Ji swêdî: **Rohat Alakom**
Weşanên Avesta

Min şev nas dikirin berî reş bibin, kitêbeke şîran e ku ji aliyê şairê me Necîb Balayî ve hatiye nivîsandin. Necîb Balayî şairekî kurmançî jî başûrê Kurdistanê ye, lê mîna gelek kurdan koçber bûye û niha li Almanyayê dijî. Balayî jî mêj ve ye di nava çalakiya nivîskariya kurdî de ye û li

başûrê welêt beşdarî gelek festivalên şîra kurdî bûye. Li gora paşgotina Balayî, piraniya şîrên di vê kitêbê de berê di kovar û rojnameyên kurdî de hatine weşandin. Hinek şîr jê di Nûdemê de jî hatibûn weşandin.

Ev şîrên ku bi kurmançîyeke bedew hatina nivîsandin û bi hîsa hezkirin û têkoşinê hatine hûnandin, rengêkî nû didin şîra kurdî. □



Necîb Balayî
Min şev nas dikirin berî reş bibin
Weşanên Rewşenê



Herçiqas Zeynel Abidin bi tirkî dinivîsîne û bi tirkî çend kitêb weşandibin jî, lê di van salên dawiyê de ew ketiye nav refê nivîskarên kurd û li zimanê dayika xwe, li kurdî veşariyaye. Wî heta niha bi çendan gotar û kitêbên bi kurdî jî weşandine. Lê ev romana wî ya ku gihîştîye me, bi tirkî ye. Zeynel Abidin di vê romanê de, di siya evîna du ciwanên kurd de, rewşa welêt ya siyasî û civakî, zor û zilmdariya li ser kurdan û tirsê fizîkî û psîkolojîk ku li welêt hakim e, bi zimanekî şifrane radixe ber çavan. Ev romana ku bi kirasekî felsefî hatiye xemilandin, hewl dide ku hin zelalî an jî hin bersivan jî hin pirsên felsefî re jî bibîne. □

Zeynel Abidin
Hüznün Maviye Akar
Weşanên Rewşenê

Şerefxan Cizîrî, di vê kitêbê de, bi metodolojî, dadîkeve nava kultur û edebiyata kurdî û bi alîkariya stran û çîrokên kurdî; dîroka kurdan, rewşa wan ya siyasî û civakî, problem û berberiyên eşîrtiyê, psîkolojiya civatê, karakterê kurdan, evîn, xayinî, hezkirin, spehîtî, jin, hesp, erotîzm û gelek babetên din radixe ber çavan.

Ev kitêba ku ji pênûsa akademisyenekî derketiye, lê bi zimanekî hêsan hatiye hûnandin, di warê xwe de gaveke nû ye. Cizîrî bi vê gava nû hem piyonertiyek kiriye hem jî kodên gelek deriyan ji me re eşkere kirine. □



Şerefxan Cizîrî
Kultur û edebiyata devkî
Weşanên Nûdemê



Li ba kurdên bakur hûnera romanê tiştektî nû ye. Lê di van salên dawiyê de, bi taybetî jî li Swêdê hin ceribandînen romanê hatine nivîsandin. Ev romana Laleş Qaso jî yek ji wan ceribandinan e. Laleş Qaso, di vê romanê de beşekî welêt, ji wî beşî jî herêmeke welêt; herêma Mêrdînê kiriye mijara romana xwe. Laleş Qaso di vê romana xwe de berberî û dijminatîya du bavikan, bi awayekî pîralî tîne zimên. Di siya berberîya herdu bavikan de, nivîskar wêneyekî civakî, siyasî û psîkolojîkî radixe ber çavan. □

Laleş Qaso
Sê şev û sê roj
Weşanên Nûdemê

